Kerim Husami

# KOMARA DEMOKRATİK A KURDISTAN (MAHABAD)



WEŞANÊN JİNA NÛ

www.netewe.com

www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook

Weşanên Jina Nû : 6
Bıra Tarixê : 4
Çapa Yekem : Kanuna Paşi 1986

Adres :
JİNA NU FÖRLAGET
Post Box: 240 12
750 24 UPPSALA

Postgiro : 50 37 99- 9

İSBN : 91970747-64

www.netewe.com

KURDISHeBook.com
@KURDISHeBook

Kerim Husami

# KOMARA DEMOKRATİK A KURDISTAN (MAHABAD)

WERGER : ELİŞÊR

WEŞANÊN JİNA NÛ

www.netewe.com

KURDISHeBook.com
@KURDISHeBook

## DAXUYANİ

Dı 22 yê Kanuna Paşi ya isal de 40 sal dı ser damezırandına Komara Kurdıstan a Mahabadê re derbes dıbe. 40 sal berê, dı 22 ye Kanûna Paşi ya sala 1946 a de, dı beşeki Kurdıstana İranê de Kurdan Komara xwe ilan kırın. Lê ımrê wê gelek najot. Her dı wê salê de İran êriş bır ser Kurdısetan, Komara Mahabad darê zorê, bı xwinê roxand. Tevi serekê Komarê Qazi Muhemmed gelek serokên wê tevgerê hatın dardekırın. Ew tevgera Kurdan ji dı dılê têkoşina rızgarixwazi ya gelê Kurd de bı ci bû, dı nav rupelên dirokê de bı herfên zerin nexş bû.

Avabûna Komara Mahabad, têkoşina Kurdıstana İranê ya beri vê buyera gıring u roxandına wê, tesira xwe û bı tecrubên xwe ve cıheki gıring dı diroka Kurdıstanê de dıgre. Lê gelek mıxabın ku, me Kurdan wek hemû warên diroka xwe dı vi wari de ji gelek kêm tışt gotıne û nıvisandıne. Heta nıha bı awaki zanısti û fırehi tu lekolin, jı bal me ve lı ser vê buyera gıring nehatıne çêkırın. Me kıl û kemasiyên wê, tesira wê ya lı ser tevgera rızgarixwaziya gelê Kurd a bı gelemperi nexıstiye lı ber çavan ku tevgera me ya iroyin tecrube jê bıstine û pê riya xwe ronitır bıke.



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

40 sali ya vê buyerê fırsetek mezın e jı me Kurdan re da em lı ser vi rupelê diroka xwe bısekının, dıbir binın, hûr lı ser rawestın û dersa jê derxısti ragıhinın ber deste tevgera xwe ya iroyin.

Bı vê baweri û hêviyê, me vê pırtuka destê we çapkır da pareke bıçûk a me ji dı biranina 40 saliya Komara Demokratik a Kurdıstan (Mahabad) de hebe. Pırtûk, jı bal ronakbir û şoreşgerê hêja Mamoste Kerim Husami ve, bı navê "Komari Demokrati Kurdıstan an Xwudmuxtari" bı zaravê Sorani hatiye nıvisandım û Ilona 1985 an de hatiye çapkırın. Bı taybeti jı bo ku Kurdên Kurdıstana Tırkiye û hemû Kurdên kû bı Kurmanci dıaxıvın, feyde jê bıgrın me wergerand zaravê Kurmanci û em bı tipên latini wê çap dıkın. Pırtûk her çıqas bı hecmê xwe ne mezın be ji, buyerên dewra avabûn û têkçûna Komara Kurdıstan jı gelek aliyan de derdıxe ronahiyê.

Dı pırtikê de hınek helbestên Sorani hebû ku me dest nedan wan û bı zaravayê Sorani dı vê çapê de ji bı ci bûn. Lê jı bo xwendewan tê bıghên, me Kurmanciya wan bı awaki nesır lı jêrenotan da xuyakırın.

Bı hêviya ku feyde bıghine xwendewanan.

ÇAPXWANA JİNA NÛ



www.netewe.com

KURDISHeBook.com
@KURDISHeBook

## PÊŞGOTIN

Dı qonaxa diroka cihanê û xebata gelan de, hınek bûyer û kar bı destpêka dirokê tên hesab kırın. Dı cihanê de Şoreşa Fransa û Şoreşa Oktobr a mezın jı van kar û bûyeran ın

Damezırandına Komara Demokratik a Kurdıstan a sala 1946 an lı Mahabad dı xebata gelê Kurd a dûrudırej de,bı destpêka diroka Kurd a nû tê hesıbandın.Jı ber ku yekem car e dı diroka çend sedsalen dawi de netewa Kurd,dı beşeki netewa perçekırı de desthılata siyasi dıgre deste xwe,sistema hukûmetek bı awayi komari, demokratik dadımezrine, al, arm û nişana hukûmeta Kurd dıde diyar kırın. Hêzên bergırı (nizami) û rêxıstına siyasi û cıvaki pêk tine û partiyek siyasi pêşengiya vê tevgerê dıke.

Ev sala nû ya bê (1364) 22 yê kanûna paşi ya 1986 a ku dê 40 sal dı ser damezırandına Komara Demokratik a Kurdıstan re derbaz dıbe...

40 sal... Belê 40 sal dı qonaxa dirokê de gelek nine, lê-belê, dı rewşa siyasi, cıvaki, kulturi û abori ya gelê Kurd de her rojek vi 40 sali dı beranberê saleki de ye.



www.netewe.com

Dı vi 40 sali de bı kêmasi 100 dewletên nû hatıne ser nexşa (harita) cografya cihanê. Zêdetırin jı 100 netewên pıçûk û mezın ku dı bın destê koleti û mêtıngehkariyê de bûn û dı warê havçerxi, jı xêr û xweşiya cihanê paş de mabûn, qeyd û zıncirên koleti û mêtıngehkariyê qetandın û serxwebûni ya xwe ya siyasi wergırtın. Zêdetırin 100 dewletên pıçûk û mezın ala xwe ya serxwebûnê hêl kırıne û dı nava Koma Netewan de ciyê xwe gırtıne. Dı sala 1945 an de, yani salek berê damezırandına Komara Kurdıstan, tenê 54 dewlet endamê Koma Netewan bûn. Lêbelê, dı sala 1983 an de, endamê Koma Netewan gıhişte 158 dewletan. Dı vê navê re, lı Avrupa, Asya, Afrika û Amerika Latini, nêziki 20 dewletên sosyalist avabûn, ku sermayedar û kedxwuran jı welaten xwe derêxıstıne. Hêza gelek xurt a cihana sosyalist pêk hatiye. Lı Kurdıstanê ji pışti 40 salan jı nû ve bı daxwaza"xwud muxtari"qırkırına nıjada Kurd tê kırın. Dı destpêkê de Kurd bı zor hatiye mısılman kırın û ku yên bı seri de hatiye, bı eşkera lı ber çeva ye, em dıbinın. Jı nû ve, carek dın ew dıxwazın bı zora tank, top û fırokan "Hukûmeta İslami" dı Kurdıstan de qaimtır bıkın. Ger em dı rastiyê de bê demargırtına netewi (teessuba mılli) lı rewşa têgıhiştini û berewpêşveçûna cihanê bınêrın; em dıkarın bı awaki eşkera bêjın, ku dı navbera vi 40 sali de jı bıli gelê Vietnamê yê qehreman, qet yek jı wan netewên ku serxwebûna xwe sıtendıne û dewletên xwe yên netewi damezırandıne, dı qonaxa bı dest xıstına mafên xwe yên netewi û rızgariya nıştımani de qasi Kurdan xebat nekırıne, qurban nedane û ew qas jı wan nehatıne kuştın.

Dı vır de ev pırsa han tê pêş: Dı van serdeman de, sistema mêtıngehkari bışkıvi û hılweşiya, Koma Netewan jı bo hemû netewan mafê çarenıvisa wan bı resmi naskır, jı



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

bo çı netewa Kurd a 25 milyoni her wıha bındest, perçe kıri, kedxwuri û heqxwari maye?

Mımkune bê gotın, ku Kurdıstan mêtıngeh nine. Ger ku mêtıngeh bûya, heta nıha ewê ji wek welatên dın wê serxwebûna xwe sıtendıbûna û bı azadi bıjiya, dı rewşa peşveçûn, aşiti û havçerxiya cihan de rola xwe bıliste. Jı ber ku, mêtıngeh nine, hewceye bındest, mafxwari û perçe kıri bımine! Gelê Kurd ji dı bın desthılatên dewletên diktator û şowenist de bımine û lı ser doza xwe ya bı heq bê kuştın û bê derbeder kırın. Eva han ji dı Koma Netewan û mafê navnetewi de, dı bas û gotınên dewletên mezın ên lı ser danina mafê çarenıvisa gelan demokrasi û dadperweri de hatiye gotın û tê gotın, her gotınek rût û bê netice û vala ye.

Lê ger ku wısa be, sed xweziya Kurdan ewe ku mêtıngehkari bıxwazın. Lêbelê, da em bızanın mêtıngehkari çiye û mana siyaseta mêtıngehkariyê çiye û çawa ye?

Wextê em lı ser mêtıngehkari û dewletên mêtıngehkar bıaxıvın, heq nine ku tenê em lı ser mana keliman û awayên klasiki bıgrın ber çavan û bı vi awayi gotınan pê ve bışıdinın, ku guya mêtıngehkari tenê ewe, ku jı aliyên dın ên behran hatıbın û işgal kırıbın, an ji lı ser qewl dana xwe wan welatên bın destê xwe ava kırıbın. Mane û têgıhiştına mêtıngehkar û mêtıngehkari ne bı vi awayi dı gotınan de ye. Cewher û mana têgıhiştına mêtıngeh-mêtıngehkari jı derveyi peywendiyên navbera dewletên mêtıngehkar û gelên welatên mêtıngeh û işgal kırına wan tışteki dın nine. Ev peywendiya han beri her tışti dı warê eskeri, siyasi, abori, kulturi û cıvaki de derdıkeve pêş. Dewletên mêtıngehkar wextê welateki işgal kırıne û kırıne mêtıngeh û xıstıne bın destê xwe, dı warê eskeri de hemû muxalefet û dıjitiyên tevgerên gelên wan welatan bêdeng kırıne û bı zora serê sıngûya, lı ser kuş-



www.netewe.com

tın û kuştara gelê wan welatan desthılata xwe ya çepel dı wan welatan de avakırıne.

Dı warê siyasi de çarenıvisa kar û barê gelên wan welatan gırtıne destê xwe û dı riya danina polis, dadgeh û karbıdestên xwe de, kar û barên wan welatan lı gora qezenc û menfeeta xwe bı rêve bırıne.

Dı warê abori de, serwet û hebûnên ser erd û bın erd ên wan welatan talan kırıne, welatên mêtıngeh dı rewşek paşdemayi de gırtıne, ked û hêzên karê gelên wan welatan jı bo pêş de bırına senet û kar û barên xwe bı kar anine. Welatên mêtıngeh kırıne bazara kel û pelên xwe yên kevn û bıkêrnehati.

Dı warê kulturi de dewletên mêtıngehkar, pêşi lı ber xurt bûn û belav bûna kultura gelê wan welatan gırtıne, kultura mêtıngehkari wısa lı wan kıriye, ku jêrdesti, koleti û razibûna bı çarenıvisa xwe dı nav gel de rewaç ditiye.

Jı ber ku welatê mêtıngeh jı serxwebûna siyasi, eskeri, abori û kulturi bê pare, dı hemû beşên jiyanê de dı bın destê dewleta dagırker û xwediyê desthılata wê de ye. Dewletên mêtıngehkar welatên mêtıngeh wek ciyên xwe yên eskeri, merkeza kel û pelên xam, kaniya karê erzan, bazara kel û pelên kevn yê bıkêrnehati dı bın destê xwe de dıgrın û jı bo berjewendê welatê metropol bı kar tinın.

Ferq dı navbera peywendiya dewletên mêtıngehkar lı gel gelên welatên mêtıngeh û peywendiya İmparatoriya Osmani û İran lı gel gelê Kurd wısa nayê ditın. Ewan ji bı esker û ordiyan ve Kurdıstanê işgal û perçe kırıne û gelê Kurd kırıne bındest û kolê xwe. Ew kırınên eskerên Şah Abbas û ordiya Sultanên mısılmanan ên Osmani û Hukûmeta Ataturk û Rıza Şah ku dıkırın, nıha ji şowenistên İran, Irak û Tırkiye lı Kurdıstanê dıkın. Ev kırınên han jı yên



www.netewe.com

dagırkerên Fransa, Ingıliz, Amerika û jı yên mêtıngehkarên dın lı Asya, Afrika û Amerika Latini kêmtır nebûne. Wextekê Rusya Qeyseri zındana gelên derveyi Rûs dıhat hesab kırın, gelo çı ferqa wê jı Tırkiyê û İranê hebû? Ki dıbêje ku İran û Tırkiye zındana gelên xeyri Tırk û Farıs nının?

Ger em dı nêzik de lı rewşa siyasi, abori, eskeri û kulturi ya Kurdıstan û ya gelê Kurd bınêrın û peywendiya dewletên diktator û şowenist lı gel gelê Kurd bıdın ber hev, ferqitiyek dı navbera dewletên mêtıngehkarên klasik û van dewletên ku Kurdıstan dı nav xwe de perçe kırıne nabinın. Peywendi, her ew peywendi ne ku rêberên tevgera komunist û karkerên cihanê behs kırıne;eşkera kırına mafê çarenıvisê jı bo wan netewan danine, ku bındest, bê maf û hatıne işgal kırın û bûne mêtıngeh.

Wextê Karl Marks siyaseta mêtıngehkari û dagırkeri ya dewleta Ingıliz, Fransız û İspanya, lı İrlanda, Amerika Nivro (cenûb), Amerika Merkezi, Hındistan, Çin, İran, Macaristan û Lehistan hukum dıkırın, şerên rızgarixwazi yên wan gelan, xebat û daxwaza wan rewa dıdit. Jı derveyi ev gelên han azad bıbın, dewletên xwe yên netewi û serbıxwe lı gora daxwaza xwe dabımezrinın pêştır tu maneyek vê nine. Têgıhiştına teoriya Marks dı warê mêtıngehkari û xebata gelên mêtıngeh her ev e û dı vır de pêwıstiya tefsir û zıre teoriyan nine.

Lenin dı têza xwe ya dı ser mesela neteweyi de dıbêje : "Sosyal Demokratên Rus dı temami propagandên xwe de, dıvê lı ser vê bıneşın; ku mafê hemû netewan heye dewletên xwe yên serbıxwe pêk binın û an ji bı azadi wê dewletê helbıjêrın ku dıxwazın pê re bıjin." (1)

Dı mesela diyar kırına mafê çarenıvisê de nıha hınek teorisyenên sosyal demokratên Kurd, jı bo gel xelet têbıgıhi-



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

nın û jı bo ber dılê dagırkerê Kurdıstan bıgrın bı xelet tefsir tinın û "xwud muxtari" bı awaki diyar kırına mafê çarenıvisê dıxın pêş çav, ku jı derveyi danina dewleta serbıxwe pê ve qet manayek wê ya dın tune. Xwud muxtari, ku minakiyek bıçûk a demokrasiya burjuwazi ye, nabe mafê diyarkırına çarenıvisê u ciyê we nagre.

Lenin dıbêje : "Ger em bıxwazın, dı mafê netewan, wek diyar kırına me ya zarenıvisê tê bıgehın, wê wextê em xwe bı tarifa qezayi nexapinın û tarifên hışk çênekın, jı ber ku hewceye em lı şert û şırûten diroki, abori ya tevgera netewan bınêrın, wê wextê naçari em dıgıhijne vê neticê, ku daxwaza jı bo mafên netewan, diyar kırına enınıvisa xwe bı destê xwe ye, yani; mafê wan heye, ku jı netewên dervayê xwe cûda bın û dewletên xwe yên serbıxwe û netewi avabıkın."(2)

Mıjara (behsa) me dızıvıre tê ser lêgdana rewşa siyasi, abori, kulturi û cıvaki ya Kurdıstana İranê dı dewra Hukumeta reş a Rıza Şah de û jı wır heta serihıldana gelê Kurd, damezırandına Komara Demokratik a Kurdıstan û tekçûna wê dıçe. Zêdetırin lêkolina vê mıjara pêşgotınê dıkeve ser mılên diroknıvis û hukûkzanê Kurdan. Jı ber ku dı cihana iroyin de, qet tu neteweyek nine ku hejmara xelkê wi bıgıhêje 25 milyon û jı hemû mafên xwe yên netewi bê par be û bı vi awayi bê perçıqandın, bê kuştın û bê qırkırın.

Pêwıste ku em eva hanji bêjın; lı ber destnebûn û pê re negıhiştına sened û belgeyên temam jı bo amade kırın û lêkolina xwe, mımkune kıl û kêmasi gelek hebın. Dı pêşgotına xwe de, ez doza bı bexşina xwe dıkım, jı bo vê behsê, derveyi serokaniyên ku navên wan derbaz dıbın, beşê pırani mın jı beşdarbûn û biraninên xwe istifade kıriye.



www.netewe.com

KURDISHeBook.com
@KURDISHeBook

## KURDISTANA İRAN

Kurdıstana İran, ku beşek jı welatê perçe kıriyê Kurd e; sınorên wê, jı bıntara çiyayê Agıri û Ermenistana Sovyetê dest pê dıke û heta xwarê; zincira çiyayên Zagros dırêj dıbe tê.

Dı aliyê rojava de, dı dest pêka rojava de bı Kurdıstana jor a Kurdıstana Tırkiyê û Kurdıstana xwarê ya Kurdıstana Irakê ve hevsinor e. Dı aliyê rojhılat de Azerbeycan, Gola Ûrmiyê û hin xwartırê wê dı aliyê rojhılat de sınorê wê xwe dıgıhine Hemedan, Bextiyar û Xozıstan. Pani û bera axa Kurdıstana İranê 125 hezar kilometre çargoşe ye.
Kurdıstana İranê jı derveyi çem, darıstan, havinwar, zozan û ciyê çêregehan, bı pit û bereket û kaniya ciyên madenên bın erd e; jı bıli petrola Kırmanşanê yên dın dest pê nehatiye dan û her wısa maye. Lı navça Şıno û gundê Serderê,



www.netewe.com

petrol ew qas lı ser rûye, ku xelkê navçê jı bo şewatê tenê jı çim û axê istifade dıkın. Lı ser madenên bın erd ên Kurdıstanê Hejar wıha dıbêje :

Ewey pêt wa ye kêw e, xermani zêr û zêwe
Zerniq û ciwe y Hewşar Axelan sahıb nêwe *

Kurdıstana Iranê jı aliyê parvekırına idari ya Iranê bı pênc herêman hatiye parvekırın. Jı derveyi navça Sınê ku bı "Kurdıstan" bı nav bûye, herêmên dın ên Kurdıstanê bı navê Azerbeycana Rojava, Lorıstan, İlam û Kırmanşan hatiye bınavkırın.

Her çıqas hukûmetên şovenist ên İranê dı hejmartına nufûsan de xwe nêziki ser warê netewi û cûre cûre netewên dın İranê nekırıne û negırtıne ber çav, lêbelê, tabloya xwarê, hejmara Kurdan dı İran de ya dı salên 1970 û 1975 an dıde xuya kırın. :

| Sal | Temamê İranê | Kurdıstana İranê | Kurd dı İran de |
|---|---|---|---|
| 1970 | 28.258.800 | 4.561.280 | 4.803.860 ** |
| 1975 | 32.440.000 | 5.190.400 | 5.514.800 |

Lı Kurdıstanê 470 hezar Tırk, 235 hezar Farıs dıjin. 400 hezar Kurd ji lı herêmên Horesan, Qoçan û Dergez dıjin.

---

* Ê ku jı te tırê çıya ye, bêndera zêr û ziv e
Kukurd û ciwa Hewşar Axelan bı nav û deng e

**(Lı gora baweriya mın, reqemên jorin dı eslê kıtebê de bı ci guherti hatiye nıvisandın. Wek ku reqemên bınên Kurdıstana İran û Kurd dı İran de hatıne nıvisandın em lı vır rastiya wê dınıvisın. N.M.)



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

Jı %17 nufûsa Îranê Kurd ın. (3)

Kıtêba Sıtranê Mir "Welatên Dınyayê" çapa Moskovayê wıha dınıvise :

"Hejmara Kurdan dı Îranê de 5 milyon e. Ger ku em Loran ji Kurd bıhesıbinın, hejmara Kurdan dı Îranê de dıgıhije 7 milyon û nivan." Diyare ev nıvisandına han a sala 1979 an e. Ger ku hejmartına nufûsê dı Îran de bı awaki rast bê çêkırın, bêgoman hejmara Kurdan dı vi welati de wê jı 6 mılyonan zêdetır be.

## DI WEXTA RIZA ŞAH DE REWŞA KURDAN

Dı wan lêkolin û nıvisarên ku lı ser pêkhatın û têkçûna Komara Demokratik a Kurdıstan a sala 1946 a ya Mahabad, hatıne nıvisandın, diroknıvisên biyani û serbıxwe, gelek caran ketıne vê şaşitiyê, ku dıbêjın; guya Komara Kurdıstan bûyerek ne dı wextê xwe de bûye û xwe bı xwe dest pê kıriye û bûyereke ku jı bal biyaniyan ve hatiye saz kırın. Evên han rewsa Kurdıstanê ya abori, siyasi û cıvaki ya beri roxandına rejıma Pehlewi û wexta damezırandına Komara Kurdıstan nagrın ber çav.

Gelek mıxabın, rewşa Kurdıstan, cinayet û gunehên Hukûmeta Rıza Şah lı hember Kurdan û siyaseta asimilê kırına Kurdan û şovenistiyên Hukûmeta Pehlewi, ne jı aliyê diroknıvisên Kurdan hatiye nıvisandın ne diroknıvisên biyani û ne ji kırdayetıyên netewên burjuwazi xıstıne ser rûpelên dirokê.

Car carnan bı awaki kêm lı ser rûpelên kıtêb û kovarên Îrani, bı kurti behsa Kurdan tê kırın. Lêbelêne jı bo dılsoziya gelê Kurd, an ji mehkûm kırına siyaseta şovenist a Hukûmeta Îranê; belko jı bo armanca nişandana qudreta kırdayetiya Rıza Şah e.

Hınek diroknıvisên biyani ji, guneh û mırovkujiya Rıza Şah a bı destxıstına kırdayetiyê, jar kırına derebegi û bıhêzkırına Îran dızanın. Ev nıviskarên han rastiya han dıdın mıleki, ku her tıştê Rıza Şah dı Îran de kırıye, lı ser ray û daxwaza Ingılizan û dı çerçeva qezenç û berjewendiya



www.netewe.com

mêtıngehkarên İngılizan de bûye.

Nıha em bıçın ser behsa peywendiya Rıza Xan û Ingılizan. Tenê ev çend rêzên han, bir û baweriya Yehyayê Dewletabadi baş kıfş dıkın: " Dı navekê re İngılizan dı xwestın, dı navbera Rûsya, İran û Tırkiyê de Kurdıstanek serbıxwe dabımezırının ku jı bo menfeeta xwe ya siyasi bıxın bın çavdêri û pêştevaniya xwe. Eşkere ye dı vê riyê de zerara İran û Tırkiyê heye. Jı ber ku Kurdıstana Tırkiyê û İranê ji dı kevın ber Kurdıstanek serbıxwe. İro lı İran, ku İngılız aligırên pêşveçûna kar û barên serdarê esker "Rıza Xan"ın û naxwazın dılê wi bışkinın, mesela pêkanina Kurdıstanek serbıxwe dıdın paş, dı we wexta ku hukûmeta me ya nizami dı Kurdıstan de reh û rişên xwe davêje, bêyi ku siyasetek biyani astengan derxe ser rê. Dı mesela Kurdıstan de, em lı gel Tırkan rê ve dıkevın."(4)

Rê ajoyên Hukûmeta Rıza Şah dı Kurdıstan de, bûne sebebê kuştın û tekçuna cıvaka Loriyan, pelıxandına serihıldana Sımko, Cafer San, Qedemxêr, bıdûrxıstına Gelbaxiyan jı serihıldana Kurdên Celaliyan, Mele Xelilê Goromer, Omer Paşayê Sûsıni û hwd...

Dı dawiyê de desthılata Rıza Xanê Mir Penc a reş ku raste rast lı gora pilan û riya İngılizan dı meşiya û dı dawiya dawiyê de ji Rıza Xan bû "Rıza Şah" êdi İran kır zından û qesapxana gelên xeyri Farıs. Rıza Şah bı bahana nehıştın û jı holê rakırına derebegi,bı awaki gışti çek berhevkırına jı nav gel û jı bo armanca komkırına hêza desthılatê dı hukumeta merkezi de, serihıldanên cûre cûre yên êl û eşiretan jı navê rakır.

Her çend dı warê demokrasi û azadiyên demokratik de gelê Farıs ji xıste nav mengenê û bihin lı azadixwazan çıkand, lêbelê lı hemberi netewên xeyri Farıs siyaseta şovenisti ya netewatiya mezın û paniranizmê gırt pêş, bernama asimelekırına gelê Kurd kır rêbaza siyaseta xwe û dı mesela jı holê rakırına tevgerên Kurd de riya Ataturk gırt ber xwe. "Siyaseta mezıni xwestına İran jı bo sebebê Farıskırına temamê Kurdan bû. Kurdan İrani dıhesıbandın û bê maf, kultur û terbiya mılli, ya xwe dıhesıbandın."(5)

Serok û berpırsiyarên eşiretên Kurd, dı maleki de bê desthılatiya xwe , dı bın desthılata diktatorê Rıza Şah



www.netewe.com

de dıditın û dı mıleki dın de ji bı asimilekırına Kurdan dıhesiyan û gelek navçên Kurdıstanê nedıxwestın dı bın nirê Hukûmeta Rıza Şax de bıminın, serihıldıdan. Lêbelê jı ber nubuna yekiti, bername û serdestiya nizama eşiretiyê, jı wan serihıldanan tu yek ji bı ser neketın.

## BIZAVÊN SERİHILDANÊN KURDAN

Şoreşa mezın sosyalist a Oktobrê lı Rûsya a sala 1917 a rejıma sermayedari-derebegi roxand û lı gora armanc, naverok û gırıngiya xwe karek lı ser rewşa berewpêşveçûna cihanê kır, ku qet tu welat û netewe dı derveyi tesira vê bûyera mezın de nema.

Dı salên Şerê Cihanê yê Yekem de, beşê mezın ên Kurdıstanê bûbûn warên bınpêkırına eskerên dagırkerên Tırk, Rûs û İngılizan. Gelê Kurd dı netica şerê emperyalistan de jı ber kuştın , xela û bırçibûnê hatıbû derbeder kırın. Kurd bê daxwaz û raya xwe, jı bo qazanca dagırkeran dı bûn goştê devê topan û tê de dıçûn. Lı ser serkevtına şoreşa mezına sosyalist a Oktobrê, eskerên dewletên dagırker jı Kurdıstanê kışiyan. Hukûmeta nuh ya Sovyeti , peymanên mêtıngehkar ên hukûmeta beri xwe veçırand û jı holê rakır. Rewşek nuh jı bo Kurdan hate pêş, ku jı bo xelasbûna jı bın destê zılm û zordariya eskerên Tırk, Rus û İngılizan, jı bo , pıştrastkırına xwe ya rızgari û serbesti jı Şoreşa Sosyalist a Oktobrê ilham wergırın.

Dı bın tesira Şoreşa Oktobrê de lı Reşt û Gelan tevgera "Cengel" (Daxıstan) dest pê kır û Komara Sosyalist hat damezırandın. Dı navçên Kurdıstanê yên cûre cûre de ji Kurdan dı riya rızgari-serxwebûni de dest bı xebata xwe kırın.

Dı meha kanûna paşi ya sala 1920 a de lı navça Şerwan û Qoçan hejar û feqirên Kurdan dı bın seroktiya Xudo (şıvanek pêşketi) de derebegên Kurdan dıji xan û derebegên Zehferanlo seri hıldan. Dan û sıtendına xanedanên Zehferanlo lı gel İngılizan hebû. Serihıldana Kurdan çend meh hat domandın. Hêzên deweletê bı yarmetiya çekdarên derebegan dı meha İlona wê salê de , bı awaki zehmet dıkarıbûn serihıldana zehmetkêşên Kurdan bıdın tefandın." (6)



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

Jı sala pışti Şoreşa Oktobrê û heta sala 1937'an, dı Kurdıstana İranê de hınek serihıldanên gelê Kurd ên dırêj berfıreh, an ji lı ser warek teng pek hatın,, ku bı hezaran kes tê de beşdar bûn, lêbelê ew hemû serihıldan bı xwin û kuştınê hatın şıkandın.

Dı sala 1920 an de Sımail Axayê Sımko lı navça Salmas û Urmiyê lı dıji dewletê seri hılda. "Sımail Axayê Sımko jı ber şexsiyeta xwe va gırıng û xurt ve bê rehmi, dı nav eşiretên Kurdan de bu hêzeki yekem jı Sero dı Navça Xoye heta Seqız û Bane xıst bın destê xwe. Sımail Axa bı tevayi behsa serbıxweyi dıkır û dıxwest welateki serbıxwe yê Kurd, ku hemû Kurdên Azerbeycana Rojava bıgrê nava xwe dabımezrine." (7)

Tevgera Sımko, dı navçên dın ên Kurdıstanê de ji belav bû û eşirên Kurdan lı der û dora Sımail Axa kom dıbûn. Rojnama Kurd wek organa tevgera Sımail Axa, dı bın berpırsiyariya zana û welatparêz Mele Mehemedê Turcanizade de lı Urmiyê, bı zımanê Kurdi û Farısi dıhat weşandın. Dı sala 1922'an de , Sımko, jı bo nehıştına hêzên dewletê dı welat de, bı ber Sındos û Hahabad ve ber bı pêş ve dıçe û pışti berdest kırına Qerepapaxan, (eşiretek Eceman e dı navça Nexede de -N.M.) lı Mahabad hêzên hukûmetê yên Major Melikzade jı holê radıke. Pışti kuştına hêzên Melikzade, Hukumeta Tehrane dı bın seroktiya heramzadeyek Kurd Xalo Qurban de 4 hezar esker dışine ser Sımko. Lı gundê İndeqaş nêziki Mahabadê Xalo Qurban tê kuştın û eskerên wi yên jı kuştunê xelas dıbın ji bela wela dıbın.

" Dı vê navê re Sımko serxweşê serkevtına xwe bû. Kuştına Serdar Erşet û Xalo Qurban û şıkandına ordiya dewletê lı Tesoç û Mahabad, bê hesab Sımko pozbılınd kır. Navçên Azerbeycanê bı carek ketıbûn bın destê wi. Şûn û rewşa xwe hin xurtır dıkır. Dıxwest daxwaza xwe ya diroki bı cih bine. Bı van kırınan fermanrawetiya xwe ya mutlaq nêzik dıdit. Hejmara çekdarên wi nayên zanin. Belê eva han hatiye zanin ku hukmê wi dı temamê Azerbeycana Kurdıstan de rûnıştiye û meşiyaye. Pıraniya serokên êl û eşiretên Kurdan dı bın fermana wi de bûn." (8)

Gotınên peywendiya serihıldana Sımko lı gel İngılizan û ditına wi lı gel Şêx Mehmûd, hewceyi lêkolinek hin ber-



www.netewe.com

firehtır e û mıjara vê kurte behs lêkoline nine. "Serihıldana Sımail Axê Sımko, yekemin têkoşina Kurdên İranê bû jı bo bıdestxıstına serxwebûnê ." (9)

Serihıldana Sımail Axa, jı ber nebûna bernameyek siyasi û xurtbûna peywendiyên eşireti û derebegi, zılm, zor û talankırına xelkê, nedıkari dırêj bıji. Dı sala 1930 an de, bı fêl û fêlbaziya Eceman baweriya Sımail Axa bı derewan hat û lı bajarê Şıno bı destê Eceman hat kuştın.

Sala 1923 an, Rıza Şah eskerên xwe şand ser Loran û pışti tefandına serihıldana Loran, mal û xezanên wan bı aliyê navça Xoresan de hatın surgûn kırın. Kovara Xandıniha ya çapa Tehranê lı ser serihıldana Loran weha nıvisibû : "Ser-esker Emir Ehmed Axa Xan kır berpırsiyarê kuştın û bırina Loran. Pışti şıkandına serihıldanê, çarsed kesan jı risıpi û serokên Loran gırt. Wan dıxıstın rêzê û bı şûran lı serê wan dıxıstın. Pışt re bızotên agır datanin ser bırinên wan û bı serek eskeran re dıketın mıqersiyê (şert dıgırtın) , ku da dê ki zêdetır xwe hılavêje."

Dı salên 1927-29 an de, dı Kurdıstan de carek dın Loriyan seri hıldan. " Daxwaza wan ew bû, ku hukûmeta eskeri rakın û serxwebûna eşireta wan bı resmi bê naskırın, dest jı çek berhevkırına gışti bê berdan, xerc û bac bên kêm kırın, gırtına eskeriyê bê sekınandın û bı taybeti egal, kınc û bergên wan ên mılli serbest bın. Ew dıji poşi, cıl û bergên Avrûpiyan bu.Rıza Şah jı bo şikandın û jı holê rakırına Loriyan, fıroke, çek û eskerek gelek zêde da anin. Dıjitiya nevbera wan eşiretan dı dawiyê de bû sebebê şıkandına serihıldanê." (10)

Dı sala 1926 an de, lı navçên xwarê yên Kurdıstanê, Kurdan dıji hukûmeta merkezi seri hıldan. Serdar Reşit dı navça Rewanser de hêzên dewletê jı çek kır. Pışt re eşiretên Hewreman û Meriwan dı bın serokatiya Mahmûd Xanê Kanisanan û Mahmûd Xanê Dızli û Cafersane Hewrami seri hıldan. Pışti van lı Bane, Saqız, Serdeşt, Gewrık, Sosıni, Pışderi û Mılkari Kurdan seri hıldan û hêzên dewletê jı çek kırın. Serihıldaran bajarê Serdeşt gırtın û ciyê idara dewletê şewıtandın." (11)

Salên 1930-31 an , Kurdên Celaliyan dı navça Mako de dı bın serokatiya Ferzende de dıji Hukûmeta Pehlewi seri



www.netewe.com

hıldan. Dewleta Iranê dı bın fermandariya Serheng Nexçewan de 6 hezar esker bı 1200 heramzadeyê Kurd ve şand ser Celaliyan. Dı dawiya meha Banemeri a (ev meha bı roja yekê Nevrozê dest pê dıke, yani dı 21 ê Adarê dest pê dıke- wergêr) 1931 an de, Kurdan êrişek bırın ser hêzên dewletê, nêziki 700 kesan jı wan kuştın û bırindar kırın. Hejmara Kurdan dı wi şeri de nêzikê 1000 kesan bû. 700 -800 kes jı Kurdên Celaliyan û Heyderiyan û 300 kes ji jı Kurdên ku dı Tırkiyê de dıjiyan lı gel wan beşdar bûn. Jı bo jı hole rakırına hevkariya Kurdan, guftûgoyen hukûmeta İran û Tırkiyê çêbû ku Irak ji tê de beşdar bû." (12)

Dı navbera her du şerê cihanê de, ku hukûmeta İranê Kurdan bı çek bêdeng kır, eva han neticekgelek nebaş çêkır. Hınek eşiretên Kurdan bı tevayi jı holê hatın rakırın. 10 hezar kes jı eşira Celaliyan ku dı sınorê İran, Tırkiyê û Sovyet de dıjiyan bı ber merkeza İran de hatın surgûn kırın, sala 1941 an , tenê jı wan çen sed kes vegeriyan welatê xwe.

"General Ehmed Axa Xan jı ber seribırina Loriyan bı navê 'Qesabe Lorıstan' dıhat bı nav kırın. Her bı vi awayi vê yekê bı serê eşira Gêlbaxiyan de ji anin. Ewan surgûnê navçên Hemedan û İsfehan kırın û dı ciyên wan de Tırkan anin bı ci kırın. Vê surgûn kırına han bû sebebê wê ku Gulbaxi bı çiya kevın û dıji dewletê şer bıkın. "(13)

Em lı ser bızav û serihıldana Kurdan, lı gora hınek nıvisar, diroknıvis û siyasiyên nû yên Kurdan na sekının. Ku dıbêjın guya ev bızav û serihıldanên han xwedan bernamên ê armanca wan a siyasi roni nebiye û serokatiya wan eşiret û derebegan kıriye, jı ber vê ji serihıldanên siyasi, netewi û welatparêz nının.

Tırsa ev cûre nıviskarên han ewe ku nasyonalist neyên zanin,jı ber vê yekê ji çavên xwe jı ya han re dıgırın,ku van serihıldanen han berê hemû tıştan dıji desthılatên diktatori yên biyani bûn. Her tıştek ji nebe, xwestıne ku navçên Kurdıstanê dı bın desthılata wan bı xwe de be. Nexwestıne biyani dı ser serê wan de hakımiyê bıkın. Jı bo ku weha bû nişanek neteweyetiyê pê ve diyar e. Lê ger ku bêjın nehıştına desthılat û sistema derebegi mımkûne hengaveki xerab nebe, lêbelê, ew hukûmetên van serihıldanan jı holê rakırıne, ne hu-



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

kûmetên mılli, demokrat û pêşkevtixwaz bûne, Jı ber ku hukûmetên destıkên İngılız û kevneperest, diktator û bê qanûn bûn, Rıza Xan bı xwe xwedanê mezıntırin mılk û derebegê İran bû. Hukûmeta wi ya şovenist û nıjadperest helandına gelê Kurd kırıye.

Jı ber ku wıhaye, lı gora bir û baweriya mın, serihıldanên dıji hukûmeta Pehlewi, her çı ji bıbın jı wê pêşkevtitır bûn. Serihıldanên netewa bındest bûn û xalek welatpareziyê bı wan ve diyar bû. Rejima Rıza Şah jı xeyri Farısan qet neteweki dın dı İran de bı awaki resmi qebûl nekıriye.

Zıman, edeb û kultura Kurdi qedexe kırıbû. Lı ser deriyên dewletê hatıbûn nıvisandın; "derveyi zımanê Farısi axaftın qedexe ye" . Hetta zarokên Kurdan dı dıbıstanê de û dı bêhnvedana navbera dersan de ji nedıkarin bı Kurdi bıaxıvın. Bı nıvisandın, bı teblixat û bı zorê, jı bo Farıskırına Kurdan hewıl dıhat dan.

"Siyaseta karbıdestên Farısan lı ser netewên kêmayeti (eqaliyet -wergêr) yên dın û Hukûmeta nasyonalist a Farıs a bı seroktiya derebeg û burjuvaziyê Farıs lı ser navçên danıştıwanên gelên dın ên İran hakım bûn. Dı wexta Hukûmeta Rıza Şah de, ne ku her tenê tevgerên gundiyan beşdarên serihıldanên eşayiri ji dıgırtın, bir û baweriya azadixwazan bı tundi serkut dıkırın." (14)

Dı sala 1928 an de, cıl û bergên netewi hatın qedexe kırın. Lı gora fermana Pehlewi, hewce bû gel çakêt û pantorên Avrupayi û kumê Fransi lı xwe bıkırana. Lı Mahabad dıji vê fermanê, ku şûneware mılli nedıhışt, xwenişandan hatın saz kırın û nêziki 500 kes lı ser vê bûyerê hatın gırtın. Qedexe kırına cıl û bergên Kurdi, ku xal û nişanên neteweyeti bun bêzari û nerızayiya gel xurt kır û herıkand. Bû ciyê behs û lêkolinên mırovên Kurd ê dini.

Mele Xelilê Goromer lı navça Mangoran, ku zanayek bı nav û deng, mırovek xwedi hurmet û prestij bû, lı dıji fermana poşi, cakêt û pantor û danina ser şewqê Fransi rabû. Mele Xelil dızani, ku nehıştına cıl û bergên Kurdi, jı holê rakırına şûnewarê neteweyi ye. Dıdit ku ku jendırmên har û qazaxi bırçi, bı heceta (bahana) wergırtına cılên Fransızan dıketın nav gel û xelkê talan dıkırın. Ewan dıditın ku jı bo bırêvebırına vê qanûnê, navrana şalên hezaran Kurdan



www.netewe.com

bırin û bê ihtıramiyê lı gel dıkırın, peç û mëzeran dışewıtandın, kum û kefiyên melan dıqelaştın, gırami û hurmetek jı bo şûnewarê Kurd nedıhıştın.

Lı ber çavgırtına hal û mercê wê dema Kurdıstan û kêmbûna hışyariya netewayeti, kêmbûna xwendewariya gel; Mele Xelil nedıkari bı navê serihıldana mılli û Kurdayeti bangi gel bıke. Mıjara dini jı bo vê mesele anibû holê û sewqe danina serê xwe bı kufri dıda diyar kırın û têdıgehand ku çı kesên şewqê Frensi bıde serê xwe dıbe kafır. Dozê jı gel dıkır, ku teslimi vê fermane nebın û dıji hukûmetê serihıldın. Lı gel melayên navça Mukriyan peywendi dani û dozê jı eşiretên Kurdan kır, ku pışta wi bıgrın û dıji fermana hukûmetê bısekının. Melayên navça Mukriyan her çend pıraniya wan lı gel fetwa Mele Xelil ji bûn, lêbelê, lı gora parastına xesleta (huy, tabiat- wergêr) xwe û edet kırına teslimiyet û şukrana bı qeza û qedera xwe, jı derveyi Haci Bayizaxayê Elxanizade pê ve kesek jı melan ber bı dengê mele ve (mebest mele Xelil e-wergêr) neçû.

Serek eşiret û derebegên Kurd jı ber dıjiti û bëganeperesti (yabancılara tapma-n.m..) ya xwe, jı derveyi eşireta Mangor û beşek ji jı Gewrıkan, ne ku her tenê ber bı banga Mele Xelil ve neçûn, lı gel Eceman û eskeran kom bûn û dıji Mele Xelil derketın. Hukûmeta Tehranê eskerek gelek zêde dı bın serokatiya Sertip Muzaffer Dewle de ani ser Mangoran. Serokeşiretên beganeperestên Debokri û Mameş, alikariyê dan eskerên Eceman û pışti heşt mehên dın serihıldana Mele Xelil hat şıkandın. Mele Xelil lı gel hınek Mangoran derbazi Kurdıstana Iraqê bû û pışti du salên dın Hukûmeta Tehranê dılxweşi dayê û cardın vegeriya. Vê carê ket xiyanetek mezın (mebest Mele Xelil e- N.M.), ku dıji Komara Kurdıstan sekıni û hetta fetwa idama Pêşewa Qazi Muhammed imza kır.

Pışti şıkestına serihıldana Mele Xelil, Hukûmeta Rıza Şah, ne her tenê cıl û bergên Kurdan qedexe kır û vi şûnewarê netewi jı holê rakır; her wıha hakımıyeta hêzên eskeri (cendırme) yên tıryaki ji lı ser çarenıvisa gelê Kurd da tesis kırın.



www.netewe.com

## REWŞA ABORİ Û CIVAKİ YA KURDISTANÊ

Pışti kuştına İsmail "Sımko" û jı holê rakırına serihıldana Kurdısna xwarê (nıviskar bı vi awayi bı nav kıriye û mebest jı vê gotınê Kurdıstana Başûr (Iraqê) ye) û şıkandına tevgera Mele Xelil, Hukûmeta Rıza Şah dı warê eskeri de desthılata xwe lı ser Kurdıstan ci bı ci kır. Çekên dı Kurdıstanê de heyi berhev kır. Ew serekeşiret û derebegên ku nêçirê jı bo Hukûmeta Pehlewi kırıbûn û bıbûne berdesk û berçov, ew jı ber destê jendırman û serbazên eskerên dewletê bêmecal ketıbûn. Serekesker û jendırmên navçên Kurdıstanê, lı Tehran jı fermandarên mezın icare dıgırtın û bertilên mezın dıdan ku lı Kurdıstan jı bo wan kar bê dayin. Ewan ji lı Kurdıstan dest davêtın talan û şelandınê û çendin car zêdetır jı Kurdên feqir û bındest dıstandın.

Zana û nıviskarên bı nav û deng ê Kurd Mamoste Hesen Qızılci dı "Pêkeninên Geda" (Pekeninên Parsekan) dı "Çirokê Qur'an Xwendın Le Ciyati Pareyi Bertil da" (Dı Şûna Perên Bertilê de Xwendına Çirokên Qur'anê) de gelek bı awaki xweş rewşa jendırmên Pehlewi roni kıriye.(15) Jendırme bı bahana bıcianina fermana guherina cıl û berg bı bahana çek sıtendın û bırına mırovan jı bo eskeriyê, bı nav Kurdıstan ketıbûn û jiyan lı xelkê tal kırıbûn. Jı qewlê Haci Siyah " agıreki wılo bera mal, can û namusa xelkê dabûn, ku kafırek lı mısılmaneki nake."(16)

Jı bo karek bıçûk an gazınek bê tûne, 5-6 jendırme sıwar dıbûn, heftek lı gundan dıgeriyan û lı ser pışt û zıkê xelkê wek hovan dıxwarın û pêpez dıkırın. Bı bahana gerina kel û pelên qaçax, lı malên xelkê dıgeriyan û iftira lı xelkê dıkırın, (bı Ecemi iftira kelimek bı nav û deng e) wısa lê hatıbû wextê jendırme dıhatın, dıvê xelkê xwe dı nav gundê



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

xwe de veşartana an ji hewcebû bı lez pere kombıkırına û bıdana wan û nehêlana lı gund peya bın. Lı gundê Ceran dı mıntıqa Piranan de jerdırme hatıne nava gund. Xelkê komkırıne û hespê xwe dane merıveki ku bıgre. Hesp ranewestiyaye û merıv bı zmanê kulani gotiye:"Segbab jı bo çı tu nasekıni?" Jendırme ku hınek jı zmanê iftirayi bı Kurdi fam dıkır, lı merıv vedıgere dıgre û dıbêje : " ha ... tu jı hespê Şah re xebera dıbêji?" Hewceye tu bıçi Xanê. Te xeberan jı hespê Şah re gotiye, loma ji jı dewletê re daye." Dev jê bernadın heta lı ser tikaya bavê wi, ku Tırki û Farısi dızani, jendırman bı pênc tumenan razi dıkın ku merıv nebın Xanê.

Jı bo rewşa han jı rastiyê dûr nekeve, ku ez dıkarım bêjım lı sertanseri Kurdıstanê Şêx Celalê Tahıri lı navça Sındos, tenê kesek xwedan mılk bû, ku ne her tenê dıjitiya jerdırman dıkır, lê belko rê nedıda jerdırman bıçıne gundê wi ji, ger karek wan hebûya jı dûr ve bangi muxtar dıkırın û vedıgeriyan. ( Bınêre; Cılda Yekem Biraninên Mın-Nıviskar)

Dı hêla abori de, Kurdıstana İranê dı rewşek paşvemayi û feqirtiyê de hatıbû hıştın. Derveyi petrola Kırmaşan, lı seranseri Kurdıstanê yek fabrike û kargahek pişesazi û bıngehek berhem aninê nedıhat ditın. Gundiyên Kurdıstanê dı bın du cûrê zılm û kedxwuriyê de, jiyanek gelek tahl û dıjwar dıbûhartın. Jı ber sistema netewayeti, zor û zordestiya jendırman dı mıleki de, zıbare (karkırına bê bedel, belaş -N.M.) bac û xeraca derebeg û xwedan mılkan, faiz û selem xwaran ji dı mılê dın de nefes lı jar û feqirên cotkarên gundi hatıbû bırin.

Ev derebeg û xwedan mılk ên tırsonek û bêganeperest ku dı bın destê jendırme û memûrên hukûmetê de sıtûxwar, bêdesthılat û bêçare bûn, lı ser gundi û re'iyayên gundi har û bêperwa û "axa" bûn.



www.netewe.com

Cotkarên Kurd, jı derveyi para malıkanê jı kışt û kalan (ziraat), ku lı gora bıcianina sêra navçên Kurdıstan (dehan dıdu, sısiyan yek an ji nivekar) dıhat qebûl kırın hewce bû, serane, bac, xerac û faiz ji bıde axa. Ku evên han lı ser hatıbûn tespit kırın...

"Serane an zıbare, mırişk, hêk, pez, hıri, paleti, ka, piroz kırına cejnan, hediye, muxtari, kehya, sergin, benda avê û tıştên ditır."

Serane an zıbare : Eva bû; hemû re'iyayê gundi hewce bû salê çend roj bı zıbare, bê heq jı bo axa kar bıke. Hınek jı gundiyan rojên zıbarê dı şûnê de pere dıdan, jı vê re dıgotın serane. Dıbêjın lı gundê Kerê Zeyigılı nêziki Bukan, 13 axa û 12 re'iyet dıjiyan. Yekek jı axan bûbû karkırê re'iyetek xwe û bı heq jı wi re kar dıkır. Lêbelê dı mehê de çend roj nedıçû kar. Kabırayê cotkar jê re gotiye jı bo çı tu nayi kar, karê mın sekıniye?

Ê dın dıbêje :

–Van rojan ez jı ber rojên zıbarê hesab dıkım. Ez nayêm kar dı şûna rojên zıbarê de.

Mırişk : Hemû malên gundiyan hewce bûn, ku dı salê de çend mırişk bıdana axa.

Hek : Hemû malên gundiyan hewce bûn dı salê de çend hêkan bıdana mala axa.

Pez : Ew malên xwedan pezên zêde bûn, hewce bûn dı salê de çend heywanên goşt bıdıne axa. Dı hınek navçan de jê re dıhat gotın "goşti". An ji dıviya jı sed miyan miyekê zekat bıdana axa. Dı hınek navçan de jı çıl seri pez yek dıhat sıtendın. Dı hınek navçên dın de ji, lı hev dıhat kırın û çend heywan jı axa re dıhat dan, jı dana bı vi awayi re "mexte" (hınde dıdım) dıhat gotın.

Hıri : Hemû malên xwedan pez hewce bûn salê çend hı-



www.netewe.com

riya bıdana axa. Hewce bû keçên gundiyan vê hıriya han bışûştana û şeh bıkırana. Pışt re lı ser malan dıhat parvekırın ku bırêsın. Jı vê re ji "teşiyane" dıhat gotın.

Paleti (Dasane) : Dı hınek navçên Kurdıstanê de, cotkar çend palên wi yên giya çınînê hebûna, hewce bû serê palê hınek pere bıdana axa.

Ka (Kayane) : Hemû malên cotkaran hewce bû çend têr ( dı hınek ciyan de pivana kayê bı telis an ji bı palasan tê kırın- N.M.) ka, an çend gurz giya û yan ji erebek ka bıdana mala axa.

Sergin (Tepelane) : Hemû malên cotkaran hewce bûn salê hejmarek sergin bıdana mala axa. Jı bılî vê, hemû malên gundiyan, her sal hewce bû çend bar dar û an goni lı gora edetê navçê, şewat jı bo mala axa bıaniya. Lı Şehriwêran û Sındos mılê Dêbukriyan hemû malên cotkaran hewce bû bıçıne heta nêziki Şuşewan mılê Eceman jı Payin, erebek dar jı bo diwanxana axa binın. Eva han riya du şev û du rojan bû. Gelek caran dı vê riya dur de merıvên feqir, jı cot û karên xwe dıbûn û pê de dıçûn. Hınek axayên Debukriyan vê yekê du caran bı wan dıdan kırın.

Bendên avê (Bendewan) : Hemû malên gundiyan hewce bûn jı bo sê mehan mıroveki bıdaya axa. Derveyi vê, ku bıharan dest bı bend û paqıj kırına coyan dıhat kırın, hewce bû xaniyên axa bên sıwax kırın, heri bı wan dıhat çekırın û xaniyan bı wan dıdan dırûst kırın û.h.w...

Ev karên han bı taybeti lı Çemê Mecitxan, Şehrwêran, Şamat û Sındos edet bûn.

Çûna cejnê (Cejnane) : Hemû cejnan hewce bû danıştıwanên gund bıçın ba axa. Jı devê, hesp, gayê cot, kavır, beran û nêriyan bıgre heta mırişk, hêk û şekırê çayê jı bo axa dıbırın. Ger axa jı seferek dûr ji hatıbûya, hewce bû bı vi



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook

awayi bıçûna seritêdana wi.

Pêşkêş : Ger lı gundeki, qizeki mêr kırıbaya an ji kurek zewıcibaya, hewce bû hediyek hatıbûna pêşkêş kırın jı bo axa. Bahayê pêşkêşê lı gora rewşa kesa dızewıci bû. Jı hesp, gayê cot û beranan bıgre heta perên neqit dıçû. Derveyi tıştên jı bo axa dıhatın pêşkêş kırın, hewce bû loqmeyek ji hatıbûya avêtın pêşiya muxtar, kehya û ew ji bıhatına razi kırın. Lê, ger qizık xweşık bûna, axa rê nedıda ku bı xelkê gundiyeki dın re bızewıce.

Muxtari, an kehyati (Kuxayane, gızirane) : Heq û huqûqê muxtar û kehya dı sıtoyê gundiyê feqir de bû. Axa kehya dıbıjart ber bı pêsir û delıngê xelkê ve berdıda û heqê wi ji jı xelkê dıstand.

Mal bırın - ci guhertın : Cotkar û gundiyên Kurdıstanê jı ber zılm û zora derebeg û jiyana nediti, çıqas dıçû naçar dıbûn û jı gundeki bar dıkırın gundeki dın. Ger cotkar malek dewlemend bûya, axa bahane lê dıgırt û heta bertil û şêrini jê nestenda nedıhışt mala xwe bıbe. Ger, ku bıçûya nav eşirek dın, wê çaxi eva han mırına wi bû. Hezar bela bı ser de dıani, malê wi jê dıstend û pışti hezar belan xelas dıbû.

Lı beşeki Gewrkayetiyê, heta van dawiyên han ji gundi bı zeviyan ve hatıbûn gırêdan û nedıkarin bar bıkın

Dı hınek navçên Kurdıstanê de rewşa derebegan wısa bubû, ku jı bırçinan nan deyn dıkırın. Lê derebeg bûn. Dı payiz de şir jı malan dıstendın û dı tenekan de hêvin dıkırın û bez dıhelandın lı ser dıkırın da ku zıvıstanê bıbın xwedi mast!

Tutın û sılk dı Kurdıstan de lı gora parvekırına axa û gundiyan : Sılk û tutın lı gel axa nivekari bû. Lêbelê, qet cotkareki ji nedızani buhayê tutın û sılkan bıçiye. Nedızani heq



www.netewe.com

û berê zehmet û astenga salek wi, jın û zarokên wi çıqas e û çıqas para wi dıkeve. Dıviya destê xwe lı ber axa veke, axa lı gora mırovatiya xwe (ku qet mırovati lı gel tunebû) çıqas dayê şukr bıke û dengê xwe neke. Nedıkaribû bıpırse perên tutına wi çıqas bûye. Dewlet axa nas dıkır û hesab lı gel wi dıkır. Gelek caran weha ji çêbûye; merıvê cotkar û tutınevan çûye bajêr perê tutınê bıstine, wextê axa hesab lı gel kıriye tıştek jê re nemaye. Merıv, jı tırsa dıkandarê bajêr û deynê xwe rê guhertiye û dı kolanan de derbaz bûye, da kes pê nehese, bı awaki sar û destvala çûye nav mal û zarokên xwe.

Gelek caran weha ji bûye; lı ser bênderan kesên cotkar, pışti para axa, berdewan, serkaran, muxtar, mela, şıvan, gavan û deynê faizxweran tıştek jê re nemaye û gav bı gav bı destvalayi ber bı mala xwe de çûye. (Bınêre; Cıldê Yekem ê Biraninên Mın)

Feqir û hejarên Kurd, jı ber bêkari û tuneyiyê dıçûn mılê Eceman û Çoxri Urmiyê bı karkeriyê heqê nan jı xwe re peyda dıkırın. An ji yê kerek wi hebûya dıçû jı Ecemistan mewij û dımıs dıani û bı genım dıguheri û nanê tısi jı bo zarokên xwe peyde dıkır.

Ez jı Urmiyê peyati dıhatım Sındos. Lı geliyê Samortê lı gundê Delo gelek zêde westiya bûm û jı bırçina hışê mın nema bû, lı ser kaniyekê mıroveki mêj dıkır. Mın sılavê lê kır û pışt re mın gotê : Tu dıbêji malek heye ku ez bıçım pariyek nan bıxwım?

–Hey mala te xerab nebe. Lı Kurdıstanê, tu çawa pırsê wıha dıki? Fermo em bıçın mala bıraye te. Em çûn mala merıv. Xaniyê mezın, jı bıli yek-du hesir pê ve qet tıştek tê de tûnebû. Nan û dew ani. Mın jê pırsi; lı mın bıbore lê hûn çawa dıjin û çiyê we heye?



www.netewe.com

--Xwediyê malê mırovek qısexweş û bı zewq bû. Bersiva mın da û got : "Rûyê mın jı te şerm e, bereket dı goniyên hamın de ye, nok û taqe kerek mın pê ve tıştek mın nine. Havinan dıçım lı Dızê û jı Samortê fêki (meyve) qerz dıkım, dıbım van gundan û bı dexıl vedıguhêrım. Dı her çûnek xwe de nanê xwe yê salekê peyde dıkım.

Kurdıstan dı rewşek wıha de dıjiya. Jı sedi notpencê xelkê nexwendi bû. Riya çûna zarokên Kurd a dıbıstanê tune bû. Yên bajaran ku karıbûn zarokên xwe bışinın dıbıstanê, hewce bû Farısi bıda xwendın. Derebeg û serekeşiretên Kurdan jı xwendın û zaninê dısılıkiyan. Zarokên xwe danetanin ber xwendınê. Heta vê gotına han a vala, dı diwanxanên axan de dıhat gotın : "Nabe ku kurê axa bıxwine jı ber ku hiz dıbe."

Her çıqas Hukûmeta Rıza Şah dı riya jendırme û sistema eşayiri, esker û qanûnên cûr becûr de desthılata xwe ci bı ci kırıbû, bı hemû awayi bir û baweriya azadixwazi xenıqandıbû û bıhin lı xelke çıkandıbû, lêbelê, cardın ji jı ber bêzari, acız bûn û serihıldana xelkê dılê wê rehet nebû. Sala 1935 an, qanûna diyarkırına muxtariyê dani. Lı gora vê qanûnê, hewce bû dı hemû gundan de muxtari hebûya. Muxtarek jı aliyê xwedan mılk de dıhat diyar kırın û lı ba idara dewletê nûnerê xwedan mılk bû. Lêbelê, heq û huqûqê wi lı ser sıtû û mılê xelkê bû. Muxtar, berpırsiyarê qanûnê û parastigerê avahiyan bû. Dı vê riyê de bı xêra muxtariyê hukûmetê gundan dıxıst bın çavderi û qontrola xwe. Muxtar dıviya ku jı hatın û çûna xelkê haydar bûya û lı ser gund çavdêri bıkıra, her mehê rapora kar û barê gund bıdana jendırmê navçê. Muxtari bûbû bareki dın lı ser kedkaran û wi ji her xelkê dışêland û bûbû şırikeki baş ê jerdırme.



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook

## ACIZÎ Û BÊZARÎYA XELKÊ JI REJIMA PEHLEWÎ

Dı wextekê de serekeşiret û derebegên Kurd lı hemberi dar û dezga Hukûmeta Rıza Şah şerpeze bûbûn û serên xwe jê re tewandıbûn, komên xelkê, zehmetkêşên bajêr û gundan, bı metelok, dı riyên fetılandi de, dı sıtıranên bın diwar, mızgevt, kani û ser avan de, bêzari û dıjitiya xwe jı rejıma Rıza Şah eşkera dıkırın. Navên jendırman danibûn "quleşin" , "mırişkxwar", "tıryaki" û.h.w.

–Reza keçeliş bote Şa

– Le pineçitiyewe pêgeywe

– Koneqazax, pêlawi le pê da ne bû

– Ecem qet deselati nebê

– Desti Smail axa yan le ser be ziyad be *

Şaır û sıtıranbêjên Kurdıstan, bı sıtıran û kılaman nıfır lı Rıza Şah dıkırın û bêzariyên xwe dıdomandın.

"Ya xwa Reza Şa cût kurıt mırê – Qet bûwe icbari le Kurdi bıkrey

Ya xwa Reza Şa textıt wergerê – Serbazi Kurdi deba bo şeri

Kurım gewre kırd be qendi şari – Resa Şa bırdi le bo icbari." **

---

* – Rızayê keçel ji buye Şah

– Jı pineçitiye gihaştiye

– Kevneqazax, pêlav ji dı lıng de tunebû

– Hukum nekeve destê Ecem!

– Deste Smail Axa jı ser wan kem nebe

** – "Maşale cot kurên Rıza Şah bımrın – Bı vi hawi zordesti lı Kurdan dıke.

Maşale textê Rıza Şah wergere – Serbaz Kurdan



www.netewe.com

Dı Mukriyan de lı ser nıfır, dua û bêzariya jı rejıma Pehlewi hewayek dın dakete holê û lı ser dev û zmanan belav dıbû :

Hel negri wey hel negri, hel negri le Pehlewi
Ya xwa textıt wergerê bılindıt le bın newê
Hel negri wey hel negri, hel negri lew paşaye
Rebi textıt wergere bo xatıri em Xudaye
Hel negri wey hel negri le Pehlewi zulmi zor
Rebi hewt kurıd mırın bo xatıri Ehmedi Kor *

Hınek şaır û zanayên navçeya Mukriyan ji bı helbestên hêja doza Kurdayeti û welatpareziyê roni dıkırın û giyanê (ruhê) netewayeti yê xelkê han dıdan. Zêdetırin, van helbestên han jı hucrên feqiyan belav dıbûn. Helbestên "Kurdine" yên helbestvanê zana û welatparezê bı nav û deng Ebul Hesenê Seyfi Qazi dı wê wextê de karê kıriye lı ser giyanê xelk, heta nıha ji her gırıng e û hewce ye ku em dersan jê bıgrın :

Kurdine ta key ême le şaran misali dêw
Dêna û deçin û bo me nebê qet xudan û xêw
Xelki hemû le bax û le şaran e kêyfxoş
Êmeş bılaw bê sere mawin le deşt u kêw

---

dıbın şer.
Mın lawê xwe bı şekırê bajêr mezın kır – Rıza Şah gırt bı zorê bır.

* ( Xwedêwo) Je'r nehêli je'r nehêli, jı Pehlewi re nehêli
Maşale textê te wergere lı bın te bılın nebe
(Xwedewo) Je'r neheli, ......, ...., jı vi paşayi re neheli
Rebi textê te wergere, jı bo xatırê vi Xudayi
(Xwedêwo) Jı zılm û zora Pehlewi re nehêli
Rebi heft kurê wi bımrın jı bo xatırê Ehmede Kor.



www.netewe.com

Bo asman deroyn le behra deken sefer
Her arz e nıştigahi me sen'at e werd û şêw
Reyi wane kehkeşan û reyi eme berdelan
Cêy wane text û bext û cey ême berd û çew
Reş male mal û keşk û penire met'ai me
Qesr û serayi xelki di ye pır lı zêr u zêw
La heldıraw û cegbıraw û firêdıraw
Bê swên û bê nişan û perişan ın û peşêw
Fıkri le hali xo ken û bıgrin be hali xo
Her bêseriw edaweti xotane dête xotane
Çun dıjmının degel yek û nitan e yekiti
Ratan deden be cari le hewrazi bo nışiw
Jêrdesti û ita'eti bêgane ta bı key
Şerm e lebo me hinde bıjin bê nişan û nêw
Mexmûni her ma'amele mehkûmi her kesêk
Şahan be mehwi ême debestın gırêw gırêw (1)
Gurdani Kurdekan be xwa roji hımmet e
Dest deyne xenceran û piyawane bêyne nêw
Her kes ke pır tewawi heqi babi xoy newê
Ew bêbeş e le Kurdi, deriken neyate nêw
Bo çi man e mal û ser ke le ser serweri neçê?
Kurd nabi qet bıtırsi lezindan û dar û çew
Pê helgırın bıgeynê ke şer bo me şayi ye
Destêk gırın dereng e cehêlane bıçne nêw
Ew jini bew zelalête bo çi e çaweken
Bımrin le rêy necati weten bo be ner u mew
Serçûni text royini serdari pê dıve
Xoşime lew şehadeti şêxane nêw be nêw (2)

(1) Mebest Peymana Sadabad, yani; Peymana İran û Tırkiyê ya sala 1932 an e.

(2) Mebest, şehidbûna Şêx Seid û hevalên wi ne.



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

Kwan şêre Kurdekan ke le tırsiyan delerzi erz
Kê bo le Şamê Şa bu Mısrê bıbûwe xıdêw
Azadi, serbexoyi, miriw gewreyi
Dawa bıken be zar û zıman û dıdan û lêw
Ta key le baxi xelki be zizi û be mılkeçi
Xoş e le baxi ê'li çinini henar û sêw
Her mılleti le lawe heqi xoy be destewe
Kurdi ke ser helêni delên bute ser bızêw
Bo wane herçi cıwane le cê dê lê jın le mal
Her şax û dax e bo me kuri reş kıçi dızêw
Her çi debê bela bıbê heq her delê Hesen
Eme le rêy weten xemi derkırdın û cınêw *

---

* Kurdıno, heta kengi emê lı bajaran weki cınawıran bın Em tên û dıçın tu kes xwedi lı me dernayê/ Xelk hemû lı bax û bajaran kêfxweş ın/ Em ji bela wela mane lı deşt û çiyan / Ew ber bı asman de dıçın, dı behran de seferan dıkın / Her erd e rûnıştıngehê me, zıkır(werd) û şiv sın'et e/ Riya wan riya kadızan û riya me kevır û kuçık / Ciyê wan text û bext ın, û ciyên me kevır û çiya ne / Mala me kon û qûtê me çortan û penêr / Qesr û semayên xelkê dın bı zêr u ziv dagırti / Jıkdınyayi, kezebpenti û hati vırvırandın (avêtın) / Bê şûn û bê nişan û perişan û muzderibın em/ Fıkra halê xwe bıkın û bıgrin bı halê xwe / Her beşeri û dıjmınatiya we bı xwe ye tê navê / Lewra hûn dıjmının lı gel hev û yekitiya we tune / Berê riya we bı careki de jı hevraz dıguherın ber bı jêr/Jêrdesti û itaata jı biyaniyan re heta kengê/ Dı her kari de mafê wi tê xwarın û zulma herkesi lê dıbe/ Şah jı bo mehfa me peymanan lı ser hev gırê bı gırê gırêdıdın/Qehremanên Kurd bı xwedê roja hemetê ye/Dest bıdın xenceran û bı mêrani werne nav / Herçi yê ku bı temami



www.netewe.com

Roni ninın ka ev helbestên han kijan sale hatıne nıvisandın, lêbelê, wısa diyare ku dıbe dı salên 1930 an de hatıbe nıvisandın, jı ber ku sala 1932 an , İran û Tırkiye peymana dıji Kurdan imza kırıne.

"Dı 23 yê kanûna paşi ya sala 1932 an de, lı ser diyar kırına sınor û bı hev re tefandına tevgera eşiretên Kurdan ên lı ser sınorê İran û Tırkiyê, dı navbera van herdû welatan de peymanên taybeti hatın imza kırın."(19)

Hewceye ku ez eva han ji bêjım, ku ev helbestên han carek dın ji jı bo vê yekê bı destûri hatıne belav kırın. Dı van dawiyan de diwana camêrê gıranbıha Seyful Qazadım, Ehmedê Qazi pê re gehişt (destê wi xweş be), kom bıke û bıweşine.

---

heqê bave xwe nede / Ew jı Kurdi bê par e, derêkın bıra neyê navê / Ger dı riya canfıdayiyê de wê neyê dayin, seri û mal jı bo çiyê me ye? / Kurd nabe qet bıtırse jı zindanan û dar û çoyan / Rakın têbıgıhijın ku şer jı bo me şayi ye Bı destê hev bıgrın dereng e, cahılane (xortane) bıçın nav/ Ve jiyana bı wi zeliliye çı jı te re çave mın/Bıra bımrın dı riya xelasiya weten de jı bo me nêr û mê (jın û mêr) / Serçûna text meşek canfıdayi dıvê / Xweşım wan şehadetên şêxan nav bı nav / Kawan şêrên Kurdan ku jı tırsa wan erd dılerızi / Ki bû lı Şamê şah bû lı Mısre Hidiw / Azadi, serxweyi, desthılatdari û mezınayi / Dawa bıkın bı zar zman û dıran û lêv / Ta kêngi, dı baxê xelkê de bı rezili û stuxwari/ Xweş e dı baxê malê de çınina hınar û sêv / Her mıleti lı aliki heqê xwe bı destxıstiye / Kurd ku seri hıline dıbên bûye isyankar / Jı bo wan ne tıştê başın, çı ci, jın û çı mal/ Jı bo me her çiya ne û kuren bêxer u keçên reşotanki ne/ Ki dıbe çı bıra bıbê, her Hesen heqiyê dıbê / Emê lı riya weten xemrevandın û xeber ın.



www.netewe.com

Dı wan wextan de helbestvanên dın ji bı helbestên welatparêzî yen ku giyanê Kurdayetiyê han dane û lı hember giyanê siyaseta şovenisti ya Hukûmeta Pehlewi dengên xwe nebırine, çok dananine erdê û bı awayê cûr be cûri bêzariyên xwe dane diyar kırın.

Kedkarên Kurd her çend dı riya tevgera rêxıstınên siyasi de neyê ditın,lêbelê,dı her navçek Kurdıstanê de ku fırketıbe destên wan, bê hesab kes jı jendırman kuştıne û serêşiyan pek anine.

Sala 1936 an lı muxtariya Golê Çumelan lı navça Şehrwêran serokê qereqola jendırman dıçe qehwexanê. Qehweci nan û xwarınê jı bo wi dırust dıke. Belê, bı bahana bahabûna nan û çayê, jendırmê bêşeref dıxwaze dest dırêji jına wi bıke. Qehweciyê hejar wek camêran lı hember radıbe û bı awaki xweşık serê wi jêdıke û dıçe Mahabad teslim dıbe. Heta xıstına rejıma Pehlewi ew kes dı gırtigehê de bû.

Lı navça Mameşan lı nêziki gundê Gırdebın du jendırmê, ku lı kerepolê dıgerın, êrişi du xortê Kurd ên hejar dıkın, ewan dıgrın û dıxwazın wan bıkın mıjara pêkenin û henekên xwe û pere jı wan bıstinın. Dı destpekê de xort dest lı ber wan hılnaynın. Dawiyê naçar dıbın, lı hemberi wan radıbın, tıvıngên wan jı destên wan dıstinın û herdûkan dıkujın û derbazi Kurdıstana Germin dıbın. Bûyerên wıha gelek bûn û wek ku van ji dıdan xuya kırın, Kurdan hê hevi û baweriyên xwe wenda nekırıbûn.

Dı salên 1934 û 1935 an de, mırovek xwe naskıri yê Kurd û risıpiyê eşireta Sosıniyan Omer Hemesor, ku bı navê "Omer Paşa" dıhat naskırın, lı navça Serdeşt lı dıji Eceman seri hıldıde. Zılm û zora jendırman, kerepûl xwarına memûrên hukûmetê bı bahana cıl û berg, bırına esker, bac, qeyit kırına nufûsê, nav nıvisandın jı bo eskeriyê û barê maliyet, wı-



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

sa lı mılletê kırıbûn ku ev kırınên han nema êdi dıhatın qebûl kırın.

Omerê muxtar êl û eşireta xwe lı gundê Qelereşa berhev kır û jendırmên wê mıntıqê jıçek kır û got : "Nabe ku Ecem derbazi vi mıli çemê Kelwê bıbe." Omerê muxtar xwestiye, ku jerdırme neçın mılên aliyê Sosıniyan, Jı Sosıniyan jı bo eskeriyê mırov neyên gırtın, bac û xerac lı ser wan neyê zêde kırın, çekên wan jı wan neyên sıtendın, dı warê wergırtına poşi, cıl û bergên Kurdan de azad bın. Hukûmeta Ecem van daxwazên bıçûk lêbelê gırıng qebûl nekıriye. Esker bırıne ser wan û Ecem şıkiyane. Fermandarê beşa topçiyan Heyder Elixan hatiye kuştın. Dı nav xelkê de lı ser kuştına serbazan bı cûre cûre gotın belav bûne. Yeki dıgot; "sed serbaz hatıne kuştın", yeki dın dıgot; "dused serbaz hatine kuştın." Hêviya xwe dıgıhandıne 500 serbazan. Hınekan ji dıgotın; "Qır ketiye navê û çol jı kuştiyan tıji bûye."(20)

Hukûmet vê carê ji, her Kurdan dı dıj de rakır û serihıldana Omerê muxtar şıkest, jı ber gırıngiya wê hin ji, dı nav xelkê de behsa wê te kırın. (Bınêre; Çirokên Hesen Qızılci, Pêkeninên Geda)

## AJARDANA TÊKOŞİNA SİYASİ DI NAVÇA MUKRİYAN DE

Dı salên nabena 1930 1937 an de, komeleke bıçûk a siyasi dı navça Mukriyan de tê damezırandın. Bı şoreşa Agıri û Partiya Xoybûn re peywendi datine. Bı Kurdıstana Germin re ji her bê peywendi namine. Pêşewa Qazi Muhemmedê Şehid, Şex Mehmûdê Sırilawa, Qazi Kaka Hemey Bokan û Mele Ehmedê Fewzi damezrênerên vê komelê bûn. Mamoste Mele Ehmedê Fewzi, yek jı wan ronakbiran bû ku



www.netewe.com

dı Şerê Cihanê yê Yekem de çavên wi vebûye, hişyar bûye, taliya tama netewayeti û bındesti ya Kurdên hejar tam kıriye, jı Sılemaniyê hatiye Mukriyan û dı ronikırın û hişyar kırına giyanê netewayeti de rolek wi ya bılınd hebûye. Mımkun e yekem kes be, ku bı bir û baweriya Kurdayeti, xebat û têkoşinê dı Mukriyan de belav kırıbe.(21)

Armanca vê komelê ya esasi û heri gıring, parastın û berpêş ve bırına zman û edeba Kurdi bûye. Kıtêb û rojnamên Kurdi, ku lı Kurdıstana Germin dıhatın belav kırın, bıdestxıstıne û belav kırıne. Mele Ehmedê Fewzi grûbek tê gehandiye, ku pışti rojan helbestvan û nıviskarên bı nav û deng dı nav wan de derketıne.(22)

Hukûmeta diktator a Rıza Şah, her çend dı İran de hemû bir û baweriyên azadixwazi xenıqandıbû û lı Kurdıstanê ji siyaseta Farıskırına Kurdan bı rêve dıbır, lêbelê, qet bı tu awayi nedıkari gırsên kedkarê xelkê bine çok û seri lı wan bıde tewandın. Ew sınorên ku bı destê emperyalizmê lı ser xeritê dı navbera İran, Tırkiye û Iraq de hatıbû kışandın û Kurdıstanê pê dabû perçe kırın, qet tu cari jı aliyê xelkê Kurd ve nehat qebûlkırın û bı resmi nehat nas kırın. Hemû kedkarên Kurd vi sınorê han ê bı dest çebûyi dıdan bınê piyê xwe û peywendiya abori, kulturi û xızmayeti dı navbera vi mıl û mılê dın ê Kurdıstanê de hatiye meşandın

Her çıqas hukûmetên şovenist û kevneperest nehiştıne gelê Kurd dı nav welatê xwe de bı serbesti hatın û çûna xwe bıde domandın, lê Kurdan şev bı nivê şevê, dı çiya, dol û çemên welatê xwe de hatın û çûna xwe kırıne û pêywendiyên xwe yen maddi û manewi dane berdewam kırın.

Dıjmınên gelê Kurd hatın û çûna xelkê a nav welatê wi bı "qaçaxi" daye bınav kırın. Belê! "Qaçaxan" bı çûn û hatına xwe lı vi mıli û wi mılê dın ê Kurdıstanê ve, xew yên



www.netewe.com

van sınorên suni danine; İran, Tırkiye û Iraq heram kırıne. Yên dest gıredayi qanûna sınor dı piyên xwe de perçıqandıne. "Qaçakçiyan", dı hatın û çûna Kurdıstana Germin de tenê cıl û cêw tıştên dın ên fırotınê neanine, belko bir û baweriya Kurdayeti û tekoşina siyasi ji anine vi mılê. Deng û behsên Kurdan jı bo dıbıstana Kurdi, xwendın û nıvisandın bı zmanê Kurdi, belav kırına rojnamé û kovarên Kurdi û car caran ji çapemeniyên Kurdan ji anine Kustan(mebest; Kurdıstana İranê ye, yani zozan -N.M.).

"Oaçaxçi", ku jı aliyê dın ê Kurdıstanê vedıgeriyan; dı malan, çayxanan û mızgeftan de, bûyera serihıldana Şêx Mehmûdê nemır, serihıldana yekem a Barzan û behsên Kurdayetiyê jı xelkê re anine. Behsen cinayet û gunehkariyên Tırkan jı xelkê re anine, ku ka Tırkan çawa Kurdan jı welatê wan dûr xıstıne û seribırin dı nav wan de kırıne. Dı riya wan "qeçexçiyan" de, peywendiya manewi û bı taybeti ya siyasi ji dı navbera welatparezên Kurdıstana perçekıri de hatiye damezırandın. Bı tesadufi nebû, ku dı wan salan de Hukûmeta Pehlewi sixurên İranê hemû komkırıbûn û lı Kurdıstanê belav kırıbûn. Xelkê jı wan gelekan nas dıkır û weha dıgotın : "Mışk hatın." Dı wan peywendi û anina çapemeniyên Kurdi jı bo Mahabad de rolek Mirza Huseynê Zêringeran "Fırohar" (leqeba wi ye-N.M.) a bılınd û bê hempa hebûye. Dı sala 1935 an de, cıvinek bı awaki dan û sıtendınek nehêni lı ser bahs , kar û barê siyasi û deng û bahsên İran û cihan, dı nav hınek ronakbirên navça Mukriyan de pêk hatiye.

"Dı salên 1934-35 an de, grûbek bı navê Mehemmedi, dı bın serokatiya merıveki ku nave wi Mûhemmed Xetiw bû, dı Mahabad de hatiye damezırandın. Dı cıvinên xwe de behsa siyaseta xwe kırıne, kıtêb, rojname û tışten Kurdi peyde



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

kırıne û xwendıne. Pıraniya beşdarên vê grûbê kedkar û jı çina bındest a cıvakê bûn. Pışt re 'Mûhemmed Xetiw' jı aliyê grûbek dın de, ku dewlemend û jı çina serdest a cıvakê bû hatiye kuştın." (23)

Dı salen nabena 1937 û 1939 an de Partiya Azadixwazê Kurdıstana İran hat damezırandın. Her çend program û armanca vê partiyê bı nıvisandi nehatiye belav kırın, lêbelê, yekemin belavoka vê partiyê "jı bo pıştewaniya hatına Orduya Sor ya Sovyetê lı Kurdıstan û doza heqê Kurdan, jı bo doza rızgari û serbıxweyi ya Kurdıstanê ji vê dıde xuya kırın, ku rexıstınek wıha dı bın serokatiya Eziz Almani yan Eziz Zendi dı Kurdıstan de hebuye."(24)

Sala 1937 an, Hukûmeta Rıza Şah lı gel Tırkiyê, Iraq û Afganistan peymana çepel a Sadabad gırêda. Her çend armanc û mebesta bıngehin a wê peymana gemar jı bo sınorê Sovyet û dıji Yekitiya Sovyet bû, lêbelê, bêgoman mesela seribırina tevgera rızgarixwazi ya Kurd ji yekek jı armanca Peymana Sadabad bûye.

Benda heftan a vê peymanê bı eşkera dıjitiya wan dewletan lı hemberi tevgera rızgarixwazi ya gelê Kurd nişan dıde. "Madde 1-7; her yek jı wan dewletên ku peymanê imza kırıne lı ser xwe wezife dızanın, ku dor û berên sinorên xwe lı hember bûyer û tevgerên taqım û cıvaki yên grûbên çekdar, bergıri bê kırın lı hember damezırandına hemû cûrê rexıstın û teşkilatên dın pêşigıri bê kırın ku jı bo werankırına bınyatên mevcût an jı bo têkdana nizam û ewlekari ya welatên hevpeymani yên dın -ser sinor an dûrtır- jı bo roxandına hukûmetên mılên dının."(25)

Pışti pêkhatına gemara Sadabad hukûmeta İranê Kurdıstan xıste nav mengenê û dest avêt gırtına xelkê.

Lı hemû navçên Kurdîstanê bi bahana gırtına "qaçaxçi"



www.netewe.com

yan" mırovên hati naskırı yên camêr, serekeşir, xwedan mılkû kesên bı şexsiyet dıhat gırtın bı aliyê xwarê İran de dıhat bıdûr xıstın û dı gırtigehan de dıhat gırtın. Dı wan êrişan de Hukumeta Rıza Şah, hetta peyayên xwe ji paş de nedıda. Dı navça Piran de Merezê Muxtar û Seyid Hesen ê Qureyşi, ku çekên dewletê dı destê wan de bûn û pê talan jı Eceman dıbırın û Kurdan bı wan dışêlandın û dıkuştın, evan herduyan ji gırt, Seyid Hesen şande Şiraz û Merezê Muxtar ji dı gırtigeha Urmiyê de koça dawi kır.

Omerxanê Şıkaki, ku hemû wextan mırovê hukumetê bû, heta roxandına Hukumeta Pehlewi dı gırtigeha Urmiyê de bû. Eli Axayê Haci Êlxani, ku temami jiyana xwe dı bın xızmeta hukûmeta Ecem de derbaz kırıbû, bı dest gırêdayi dı kuçên Mahabad de gerandın û bırın avêtın gırtigehê. "Xuya bû ku sebebê gırtına Eli Axa mêrkuji bû."

Bı kurti siyaseta hukûmeta şovenist a Rıza Şah helandın û nehıştına Kurdan gav bı gav nêzik dıkır.

## ŞERÊ CİHANÊ YÊ DUYEM Û ROXANDINA REJIMA PEHLEWİ

Beri destpêka Şerê Cihanê yê Duyem û dı nav şer de, peywendiyek mezın a abori û kulturi ya hukûmeta İranê bı Almanya Hitler re hebû. Dı bazırganiya derveyi İran de, Almanya dı rêza yekem de bû. Muhendıs û pısporên Almanan ku mıjûliya wan her karê sixuri bû, dı temami bıngehên sen'etên İran de destê wan hebû. Dı İranê de propagandên berfıreh jı bo Almanan dıhat kırın. Sala 1939 an Şerê Cihanê yê Duyem dı Avrûpa de saz bû. Dı destpêkê de hêviyek Hukûmeta Rıza Şah a gelek mezın bı bıserketına Hitler he-



www.netewe.com

bû. Propagandan jı bo wi dıkır û dıgot; Hitler bınesasi Ariyan e û navê wi ji "Heyder"'e.

Bı sazbûna şer re hukûmeta İranê tund û tûjitiya xwe hin kurtır kır. Jendırman belavokên hukûmetê dı gundan de dıgerand û dı belavokan de dıhat nıvisandın ku kesê behsa şerê Avrûpa bıke tê ceza kırın. Xelk bı hıs û pısan ketıbûn, behsa şer dıkırın û dı asuwayê şerê cihanê de roxandına rejıma diktator û Pehlewi dıditın.

Hatına Ordiya Sor û rızgariya gelê Kurd a meha İlona sala 1941 an : Dı rojek tav û havinê de çend fırokên Sovyeti, dı sinorên İran re derbas bûn,dı asimanê hişin û sayi yê Kurdıstanê re derketın û yekemin car belavokên azadiyê bı zmanê Kurdi û Tırki dı welat de belav kırın. Pışti belav bûna van belavokan, Ordiya Şahinşahi, ku dı navbera 20 sali de wextê xwe bı lêdan û kuştına xelkê derbaz kırıbû û dı şêlandın û rûtkırına xelkê de mêraniya xwe perwerde kırıbû(!) Çekên xwe avêt, bı ser û bın bû û nema.

Hejarê helbestvan lı ser bûyera hatına wan fırokan wıha dıbêje :

" Çı fıroke mucessemeyi şadi – Kêɥtê da bû? Fırişteyi azadi
Be bılaw kırdıni du per agahi – Bu belaw erteşi Şahinşahi
Şa ke şêr bû le rawi mıskin da – Dim ke mışke le jêr Stalin da" (26) *

---

* Çı fıroke (teyare) sembola şadiyê – Ki tê de bû? Melekê azadiyê
Bı belavkırına du pel belavok – Bela wela bû ordiya Şahinşahi
Şah ku şer bû dı neçira rebenan de – Mın dit ku mışk e dı bın Stalin de



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

Rutbe bılındên Ordiya Şahinşahi, ku singên wan bı madalye û nişanan ve hatıbû tije kırın, vê carê cılên jınên cıwan lı xwe dıkırın û Kurdıstana bırçi û paşdemayi dı ci de berdıdan û bı rev ber bı Tehranê ve dıçûn.

Beri Ordiya Sor bê Iranê, eskerê Iran lı Tebriz û lı navça Culfayê, lı diji Culfaya Sovyet manevra dıkırın û guya jı bo pıştevaniya Almanan bergıriya xwe amade dıkırın. Rojek fermandarê eskerê Iran dıçe Tebriz û derdıkeve ba Şabexti, ku fermandarê hemû eskerên şımalê rojava bû.

Şabexti jı fermandar dıpırse :

– Manewiyata esker çawa ye?

–Qurban, gelek xerab e. Eskerê Sovyeti jı aliyê me de tê ditın. Trên û kamyon her dı hatın û çûne de ne, xwarın, çek û pêywıstiyên wan bıci tên, eskerên me ji dı wan çiyayên bılınd de roj hene ku ava vexwarınê ji bı destê wan nakeve.

Şabexti hêrs dıbe, lê dızıvıre û dıbêje :

–Xwe bêdeng bıke, ev axaftınên han çıne? Yê me Şah û Şahnama me heye, yê wan çiyê wan heye? Yê wan çiye wan heye?

Ew eskerên xwedi "Şah û Şahname" bûn, bı dıtina fırokên dıjmın banzdan û eskerên Sovyeti wan belav kırın û tıştek lı ser tıışteki nema.

Wısa lê hat, evser û serbazên ordiya Şahinşahi rutbên lı ser mılên xwe jê dıkırın û tıvıngên bırno bı naneki dıguherandın û jı bo hewandına xwe lı kunên (qulên) mışkan dıgeriyan. Zarokên gelê Kurd bı mêr û bı merxasi, ketın hemû şûnwarên Kurdıstan, dest danin ser çekan, warên eskeri kırın destê xwe û Kurdıstan jı esker, jendırme û memûrên Hukûmeta reşe-tari ya Rıza Şah paqıj kırın.

Ordiya Sor a Sovyeti ya vê azadiya han jı Kurdıstan re



www.netewe.com

ani, her wıha jı bo têkşıkandına faşizmê dı welatê Avrûpa ya rojhılat de ji çû û wan welatan jı bın pençên derebegi, diktatori û faşizmê rızgar kır. Her jı ber vê, lı ser raya rejıma İran a gemar û tırsa mırovên bı sal ên Kurd ku dı Şerê Yekem yê Cihanê de jı destê Qeyserê Rûs nerehet bûn; gırsên kedkarên Kurdıstan navê jendırmê Rusya danibûn "Melayeketi Çavsor" (Fırışteyi Azadi-Melekên Azadiye -N.M.), "12 Suwarên xeybê". Hejar dı helbestek xwe de weha dıbêje :

"Bist salan le jêr çengali Ecem
Nalandın be sed derd û hemû xem
Kiwi bextman way gırtıbû tem
Rûs necati dam bû be fırıştem
Bıji Supayi Sor xoş bê çekçû das
Le jêr istibdad Kurdi kırd xelas." *

Bı rasti Kurd rızgar bû. Jı Kurdan re xeberek hat. Zıncirê koletiyê bıqetine. Hewa azadiyê hılkêşa û zend û bend jı bo têkoşina xwe da jor.

## DI KURDISTAN DE DU BÛYERÊN CUDA

Dı van deman de ku rejıma Rıza Şah hat roxandın, dı Kurdıstan de jı ber hatına Ordiya Sor azadi hatıbû hılkırın, du bûyerên cuda-cuda bı hev re dı cıvaka Kurdewari de serê

---

* Bist salan dı bın pençê Ecem de
Em naliyan bı sed derd û xem
Çiyaye bextê me gırtıbû dûman û mıj
Rûs mın xelas kır bû melekê mın
Bıji Ordiya Sor, xweş bı çakûç û das
Jı ber zordestiyê Kurdan kır xelas



www.netewe.com

xwe hılda.

A yekem; xeslet û kırınên eşiretan û şêlandın û zılma derebegayeti. Ew kesên derebeg û xwedan mılk, ku dı dema diktatoriya Pehlewi de wek kûsiyan xwe kêşa bûn qalıkên xwe û sıtû lı ber jendırman xwar kırıbûn, xwe çekdar kırın û dest avêtın şêlandın, talan û şeran, devê xwe xıstın nava devên hev.

Lı navça Urmiyê Zêroyê Herki, lı Şıno Hemzeyê Sıware, lı Lacan Resulê Xerapey û hınek axayên dın, mal û terşên Eceman talan dıkırın û bıbûne sebebê vê, ku rojnamên Tehran nivê Kurdan rebır û talanker dıdan xuya kırın.

Lı navça Piranan, Piran çûn ser Seydayan û gundê Qelati Mutawê talan kırın û çend kesan jı wan kuştın. Mangor jı bo heyfa Seydayan,esker bırın ser Piranan û lı ser tehdida Rûsan bı ser hev de belav bûn. Dêbukri, Şamat û Şerwêran lı dıji hev rabûn û jı hev kuştın. Mangor dıhatın ser Mahabad û dıxwestın talanan bıkın. Lı navça Bareh, Heme Reşitxan lı ser handana Ingılizan dest avêt alozi derêxıstınê, Şehrê Baneyê şewıtand û Seqızê ji talan kır. Bı kurti serekeşiret û derebegên Kurd dı şûna jı wi wextê xweş û musait istifade bıkın û jı bo rızgari û serxwebûnê têkoşın, rojên derbas bûyi bı bira xwe binın û dersek jê werbıgrın, ketın dıji hev û jı hev kuştıni û talanan kırın û hev û du xwarın.

Bûyera duyem ji eva han bû; tevgera rewşenbirên Kurd û burjuvaziyê bıçûk ê bajêr, jı bo pêkanina rêxıstınek siyasi û bıdestxıstına mafê siyasi, netewayeti û rızgariya gelê Kurd.

Hınek helbestvan û nıviskaran dest avêtın nıvisandına helbestên welatparezi û handana xelkê jı bo têkoşinê.

Dı wan helbestan de rexne lı axa û serekeşiretan dıgırtın, zılm û zora rejıma Pehlewi bı bir dıanin, şiret û loman lı wan dıkırın. Hınek jı melan ji dı vi wari de rolên gırıng lis-



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

tın.

Lı ba van herdu bûyeran, bûyerek dın ji hebû ku dı ronikırına bir û baweriya xelkê de tesirek wê ya mezın hebû.Pışti roxandına rejıma Şah û paqıjkırına Kurdıstan jı esker û jendırmên İranê, dı vi mıl û mılên dın ê sınorê Kurdıstanê de ji bend û asteng neman, riya jı bo çûn û hatına herdu beşên Kurdıstanê hat vekırın. Dı navbera Germin û Kustan (mebest; Kurdıstana Iraq û ya İran e -N.M.) de hatın û çuyin dest pê kır. Tacır û dukandarên Kurdıstana İran jı bo anina tışt-mıştan dıçûne Hewlêr, Sılemaniyê, Kerkûk, Koyê û heta riya xwe bı Bexdayê ji dıxıstın. Bırayên Kurdıstana Germin bı serbesti lı bajarên Banê, Mahabad, Saqız, Bokan, Şıno, Nexede, Urmê, Xanê û Serdeşt dıgeriyan, mır û malan dıkırin û tışt-mıştên xwe dıfırotın. Jı bıli peywendiya abori, peywendiya manewi, kulturi û guhertına bir û bawariyê dı nav xelkê de belav û germ dıbû. Kıtêb, rojname û kovarên Kurdi jı Kurdıstana Germin dıhatın û her dı hewa de jı dest hev dıhat revandın, mırovên siyasi û têkoşerên wi aliyê dıhatın vi mılì, lı gel rewşenbirên navça Mukriyan peywendi datanin.

## SEFERA KURDAN BO YEKİTİYA SOVYET

Dı wê wextê de, jı bo ku bêserûberiyan dı Kurdıstanê de seri hılda bûn, Rûsan hınek serekeşiret û mırovên gıregır ên Kurdan bangi Bakuyê kırın. Dı sefera yekem de yên bang lı wan hatıbû kırın evên jêrinın :

Qazi Muhemmed, Haci Babe Şêx, Eli Axayê Debokri (Emir Eshed), Omerê Kurê Eli Axa, Mecitxanê Qerewêrani, Ebdullayê Mehmûd Axa, Reşid Begê Herki, Tahayê Herki,



www.netewe.com

Zero Beg, Hesenê Medewi, Hesen Telo, Musaxanê Zerza, Qerene Axayê Mameş, Kak Hemzeyê Neloz, Poşoyê Kurê Seyid Taha.

Her çend ev mêvanên han jı aliyê karbıdestên Komara Azerbeycana Sovyet bı germin hatın pêrgi kırın û dı warê yekiti, xebat û gıhiştına armanca netewayeti ya Kurd de bahs û guftugo (muzakere) bı wan re hatın kırın, lêbelê, dı rastiya xwe de guherandınek wısa bı ser rewş û kırınên eşayiri de neani. Qereni Axayê Mameş heta mır (pışt re ji kur û qebila wi) destên xwe jı xızmeta Eceman berneda û rewşa xwe ya dıji tevgera rızgarixwazi ya Kurd neguherand. Eli Axayê Haci Êlxani û kurên wi dı şûna beşdarbûna xızmeta Kurd de, xızmeta Hukûmeta Tehranê bıjartın. Ebdullah Axayê Mehmûd Axa, bı awaki resmi bû bermayixwarê Hukûmeta Tehran û lı dıji tevgera Kurd sekıni. Hukûmeta Iran, ku dı Kurdıstanê de desthılatiyek wê nema bû, vê carê ji ketıbû dı riya Kurdên nokerên xwe re ciyê piyên xwe dı Kurdıstan de bıke. Eli Axayê Haci Êlxani kıre berpırsiyarê bajarê Mahabad. Lêbelê, hışyariya gırsên gel û dıjitiya eşiretan rê neda peyaye hukumeta Tehran lı ser xelkê hakım be. Eli Axa jı berpırsiyariyê hat xıstın, kar û barê bajêr kete destê xelkê.

## DAMEZIRANDINA KOMELA JE-KAF (K.J.K.)*

Dı bın wan hoy û mercên wısa de,ku desthılat jı beri gelek salan bı vır de jı bal Hukûmeta Tehran lı Kurdıstan hatıbû danin eskerên Rûs û Ingılız hatıbûn nav Iran û Kurdıstan ji dı wê rewşê de bûbû du beş û her beşek ketıbû bın desthıla-

* Komela Jiyanneweyê Kurdıstan



www.netewe.com

ta ordiya yekeki jı wan herdu dewletan. Xwarê Kurdıstan, jı Seqız heta Kırmanşan Ordiya Ingılîz tê de bû, esker û desthılata İranê ji tê de mabû û riya têkoşin, bızav û xebata siyasi lı ser Kurdan dabûne gırtın. Eskerên Ingılîz bı tevayi pıştgıriya desthılata İran dıkır. Şımal û nawendê Kurdıstan ketıbû ber beşa Sovyet û rewşa têkoşina siyasi û rızgari jı bo Kurdan pêk hatıbû.

"Tevgera netewi ya Kurd dest pê kır. Ew ciyên ku eskerên Ingılîz tê de bûn, dı wan navçan de desthılata Ingılîz alikariya Hukûmeta İranê dıkır. Riya têkoşina kedkaran dıgırt û bı hemû awayi tevgerên demokratik jı holê radıkır. Dı mıntıqên şımal de, ku Ordiya Sor tê de bû, gırsên gel dest bı tevgera demokratik kırın. Eskerên Sovyeti dı wan navçan de dest nedıda kar û barên hınduri welat, lêbelê, rê ji nedıda, ku Hukûmeta İran tevgera xelkê jı holê ji rake. Her wek ku Stalin gotiye : "Bı tevayi mafê netewan a desthılati heye jı bo rêvebırına jiyana xwe bı xwe. Ew xwedan mafın ku lı gora daxwaza xwe kar û barên xwe damezrinın." (27)

Dı meha İlona sala 1942 an de, rewşenbir û burjuvaziyên bıçûk ên Mahabadê Komela Je-Kaf (Komela Jiyaneweyê Kurd) damezrandın. Dı damezırandına Komela Je-Kaf de rolek Mir Hac nûnerê Partiya Hiwa jı Kurdıstana Germin a gırıng hebûye. Ew kesên ku damezrenêrên Komela Je-Kaf hatıne naskırın evên han ın : Huseynê Zêrengeran (Fıroher), Ebdurrehmanê Zebihi, Sıddıqê Heyderi, Qasımê Qadıri, Ebdurrehmanê İmami, Eli Mehmûd, Ebdulqadırê Muderrısi, Mehemedê Nanewazade, Mele Ebdullayê Dawudi, Necmeddinê Tewhidi, Mehemmedê Eshabi, Mehemmedê Yahu, Ebdurrehmanê Keyani.

Komela Je-Kaf, her çened xwediyê destûr û programek



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

roni, rêk û pêk û zanıstî nebû, lêbelê, jı ber ku lı ser bıngeha rızgariya welatparezi û netewayeti hatıbû damezırandın û her wıha jı ber sebebê bı awaki têkoşani û xebat kırınê dı karê gelek bı lez dı nav kûraya cıvaka Kurdewari ya tiyê (ti bûyi) azadiyê de berfıreh bıbe û pêşengiyê jê re bıke.

Kesê ku dıxwest bıbe endamê komelê, destmêj pê dıdan gırtın û dıbırın odek an ciyek bı tenha. Ew kes gava ku çavên wi bı Qur'ana piroz, ala sê rengin a Kurdıstanê û şûrê rût dıket saw pê dıgırt û bı bir û baweriyek berz û giyanek pak û dılsozi sond dıxwar û bı hemû hêz û mecala xwe ve dı wê riyê de têdıkoşa. Sır û nehêniyên komelê dıparast. Dı teşkilatên komelê de, tenê sê kesan hev nas dıkırın. Dı berfırehbûna komelê de rolek feqi û melan a gırıng hebû.

Komela Je-Kaf giyenê netewayeti dı bir, hış û dılê xelkê de dıcoland û bı hêz dıkır. Helbestvan û nıviskarên Kurd bı hemû awayi dınıvisandın û bı helbestên mılli xelkê jı bo yekiti u têkoşine han dıdan,nebuna desthılatdari û destdırêjiya jendırman û hukûmeta Tehranê bı bira xelkê dıanin, zanebûna xelkê zêde dıkırın û pêş de dıbırın.

Dı demek kurt de, Komela Je-Kaf jı sınor derbas bû û dı Kurdıstana Germin de lıqeq damezırand. Lı Sılemaniyê lıqê komelê bı awaki lez ciyê xwe gırt û berfıreh bû, cıwan û rewşenbir dıbûne endamê komelê. Lıqê komelê yê Kırmanşan dest avête têkoşinê û dı navçê xwarê yê Kurdıstanê de pêşengiyê dıkır

Têkoşina Komela Je-Kaf tenê dı Kurdıstana İranê de nebû, armanc û daxwaza komelê ku jı bo xwe dabû diyar kırın, pêwısti bı reh avêtın û belav bûna çıq û şaxan hebû. Komela Je-Kaf dı hejmara yekemin a Kovara Nıştıman de, armanca xwe bı vi awayi dabû diyar kırın : "Komela Je-Kaf, bı hemû hêzên xwe ve têdıkoşe ta zıncirê ni-



www.netewe.com

rê koleti û bındestiyê jı stuyê netewa Kurd rake Kurdıstan iro ya perçe kıri Kurdıstanek mezın û rêk û pêk pêkbine, ku her Kurdek bı serbesti tê de bıji." (28)

Eşkeraye ku jı bo pêkanina armancek wıha berz û piroz, hewce bû lı gel beşên dın ên Kurdıstanê û lı gel têkoşerên Kurd ên dı hemû perçên Kurdıstanê yên dın de peywendi bê danin. Rê, tektik û stratejiya xebatê, têkoşin û hevkariyê bıhata diyar kırın. Jı bo vê armancê meha heftan a sala 1944 an lı Çiyayê Dalenper, nûnerên tevgera Kurdên hersê beşên Kurdıstanê dıcıvın. Dı vê cıvinê de Qazi Mela Wehab jı aliyê Kurdên Tırkiyê de, Şêx Ebdullahê Zinoyê jı aliyê Kurdıstana Iraqê de û Qasımê Qedri jı aliyê Komela Je-Kaf de beşdari dıke. Dı wê cıvinê de peymanek tê gırêdan, ku bı navê Peymana Sê Sınor tê bınav kırın û naskırın. Lı gora vê peymanê, Kurd dê bı giyani û bı maldari,(maddi û manewi)yarmetiya hev û du bıkın."(29)

Lı ser vê peyman û cıvinê Hesen Arfa,serokê yekemin ê Konseya Eskerê İran weha dınıvise : "Dı cıvina perpırsiyarên Kurdên İran, Iraq, Tırkiyê û Sûriyê de, lı wi warê ku sınorê sê welatan dıgıhijne hev,jı bo pêkanina Kurdıstanek mezın bıryar gırtın, ev cıvin bı navê Peymana Sê Sınor tê naskırın."(30)

Derveyi vê dı wextê şerê Barzan de, Komela Je-Kaf bı Mele Mustefa Barzani re peywendi datine û dı namekê de pıştı pirozbahi û eşkera kırına pıştewaniyê, van pırsiyarên han jı Mele Mustefa dıke :

"Armanca şoreşa we çiye? Hûn daxwaza azadiya Kurdıstana Iraq dıkın û an azadiya Kurdıstana mezın hemû û zımnên zenna Kurdıstana Tırkiyê ji?

4) Rewşa we dıji siyaseta ecnebi dı Iraq de çiye? Eger



www.netewe.com

rojên bên hûn jı aliyê van siyasetan bên tehdit kırın an ikna kırın, dê hûn şoreşê bıdın sekınandın an dê hûn xwe bı xwe bıdominın?

5) Nêrina me ewe, ku şoreşa we ya muqeddes şıklek gelemperi bıgre, yani; hûn daxwaza azad kırına hemû Kurdıstanê bıkın û jı bo vê ji hewceye hemû Kurdên cihanê yên hışyar, alikariyê jı we re bıkın. Û dı bın seroktiya we de eskerek Kurdi ku jı hemû Kurdan pêkhati bê tenzim kırın. Jı bo vê ji, hewceye jı bo amade kırına hazıriya pêkanina kongrê, dı hali hazır de, jı heelınti istişara we u heyeta istişare ya me ve pêk bê, jı bo vê kongrê ci û wext kıfş bıbe, çı lı erda Iraq û çı ji lı erda Kurdıstana İranê. Dı vê kongrê de hemû kesên ku xwe Kurd dızanın bı awaki eşkera mıllî bên helbıjartın û jı aliyê me tevan de bê imza kırın û dı vê kongrê de nizama eskeri ya Kurd bê danin, wezifên hemû aliyên şoreşa mıllî bên tayin kırın.

6) Pêwiste hûn rewşa partiya xwe lı gel rewşa dıjmın û rewşa eşayirên Kurdên Iraq lı hemberê we jı me re bı awaki berfıreh bı weqt bıdın xuya kırın.

7) Jı bo azadbûna Kurdan, bêgoman hewceye siyasetek yek jı dewletên mezın lı gel me be, bı raya me ev dewleta han dewleta Sovyetê ye. Raya we dı vi wari de çiye? Jı ber ku, nabe em heta hetayi bê teref bıminın lı hember hemu dewletan.

8) Jı tevan gıringtır pêwiste bı awaki zûtırin dı xusûsa İngilizan de hûn nêrinên xwe jı me re bıdın diyar kırın, ka raya İngilizan lı hemberi şoreşa we û goft û goyên wan lı gel we çıne? Jı ber ku, em dızanın ne mumkûne ku İngiliz lı hember vê şoreşê bê eleqe bıminın.

9) Hûn mıroveki mezın i azadiperestın, qet nabe bes jı jı bo eşireta xwe dıjitiya zılmê bıkın -Kurdên İranê bı giya-



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

na bıratiya Kurditiyê gelek hez dıkın ku hûn bı serkevın bı çı awayi dıbe bıra bıbe- û amadeye jı bo yarmetiya we, lı gora destdana rewşa siyaseta welatê me. Û ev pırsên han ku em dıkın, armanca me eve, ku temina yarmetiyek gelek mezın jı we re bıkın û hereketa we bıkın hereketek mılli, gelemperi ta ku dı tarixê de ev iftixariya han jı bo we bê tescil kırın. Jı aliyê heelınti Şurayi A-X" *, **

*"Bwa'si sewreyi êwe çiye? Aya idiayi azadi Kurdıstani Iraq deken weya xwud azadi hemû Kurdıstani gêti we zımmen Kurdıstani Tırkiya?

4) Mewqufi êwe beranber siyaseti ecnebi le Iraq da çiye we eger hatû le teref em siyasete tehdid weyaxut eqna kıran sewre rawestênın weyaxud dewam dıken?

5) Rayiême eweye ke sewreyi muqeddesi êwe nawêki umûmi werbıgrê yani idiayi azad kırdıni hemû Kurdıstan bıken we bı eme debê hemû Kurdi gêti be mışûre, te'awıntan le gel bıka. We jêr qiyedeyi ewe leşkereki Kurdi le hemû Kurdi geti tenzim bıkrê. Bo emeş debê amadekın bo hazırbûn le eqdi mutemerek le hali hazır le êwe we heelınti ıstışare êwe heyeti istişareyiême tenzim bıkrê we cige û zaman teyin bıkrê bo em mutemere çı lı erdi Iraq çı le erdi Kurdıstani İran lem mutemerê da hemû mutalıbi Kurd be şekli becanki mılli te'yin dıkrê we le teref hemû man imza dekrê we lem mutemere da nizami eskeri Kurd teyin dekrê wacıbati hemû layeke le sewreyi mılli teyin dekrê.

6) Pêwiste mewqıfi hızbi xotan le gel mewqufi hızbi dıjmın bo man mufesselen û be weqıt teyin bıfermo le gel mewqufi eşairi Kurdi Iraq beramber be êwe.

7) Bo azadbûni Kurd teb'en debê sıyasetiyek le duweli mu'ezzeme le gel man bê, be rayi ême em dewlete dewleti Şurewi ye. Rayi êwe bem xususewe çiye? Çunke nabe elel-



www.netewe.com

Gelek mıxabın belgên nıvisandi yên Komela Je-Kaf dı dest de ninın.Lêbelê,dı wan daxwazen ku Komelê daye Wezirê Rawejekêri (istişarê-şewr) yê Hukumeta Tehranê Xelitta ciyeki armanc û programa Komela Je-Kaf jı bo me roni dıbe. Bı kurti daxwaz bı vi awayi ne:

" 1)Jı aliyê hukûmeta İranê zmanê Kurdi bı resmi bê naskırın, jı bo navçên Kurdıstanê, ku hejmara danıştıwanên wê jı 3 mılyonan zêdetıre.

2) Zmanê Kurdi bıbe zmanê xwendın, rêvebıri û dadgehi

---

hiyad bin le gel hemû dewletan.

8) Le hemûyi muhimtır pêwıste be sureteki muste'ecel iştihadi xwutan beyan bıken be xususi rayi Ingıliz beramber be sewreyi êwe we guft û goyan le gel êwe çiye? Çunke ême ezanin be te'aliq nabe Ingıliz lem sewreye da bê dexıl be.

9) Êwe zeimeki azadperest ın, hiç nebê mukafeheyi zulm eken bo eşireti xotan -we Kürdi İran be ruhi bırayeti Kurdayeti zor iştiyaqi heye bo mewafıqbûni ewe bı herçi new'iyek be- we amadeye bo yarmeti êwe be goreyi musamaheyi zurufi siyaseti memleketman we ke em sualane eken meqsud man ewe ye, ke temini yarmetiyeki zor gewre bo êwe bıken we hereketi êwe bıkeyne hereketi mılli, umûmi ta ku le tarix da em fexre bo êwe tescil bıkre.le layen - heelıntı Şurai A-X"

** Vê nama han bı çı awayi hatiye nıvisandın, bı bêdest lêdan mın lı vır pêşkêş kırıye, jı bıli çend rêzên seri ku ew ji ez tê negihıştım, jı ber ku baş nedıhat xwendın û tenê pirozbahi bûn.

Şiweya nıvisandın û naveroka namê, ku dı radeya xwendewari û Kurdizaniyê de nıvisana namek dıde nişandan.



www.netewe.com

dı Kurdıstan de.

3) Memûrên Kurdıstanê hemû Kurd bın.

4) Ew bacên (vergi-zekat) dı Kurdıstan de tên berhev kırın, dıvê lı Kurdıstan jı bo durust kırına nexweşxane, dıbıstan û avakırına Kurdıstan bên bıkar anin ne jı bo xemlandına Tehran.

5) Dı parlamentoyê de behsa van daxwazan bê kırın û qanûnek dı derheqê vê de bê derexıstın, jı bo ku Kurd dılrehet bın.

6) Ev daxwazên me yên destpêkê ne. Lêbelê, Komela me Je-Kaf baweriyek wê ya tevayi lı ser wê heye, ku tayin kırına qedera xwe bı destê xwe, mafek tebii ye jı bo hemû neteweyan. Jı ber vê pêwiste dawiya xelas bûna Şerê Cihanê yê Duyem jı aliyê we de muzakere bê kırın. Û qet şıka me tê de nine ku Kurdan, rojên xwe yên bên bı destê xwe de bernedane.

7) Komele van daxwazên xwe belav dıke û dıde zanin ku neteweyê Kurd ku çarenıvisa xwe bı hukûmeta İranê re gırêdabû, vê carê İranê wek ciranek baş û bı qedır dê nasbıke." (31)

---

Kelima "heelınti" ku dı du ciyan de hatiye, xuya nine ka çiye. Mumkûn e ku rûmuzek xwedi be, lê ger ku rûmuz ji bıbe, xuya nine Mele Mustefa tê gıhiştıbe, jı ber ku imza ji vekıri nine û nayê xwendın. "Şari A-X" kıfş nine çiye. Dı nıvisandınê de kelime û zarava Kurdıstana Germin û hınek caran ji ya Kurdıstana İranê tê de heye. Bı tevayi dıde xuya kırın ku name jı aliyê Kurdıstana İranê hatiye nıvisandın. Tıştek ditır dı ve namê de dıkeve ber çavan, lı ser siyaseta Komelê dı Kurdıstan de û dı Kurdıstanê de bûyina şoreşekê de, her bı vi awayi dı dıji Ingılizan de paldana Sovyet e-Nıviskar.



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

Wek dı van daxwazan de ji derdıkeve, Komela Je-Kaf mesela tayin kırıne qedera xwe bı destê xwe wek stratejiya xwe ye diyar kırın û behs kırına vê meselê hıştiye jı bo dawiya Şerê Cihanê yê Duyem. Bı wan hêviyên ku dawiya şer bı têkçûna dêwa faşizmê, gelên bındest azad bın û gelê Kurd ji çarenıvisa xwe bı destê xwe deyne. Komela Je-Kaf, van daxwazên xwe wek taktik jı bo qonaxa destpêka şer aniye holê.

## MAQBUZÊN QEND Û ŞEKIR

Komela Je-Kaf, bı aktifi bir û baweriya Kurdayeti û giyana welatpareziyê dı Kurdıstan de belav dıkır û jı bo yekitiya xebatê bang lı komên xelkê dıkır.

Serekeşiret û derebegên Kurd ji pehin, şeqam û beihtırami yên jendırman, gırtigeha Qesra Qacar û jêrdesti jı bira wan çûbû û bı dızi lı gel kesên Hukûmeta İranê, ku hin dı Azerbeycan û Sınê de mabûn, peywendi datanin û carek dın amadeyiya xwe jı bo nokeriya Hukûmeta İranê radıgıhandın. Rejıma İranê ku jı kevın de cısnı û rûçıkê derebegên Kurd dınasi, biryar da ku bı makbûz qend û şekır bıde Kurdıstan. Lêbelê, ew qend û şekırê ku guya hewce bû bıdaya xelkê Kurdıstanê, dıda xwedan mılkan. Derebeg û kesên xwedi mılk ên Kurd jı bo sıtandına qend û şekır, jı bo xwe kırıbûn wek wezifeki, ku navên çiya, dol, çem û ciyên xali yên Kurdıstanê wek navên avayi û gund dıdan nıvisandın, nufûsên mıri û zındiyên feqir û hejarên gundiyan berhev dıkırın û pê mekbûzan dıstendın.

Hukûmeta Tehranê, baş dızani ku ev gund û avayiyên han lı Kurdıstanê ninın û hejmara xelkê Kurdıstan hınde nine, lêbelê, dıxwest wan bı qend û şekıran bıxenıqine û bı xwe ve gırêbıde.



www.netewe.com

Helbestvan û nıviskarên welatparez ku pıraniya wan lı der û dora Komela Je-Kaf kom bûbûn, daxwaz û kırınên derebeg û serekeşiretên Kurdan ifşa û ruswa dıkırın.

Helbestên Bayiz û yên Bapirê Hejar dı vi wari de heya jı derebegan re nehiştıbûn.

Dı nav ronahiyê de rakeve Fani, ku bı xwe ji jı eşira Pışder bû, dı bestek helbesta xwe de wıha dıbejê :

"Qıseykım dê te ser zari delêm bılêm û nawêrım
Le basi xan û reftari delêm bılêm û nawêrım." *

Evê deste helbestê jı Komelê re şandıbû jı bo ku dı Nıştıman de çap bıke. Dı pışti van bûyeran de helbestvanê mezın ê Kurd Hêmın dest pêkıriye jı bo pıştevaniya Komelê bı awaki eşkera gotiye :

Heçi ke bête ser zarım Emın delêm û bê bakım
Eger çi bêkes û zarım Emın delêm û bê bakım
Ewey axa ye bê kar e Cebûn û qels û lasar e
Dızi w rêgırtıni kar e Emın delêm û bê bakım
Ewende gêj û bê hûşın Heya namûsi defroşin
Le bo azadi nakoşın Emın delêm û bê bakım
Xudayi axawetan qende le bo qendın hemû bende
Be hali wan dekım xende Emın delêm û bê bakım
Eweney êste serdar ın Cefa cûn û stemkar ın
Xulami pûl û dinar ın Emın delêm û bê bakım
Be şew to roj deken tekbir Çı mulkeki bıken dagir
Çı damawek bıken yexsir Emın delêm û bê bakım
Le ber zulm û cefay wane Weten yekpare wêrane
Hezar xwuzgem be bigane Emın delêm û bê bakım
Le şerm û şûreyi mırdım Be xom mın ger bılêm Kurd ım

---

* "Gotınek tê ser devê mın dıkım bêjım newêrım
Lı ser xan û kırınên wi dıkım bêjım newêrım



www.netewe.com

Ke axa abroyi bırdım Emın delêm û bê bakım *

Dı kovara Nıştıman organa Komela Je-Kaf de, beste helbestek dın belav bûye ku gelek bı eşkera derebegan ruswa kıriye.

"Mılletek hen le nêw me eşiret
Xo be xo şêr le xeyre bê xiret
Her ke Turki goti : "çekın dalı"
Kune mışkê le wan niye xali **

Kıfşe xwedan mılkên wısa ji hebûne, ku bûbûne endamê

* Her çiyê be ser zarê mın / Ewê dıbêjım û natırsım/ Heke bêkes û bı zarin bım ji / E wê dıbêjım natırsım / E wê axa ye bê kar e / Tırsunek, qels û serseri ye / Dızi û rêbıri kare wi ye / E wê dıbêjım û natırsım/ Ew qas gêj û bê hışın / Heya namusê dıfroşın / Jı bo azadiyê tênakoşın/ E wê debêjım û natırsım / Xwudayê axayên we qend e / Jı bo qendê ye hemû bûne kole / Ez bı halê wan dıkenım / E wê dıbêjım û natırsım / Yên nıha serdar ın / Zulımdar û sıtemkar ın / Xulamê pûl û dinar ın / E wê dıbêjım û natırsım/ Dı şev heta rojê tekbiran tinın / Çı mılkê ku dest bıdın ser/ Çı belengazên ku bıkın êsir / E wê dıbêjım û natırsım / Jı ber zılm u cefa wan e / Weten seranser wêran e / Hezar xwezi bı bêgane (biyaniyan) / E wê dıbêjım û natırsım / Jı fedi û heya mırım / Bı xwe ku bêjım ez Kurdım / Pışti ku axa ava ruyê mın şuşt (nema jê fedi dıkım) / E wê dıbêjım û natırsım.

** Qewmek heye dı nav me de
Xwe bı xwe şêr lê jı xeyri re bê xiret
Ku Tırkeki jê re got : " çekın dali" (çek arabanı – bıpengıze here)
Qula mışkan jı wan xali nabe



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

Komela Je-Kaf û bı hemû awayi dı bınê xızmeta gel û welat de bûne, bı tıvıng, hesp û suwarên xwe ve hêzên Komelê yên kar bıci anine bûne. Kak Seidê Qupi yek jı wan mırovên camêr û aza bû, ku bı 8-9 suwarên xwe yên xwarın û wergırtın lı ser wan bûn, tıvıngên xwe gırtıbûn, bı şev û roj dı bın xızmeta Komelê û welat de bûn.

Kak Muhemmedê Serokani (Hemedê Qadıri) ku dı Komara Kurdıstan de jı ber berpırsiyariya xwe ya ordiyê madalya qehremaniyê wergırt, temami jiyana xwe jı bo berfıreh bûna kar û barên Komelê amade kırıbû. Kak Hemed heta mır ji her bı ax û kesera azadiya Kurdıstan û rızgariya gelê Kurd vê jiyana xwe borand. Gelek car kete nav derbederi, zından, işkence û gelek bela hatın seri. Sed iftira û tuhmetên narewa jı bo wi hatın kırın. Jı bo gunehkırına têkoşina siyasi, hetta bıra û malbata wi ji alikariyê pê re nedıkırın. Lêbelê, Kak Hemed, ku wek serokê "Kapitan Qadıri" (Qadriye berpırsiyarê ordiyê - N.M.) hatıbû naskırın, heta mırına xwe lı ser riya azadixwazi, Kurdayeti ya pêşkewtixwaz û lı ser riya sosyalizmê wefadar ma. Kak Hemed wextê mırına xwe weha got : "Jı zarok û dostên mın re bêjın, ez wek Kurdek jı bo azadiya Kurdıstan jiyam. Ez komunist bûm, vê riya han riya rızgariya gelê xwe dızanım. Ew ji bıra weha bıjin."

Kak Hemedê Qadıri dı wan wextan de ku xan û derebegên Kurd jı bo mekbûzên qend û şekır mılên xwe dıdan şıkandın, bı navê "Cengi" beste helbestek belav kırıbû, ku çend xetên wi dı bira mın de maye, jı bo biranina vi têkoşer û havriyê berêz, ez dı vır de belav dıkım :

"Kurde heste, pışt bı beste, rameweste, tund bıro
Wexti işe, danenişe, deste ejno rence rû
Tu dezani mılleti Cû esli û nijadi çıbû
Çon rema ye tu zelil bi w mılleti Cû serbexo



www.netewe.com

Gerçi mejûnûs denûsın mılleti Kurdi reşid
Mın delêm kêmtır le Cû ne xan û axa bê dırow
Nıştıman dayiki me bû gayan û axa çi nagût
Moşê ger dayki bıgên carek delê ey daye ro
Gerçi xoşixane "Cengi" xani wa be ziyad nebê
Dujmıni me şew bêdar e ême nustuwin nime ro *

## BÛYERA QEREQOLA MAHABADÊ

Dı despêka sala 1943 an de, hebûn û nişana Hukûmeta Tehran lı bajarê Mahabad tenê qerekolek mabû, ku 10-15 polisên Ecem tê de mabûn û qet hukmeki wan tunebû jı bılî raporan bıdın û fêsadiyan bıkın. Desthılat û kar û barên bajêr û yên der û doran ku dıhat kırın, dı destê Komela Je-Kaf de bû. Dı wê wextê de General Hoşmend Efşar ku fermandeyê eskerên rojavayê İran bû, jı bo sertêdaniyê tê bajarê Mahabad. Lêbelê, komên xelkê bı xwenişandan û bı kevır avêtınan pêrgiyi wi hatın. Generalê navê wi derbas bû nekari lı Mahabad bımine, bı piroziyekê lez kır û Mahabad lı ci hışt û çû.

---

* Geli Kurd şuûr, xwe hılke, rameweste xurt bımeş / Wextê iş e, runenê, dest bı nasır (dest qusiyayi) ê rence rû (ru bı ked) / Tu zani mılletê Cıhû esl û koka wi çıbû / Çewa rewa ye tu zelil (bındest) bi, Mılletê Cıhû serbıxwe / Gerçi mêjûnûs dınûsın ku mılletê Kurd (raide) gıhaşti ye / Ez dıbêm ku xan û axa jı cıhûya ji xerabtır (kêmtır) ın bê derew / Nıştıman diya me bû tê gan axayan tışteki negot / Ku careki ji dı dayika Moşê bıgên, dıbê wax dayika mın çû / Gerçi xweşxane "Cengi" ciyê wıha zêde nebe / Dıjmınê me nivê şevê lı piyaye (hişyar e) em razane nivero



www.netewe.com

Dı meha Gulana wê salê de cıvinek mezın a xelkê jı bo guhdari kırına axaftına Ezizxanê Kırmanc, lı nêziki meydana Çarçıra pêk hat. Ezizxan yekek jı azayê Begzadê û mırovek zana, pêşkevtixwaz û demokrat bû. Hin dı wê wextê de zeviyên xwe lı gundiyên xwe belav kırıbû. Ezizxan lı ser diroka zman û edeba Kurd dest bı axaftına xwe dıke, giyanê xelk han dıde û pışt re radıgehine dıbêje, ku pêwiste şûneware Hukûmeta Tehran dı Kurdıstan de bê hılanin. Dozê jı xelkê dıke, ku qereqolê rakın. Xelk lı ser axaftına Ezizxan dıherıkın û ber bı qereqolê ve dıkevın rê. Polisên Ecem, ku dı qereqolê de bûn gule berdıdın xelkê û Ebdullahê Mine Xalınd jı ber gulê polisan tê kuştın. Êdi xelk êriş dıbe ser qereqolê û çend polis tên kuştın, hınek tên gırtın û dawiyê şûnewarê desthılata Hukûmeta İranê ya çendin salan jı Mahabad tê paqıjkırın.

Bûyer û serpehatiyên Kurdıstan, her jı aliyê biyani û neyarên Kurdan ve hatıne nıvisandın. Du kesan lı ser tevgera salên nabêna 1941-1946 i ya Kurdıstana İranê nıvisine. Yek Hesen Arfa yê serokê yekem ê Konseya Ordiya İran û yê dın ji William Aegletone Amerikayi ye.

Hesen Arfa, ku bı xwe serokê Konseya Ordiyê bûye, dı vi wari de weha dınıvise : "Dı meha Gulana 1943 an de hınek jı xelkê Mahabade, jı bo çek sıdendına qereqola polisan êriş kırın. Pışti demekê dın bı ser de teqandın, qereqolê wêran kırın û hınek polisan kuştın. Bı vi awayi, nişana desthılata İranê ya dawiyê lı Mahabad jı holê rakırın."(33)

Belê, ka em bızanın ê Amerikayi dı vi wari de çı dınıvise? Williyam Aegleton dı destpêkê de bı vi awayi dınıvise : "Wextê Komara Kurdıstan têk çû, Kurdan tev sened, belge û nıvisandınan jı holê rakırın. Dı aliki dın ji karbıdestên İran nexwestın biraninên tal ên wê qereqolê bı hemû



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

awayi jı bo zındiyan bı mine." Lêbelê, her dı vi hali de ji Aegleton lı ser qereqola polisan weha dınıvise : "Mesela qend û şekır bû sebebê wê, ku axırin nişana dewleta İran lı Mahabad ku ew qereqol bû, dı meha Gulana sala 1943 an de, jı bajêr hat rakırın. Wê wextê pıraniya xelkê û bı taybeti memûrên idara dewletê ji, wextê gırtına qend û şekır, hezar hilan dıkırın. Wek minaki, nufûsa mıriyan nedıhat xera kırın û par jı wan dıhat sıtendın. Bı navê ew gundên ku her nebûn, şekır û qend dıhatın sıtendın. Wê dema ku wextê şer bû, welat têk çûbû. İdara daira nufûsê nedıkari vi karê han bı rê bıbe.

Dûr û dırêj ajotına van karan, bû sebebê bêçaretiya hukûmeta merkezi ku çawa bı vi awayi xelk zêde kıriye. Yekemin karê dewletê ew bû, ku hejmara tevayi ya xelkê bajêr û gundên navçê amade bıke û pêşkêşi qereqolê bıke. Ev karê hat kırın û hejmar jı qereqola Mahabadê re hat dayin, bêgoman van belgan pıraniya xelkê xıste xeteriyê. Jı ber vê yekê pıraniyek jı xelkê yên dûvê wan ketıbû dafıkê bıryar dan jı bo çûna ser qereqolê û ewan nıvisandınan derêxın der ve.

Rojek pışti nivro pışti qedandına kar hınek jı xelkê Mahabad lı Meydana Çarçıra kombûn, da ku guh bıdın axaftına Ezizxan ku behsa mesela mılli dıkır. Pışt re bıryar dan ku Ebdullahê Mine Xalınd bışinın qereqolê û wan hejmartınan bine. Ev mırovê han çû qereqolê, lêbelê, ket ber çend gulan ku bı xeleti jı qereqolê hatıbûn avêtın. Ev karê han bû sebebê ku êriş bıbın ser qereqolê, ku zerarek gelek mezın bû. Heft polisên Tırkên Azerbeycani hat kuştın."(34)

Wılliam Aegleton beyi ku behsa çavkaniyeki bıke û an jı bo axaftınê belgeyek bine, bı awaki hêsan bı serê qelema xwe dıxwaze rastiyê berevaji bıke û xebata rewa ya xalkê,



www.netewe.com

bı qend û şekır dıde naskırın, ku qet kedkarên Kurd negırtın û tam nekırın. Gelek eşkeraye ku qend û şekır, derebeg û serekeşiretan dıgırtın û welatê xwe pê dıfrotın. Hınek tacır û karbıdestên Mahabad ji dı vê xwefıroşiyê de şırik bûn. Aegleton bı xwe dınıvise ku ne lı Kurdıstan bûye, vê ca ku kijan Kurdê helalzade derewan jê re aniye û nexwestiye dı kıtêba wi de navê wi derbas bıbe.

## TİYATROYA DAYKİ NIŞTIMAN

Dı destpêka sala 1945 an de, Komela Je-Kaf, Tiyatroya Dayki Nıştıman (Dayiknıştıman) pêk ani. Ev tiyatroya han, ku yekemin tiyatroya huneri ya serkevtına Kurdi bû, dı hemû navçên azadkıri yên Kurdıstan de, jı bal gelek komên xelkê ve bı germin pêşwazi lê hat kırın. Tiyatroya Dayki Nıştıman, ku rezili, jêrdesti û dagır kırına Kurd û Kurdıstan bı bir dıxıst û gırêdana Peymana Sadabad nişan dıda û pışt re rola gel dıxıst ber çavan û bı şûr zıncirê koleti û koledariyê jı dest û pençe Dayki Nıştıman perçe perçe dıkır û azadiya wê dıstend, xelk bı carek pê geş û coş dıbû û giyanê taybeti dı dılê xelk û komel de pêl dıda.

Dı nav nûrê de rakeve Nehri, bı wi dengê xwe yê xweş ê bı hewayê taybeti ve helbesta han dıxwend û bı yek cari xelk dıketın gırine û bındestiya xwe bıbir dıanin :

Le rojnameyi diwari ke çı medari çerxi şefturi
Denuse tali'i Kurd kewte borci mewci deycûri
Le ber bi fıkr û iqdami ruesayi eşayir bû
Ke roji Kurd mubeddel bû be tariki w deycori
Bıra biri çırayeki bıken tarike şew da dê
Qiyameki bıken ta fırsete bıkeyn be cumhuri *

* Lı rojnama diwarê....



www.netewe.com

Belê, ev helbesta han, taybeti Huseynê Mehemed Axayê bırayê Qereni Axayê Mameş ji dıxıste gırinê û wek kaniyê av jı çavan dıhate xware.

Derveyi Tiyatroya Dayki Nıştıman, Mirmirên (Mirê Miran- N.M.) ji lı Mahabad dest pê kır. Mirmirên. ku resmek kevın ê Kurd bûye û emrên Mir bı tevayi dıhat bıcihanin.

Dı Mahabad de rewşek siyasi xwe gırt û jı bo komkırına yarmeti û pêkanina hêza çekdar istifadek mezın jê hat wergırtın.

## PARTİYA DEMOKRAT A KURDISTAN, HEFTÊ 1945 an

Dı wan demên ku lı seranserê Kurdıstana navin û bı taybeti lı Sılemani û Kırmanşanê ji çıq û şaxên Komela Je-Kafe belav dıbûn, lı bajarê Mahabad belavokek bı ımza 72 kesan hat belav kırın û damezrandına Partiya Demokrat a Kurdıstan hat ilan kırın. Gelek kesên damezrênerên Komela Je-Kaf ımza wan dı bınê wê belavoke de tune bû. Jı wan 72 kesan; 24 kes xwedan mılk, 18 kes burjuvaziyê bajêr, 16 serekeşiret, 10 rewşenbir û 4 kes ji mırovên dini bûn. Metnê belavoka hati belav kırın ev e :

Bısmıllahırrehmanırrehim

Geli hevwelatiyan, bırayan

Agırê Şerê Cihanê yê Duyem, ku jı aliyê hêzên dıji demokrasiyê û bı destê dıjmınên azadiyê ve hatıbû pêxıstın,

---

Dınıvise ku talihê Kurd ket burcê pêla zordestiyê
Jı ber bêfıkri û tevgera serekeşiran bû
Ku roja Kurd bı tariti û zordestiyê hat guhartın



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook

jı bal baskê hêzên eskerên welatên hevpeyman ve hatın tefandın. Cihana demokrasiyê bıserket û cihana faşizmê; ku dıxwest netewe û gelên cihanê bıxe bın esareta mıstek rêgır û xwinxwaran, bı tevayi têk çû. Her cawa ku çaverê lê dıhat kırın, riya azadiyê jı bo netewe û gelên cihanê hat vekırın.

İro, hemû gelên cihanê dıbê istifade jı vê riyê bıgrın. Ew dıvê jı wan madên ku dı pakta diroki ya Atlantik de derbas bûne istifade bıgrın. Ew dıvê kar û barên xwe lı gora daxwaza xwe bı ci binın.

Em Kurdên ku dı İran de dıjin, dı dırêjaya çendin sal û çendin sedsalan de ye ku dı riya mafê netewayeti û lı ser hewcigayên xwe me xebat kıriye û dı vi riyê de qurbanên gelek zêde me daye. Lêbelê, diktatorên serdestên İranê dı tu wextê de jı bo sehkırına pêwıstiyên me amade nebûn û hetta nehiştıne ew mafên ku lı gora Qanûna Esasi daye eyalet û wılayetan jê istifade bê kırın.Ewan jı ber sebebê bı bombe,top,gırtın,surgun kırın, kuştın û hêsir kırınê bersiva me dane. Bı taybeti dı wextê dewra 20 saliya Rıza Xan de, em dı lı xwe kırına cıl û bergên netewayeti ya Kurd de ji azad nebûn. Ewan bı sunguyan bı bahana gırtına eskeriyê, dıziti, rêgıri û xayinti temamê hebûna me, can û namûsa me xıstıbûn bın piyan. Ewan jı bo qırkırına nesla me bı her awayi metodên hoviyane û bê şerm çı dıxwestın dıkırın. Axır em ji insanın,ê me ji dirok,zman,rê ü şûnwarên edebi yên taybeti hene û ev jı me re gelek xweşın ji. Jı bo çı dıbê mafê me bê xıstın dı bın piyan? Jı bo çı nahêlın bı zmanê xwe yê zıkmaki em zarokên xwe bıgehinın? Jı bo çı nahêlın Kurdıstan bıbe welatek xwud muxtar û dı riya encumenê wılayeti de, ku dı Qanûna Esasi de hatiye diyar kırın, kar û barên xwe bı rê ve bıbe?



www.netewe.com

Geli hevwelatiyên hêja, pêwıste em ji bızanın, ku maf na-yê dan lê maf tê sıtendın. Jı ber vê yekê jı bo ku em bıkarıbın mafên xwe yê desthılata netewayeti û hewcedariyên xwe bı dest xın, dıvê ku em xebat bıkın. Jı bo vê xebatê yekiti û hevkari pêwist e. Jı bo vê yekê ji teşkilat û desteyek pêşeng pewist e. Damezırandın û dest bı kar kırına Partiya Demokrat a Kurdıstan lı Mahabad jı bo vê armancê ye.

Geli hevwelatiyên xoşewist, dıbê hûn çav û guhên xwe vekın. Lı dora partiya xwe bıcıvın û jı bo bı dest xıstına mafê qanûni û netewayeti yên xwe fedakari bıkın. Partiya Demokrat a Kurdıstan serok û rênişandarê we ye. Tenê dı bın ala vê partiyê de netewa Kurd wê jı ber pê çûna xeteriyê xelas bıbe. Dê ew parêzgeri lı hebûn, namûs û pêwistiyên netewayeti bıke. Tenê bı saya vê partiyê, gelê Kurd dê bıkare dı nav sınorê dewleta İran de xwud muxtariya xwe bı dest bıxe.

Geli hevwelatiyên xoşewist, em jı derveyi mafên xwe yên qanûni û insani pê ve tıştek naxwazın. Daxwazên me dı wan bendên jêr de bı kurti hatıne nişandan. Van daxwazên han bıxwine û bı hemû mırovên Kurd bıde fam kırın.

Daxwazên me ev ın :

1) Netewa Kurd dı daxılê İran de jı bo ci bı ci kırına kar û barên xwe yê mehelli serbıxwe û azad bıbe. Û dı sınorê dewleta İran de netewa Kurd xwud muxtariya xwe bıxte destê xwe.

2) Mafê xwendıni bı zmanê zıkmaki yê xwe hebe û temami kar û barên dairan lı gora zmanê Kurdi bê meşandın.

3) Lı ser bıngeha Qanuna Esasi encumeana wılayeta Kurdıstan zutırin bê helbıjartın, bı temami kar û barên cıvaki û dewleti rabıgehine û çavderiyan lı ser bıke.



www.netewe.com

4) Karbıdestên dewletê bı bê axaftın dıbê jı xelkên mehelli bın.

5) Dıbê lı ser esasê qanûnek gıştì dı nevbera gundi û xwedan mılkan de pêkhatıniyek bê pêk anin ku duwaroja herdu mılan garanti bıke.

6) Partiya Demokrat a Kurdıstan têdıkoşe ku dı xebatê de bı taybeti lı gel netewa Azerbeycan û gelên dın ku lı Azerbeycan dıjin, bı Asuriyan, bı Ermeniyan u.h.w. re yekiti û bıratiyek temam pêk bine.

7) Partiya Demokrat a Kurdıstan, jı bo armanca berewpêş ve bırına kışt û kal (ziraat) û bazırganiya Kurdıstan û berfıreh kırına kar û barên kulturi, bıjıjki û baştır kırına jiyana abori û ya manewi ya gelê Kurd dê dest bavêje jı bo istifade wergırtın bı serveta mılli û hebûnên ser erd û bın erd ên Kurdıstanê û dê dı wê riyê de têkoşe.

8) Em dıxwazın bı tevayi gelên İran imkana têkoşinê bı serbesti bıstinın jı bo bextewari û pêşketına welatên xwe

Bıji Kurdıstana xwud muxtar û demokratik

Pışti belav kırına vê belavokê êdi têkoşina Komela Je-Kaf rawesta û qet agadariyek jı aliyê Komela Je-Kaf û lı ser rawestana têkoşinn, an guherandına nav an ji lı ser helweşandına wê belav nebûye.

Dr. Jegalina Rojhılatnasa Sovyeti dı nıvisandınek xwe ya bı nav û nişana "Komara Mahabad Kanûna Yekem 1945 û Çırya Yekem a 1946" ku hin neweşandiye de wıha dınıvise : " Têkoşina Komela Je-Kaf a dı navend û xwarê Kurdıstan de, kevneperestên İran û casûsên Ingılizan tırsand û ketın hewl û xebatê jı bo sazkırına nakoki dı navbera rêberên Komela Je-Kaf. Dı netica wê de Komela Je-Kaf dı ni-



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

vê duyemê sala 1945 an de nema."

## KOMELA JÊ–KAF JI BO ÇI SAZ BÛ Û JI BO ÇI TÊK ÇÛ?

Bersiv dana vê pırsê hınek zehmet e. Nıviskar û dirokzanên Kurd heta nıha bı awaki fıreh vê mesela han a gırıng nekolane. Eger car carnan bı tesadufi lı ber pênûsa wan ketıbe ji, tenê behsa anina navê Je-Kaf, ciyê damezırandın û navê damezrênerên wê têne kırıne.

Hınek nıviskarên Kurd, her tenê bı vi awayi wazan dıdın û dıbêjın ku; "jı ber ku Komela Je-Kaf rêxıstınek nasnonalist bû,hewce bû ciyê xwe bı partiyek demokrat bıda guhertın."

Hınek dın dı bahs kırına lı ser Komela Je-Kaf de, dı xwe re nabinin kakıl û siyaseta komelê roni bıkın û bêjın Komela Je-Kaf dı Kurdıstana İranê de rêxıstınek nasyonalist a Kurd bûye. Lı ba wan wısa ye, ku eger bahsa nasyonalizma Kurd bıkın dıbın kafır, an ji xwe kevneperest dıhesıbinın.

Nıviskarên biyani ji bı bê belge û dokumend dı çarçeva berjewendiya xwe de lı ser Komela Je-Kaf dısekının.

Lı gora bir û baweriya mın, eger em bêjın Komela Je-Kaf rêxıstınek nasyonalist a Kurd bûye, ne her tenê em nabın kafır û nakevın bın guneheki, her wıha emê behsa rastıyekê ji bıkın, ku lı gor hel û mercên wan salên Kurdıstanê verê ketiye Komela Je-Kaf, eger rêxıstınek nasyonalist (yani patriyotist-welatparêz) nebûya, ger dı riya hişyar kırına giyanê netewayeti û têkoşina siyasi de dest pê nekırı bûya û wê rê û giyanê netewayeti têkoşina xwe nedomandı bûya û mesela Kurd jı bo wê jı hemû meselên dın gırıngtır nebu-



www.netewe.com

ya, çawa dê bıkarıbaya dı demek ew qas kurt de bı wi awayi berfıreh bıbe, şax û çıq baveje û dı perçên Kurdıstanê yên dın de, têkoşerên Kurd bı kevın bın sipera wê?

Her wek dı pêşi de ji me bahs kır, Komela Je-Kaf dı mesela navxweyi de dı hal û mercek wılo de pêk hat, ku Kurd bı awaki lez ber bı helandıne de dıçûn. Zman, edebiyat, cıl û berg û hemû orf û adet û şûnewarên Kurdewari jı holê dıhat rakırın. Zmanê xelkê bı wan dıhat jı bir kırın û an ji jı bir dıkırın. Kurdıstan dı hêla siyasi, esekeri, kulturi û cıvaki de kırıbûn metıngehek, tenê navê metıngehkariyê lı ser nebû, wısa bû ku sed xweziyê dıkır jı bo bûna metıngehkariyê.

Dı hêla navneteweyi de, sazbûna şer lı Avrûpa û ketına Yekitiya Sovyet nav şer, desthelatên hukumetên diktatori yên cizexm lerızandıbû. Hatına ordiyen hevpeymanan (sondxwariyan) a İranê, rejıma diktatori ya Rıza Şah roxandıbû. Hebûna ordiya rısgariker a Yekitiya Sovyet lı Kurdıstanê ımkanan jı bo têkoşina siyasi, serihıldan û sıtendına mafên netewayeti pêk anibû.

Dı 14 yê meha heftan a 1941 an de, "Peymana Atlantike" hatıbû belav kırın, ku dı benda wê ya sısiyan de hatıbû gotın ku; "Dewleta Amerika û Ingıliz ihtiramê lı mafê hemû netewayeki ku bı başi helbıjartına çeşna hukûmeta xwe bızanın dıgrın û hevidarın ew neteweyên ku heta nıha bı zorê jı mafên hakimiyet û serbıxweyi yên xwe hatıne bêpar kırın, bıgıhijın mafên xwe."

Dı rewş û mercek wıha de, jı bılı rêxıstınek welatparêz qet tu parti û rêxıstınê nıkaribû gırs û komên xelkê jı bo bıdestxıstına mafê dagırkıri ya netewayeti han bıdaya. Komela Je-Kaf, rêxıstınek wısa bû û jı bo wê ji bê heq navê wê nekırıbûn "Komeleyi Jiyandneweyi Kurd."



www.netewe.com

Pewiste dı behsa nasyonalizm de nasyonalizma netewên xwedan desthılat û fermanrewa, ku armanca wan bındest xıstına gelên dın e û serê wê dıgıhijê şovenizma mezınwxazi û dagırkırıne, dıvê em jı nasyonalizma neteweyên bındest û mafxwari veqetinın ku dıxwazê nirê xwe yê koleti û bındestiyê bışkıne û bı serbesti bıji. Karektera himê nasyonilizma neteweyên bındest, naverokek wê ya demokratik û rewşek wê ya dıji emperyalizm û metıngehkariye heye.

Ehmed Sukarno, ku têkoşerek dıji metıngehkariyê ye û bı welatpareziyek mezın ve hatiye naskırın, wıha dıbêje : "Nasyonalizm ji bo me gelên Asya û Afrika armanceki cıwan û pêşkewtixwaz û çavkaniyek jı têkoşina me ye."(35)

Derveyi vê, gelek kes nasyonalizma rêberiya tevgerên rızgarixwazên welatparêzi, dı rewş û mercek diyari kıri ya dirokê de kakılê ideoloji û rêbaza hêzên dıji metıngehkariyê qebûl kırıne.

C.L.Nehrû wıha dıgot : "Pêşeroja Hındê, dıbê dı riya pewendiya nasyonalizmi û nûdaxwaziyan de diyar bıke. Nasyonalizma teze hılgırtına riyeka dıji emperyalizma biyani û kevneperestiyê ye."(36)

Eşkeraye ku ew hêzên dı tevgera rızgarixwaziya welat de beşdar dıbın û dı bın ala nasyonalizmê de dıcıvın, dı rêkê de nehatıne nav tevgerê, çûn û daxwaza wan wek hev nine. Burjuvazi, ku hılgırê ala nasyonalizmê yê, dı tevêbûn û rêçûna xwe de dı warê giyanê nasyonalizmê jı karkeran tê cuda kırın. Kedkarên bajêr û gund, rewşenbirên demokrat û şoreşger, hetta burjuvaziyên bıçûk ên netewên bındest ji, dı nasyonalizmê de rızgariyê dıbinin,pêşerojan dıbinın yên rojên sosyalizma ılmi û nasyonalistiyê lı dıji derebegi, emperyalizm û dagırkeriyê bıkar tinın. Wek ku Ehmed Sukarno gotiye : "Nasyonalizm nıkare bıbışkıve gul bıde, illa hewce-



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

ye dı baxê enternasyonalizmê de ajar bıde."(37)

Eşkera ye nasyonalizm wextê bı mılê rast de bıkeve û qazanca xwe dı nebûn û bındest kırına gelên dın de bıbine, dı riya tevgerê de dest dırêji emperyalizm û kevneperestiyê bıke û bıkeve ser riyek çewt û dıji sosyalizm û partiyên komunist û bı hewayê "dınya hur" rabe, dost û dıjmınên xwe nasneke û bı deste dıjmınê xelkê xwe bıgre; ew wext êdi ne her pêşkewtixwaz nine, her wıha paşverû û kevneperest e û jı bo tevgera welatparezi ya netewa xwe ji zerara wê heye.

Komela Je-Kaf, rast e rêxıstınek nasyonalist û welatparêz bû, ku jı bo rewş û mercên Kurdıstan ên wan rojan ava bıbû. Doza "malıştına zıncir û nirê koletiyê ya lı ser stuyê netewa Kurd dıkır û dıxwest dı Kurdıstana iro ya perçe kıri de, Kurdıstanek mezın, rêk û pêk bine berhemê, ku her Kurd bı serbesti tê de bıji."(38)

Her çend hınek derebegên Kurd jı bo parastına berjewendê xwe ketıbûne rêza Komelê lê Komela Je-Kaf hılgıre ideolojiya burjuvaziya bıçûk a Kurd bû û lı dıji dabewşûnên (urf û adetên) derebegi û eşiret bazari xebat dıkır.

Nasyonalizm dı destpêka ajardana serihıldanê de wek bir û baweriya burjuvaziya bıçûk dıji derebegiyê xwe nişan dıde Ew helbest û nıvisandınên jı aliyê endamên Komela Je-Kaf de hatıne belav kırın bı awaki baş dıxın ber çav, ku Komela Je-Kaf lı gel derebegiyê bı rê neketiye. Em wextê bınêrın awayê çêbûn û rêxıstıniya Komelê, ev rastiya han jı bo mırov derdıkeve, ku burjuvaziyê mezın yê Kurd ê lı gora wê demê "dewlemendên mezın ên Kurdıstan", serekeşerit û xwedan mılkên mezın, beşdar û endamên komelê nebûne. Burjuvaziyê nugıhışti yê Kurd, jı bo parastına qazanc û berjewenda xwe pala xwe dıda serekeşiret û derebegan. Dı riya qiz dana hev û jın xwestınê,sazkırına



www.netewe.com

xızmatiyê (mervati) re, dıxwestın pıştevani jı xwe re peyda bıkın. Wextê em lı rewşa wan rojên Kurdıstanê bınêrın jı bo me baş derdıkeve holê ku burjuvaziyê Kurd bı çı awayi qiz dane derebeg û serekeşiretên wek Debokri, Mangor, Gewrık, Mameş û yên dın û an ji jın jı hev xwestıne. Dı eksê vê de, Komela Je-Kaf wek rêxıstınek nasyonalist, xwedan bir û baweriya burjuvaziyê bıçûk ê Kurd, dıxwest derebegi jı ser desthılatê bıxe û bı xwe desthılata siyasi bıgre destê xwe. Lenin wıha dıbejê : "Hişyarbûna cıvakên xelkê dı bın desthılat û bandoriya derebegi û xebata wan dıji sistema netewayeti, dı qonaxa serdestiya xelkê yan netewê de pêşverû ye."(39)

Em dıkarın bı eşkere bêjın, ku peydabûn û rêveçûna Komela Je-Kaf, berhem û rengdana zılm û zora Hukûmeta şovenist û diktator a reş a Rıza Şah û bersiva qonaxa jiyandın û geşkırına hestê netewayeti yê gelê Kurd bû. Jak Rabemancarê rêberê tevgera netewayeti ya Malakaş , ku pışt re bû cigırê serekomarê welat wıha dıbêje :'Ew bûne nasyonalist, jı ber ku ewan dıxewst desthılata mılli bıxın destê xwe. Jı ber ku, jı bo destxıstına pêdawıstiyên mıllet têdıkoşan." (40)

Ez bawerım ku lı ser sekınina peydabûn û têkçûna Komela Je-Kaf pêwistiya kırınên zêdetır pê heye. Ew wezifa han dıkeve ser mılên diroknıvisên Kurd ne ku yên biyaniyan ku bı serê çıma pênûsa xwe bêjın pêşverû ye û an ji paşverû ye.

## KONGRA PARTİYA DEMOKRAT A KURDISTAN

Dı meha İlona sala 1945 an de, carek dın hınek kesên Kurd hatın bang kırın Bakuyê paytexta Azerbeycana Sov-



www.netewe.com

yetê. Ew kesên vê carê bı Qazi Muhemmed re çûn, evên han bûn : "Menafê Kerimi, Eli Rıhani, Qasımê Êlxanizade, Muhemmed Huseyxanê Seyfi Qazi, Ebdullahê Qedri Celdiyan, Kak Hemzeyê Nelos, Nûri Bege Begzade, Qazi Şıno." Lı ser vê sefera han belgeki resmi dı dest de nine, lêbelê, begoman mesela Kurd û Kurdıstan û peywendiya lı gel Azerbeycan mıjara gıringi ya wê muzakerê bûye.

Pışti vegera jı Bakû, yekemin Kongra Partiya Demokrat lı bajarê Mahabad hat çêkırın. Dı belavoka Partiya Demokrat a Kurdıstan de, a jı bo vi bari hatiye belavkırın de wıha hatiye gotın:Roja 2.8.1326–25 ê Çırya Yekem sala 1945 an xwarê ne:
nuner û mıntıqên Kurdan ên beşdar lı gor tertiba xwarê ye:

" 1)Mako û Ararat : Axaye* Omerxanê Celali, Axayê Şêx Hesen, Axayê Şêx Ki, Axayê Hesen Axayê Dıriyan, Axayê Ebdullah; Axayê Mılan, Axaye Fexri.

2) Soma, Bradost, Deşta Mêrgewerê : Axayê Omerxanê Şerifi, Axayê Tahırxanê Sımko, Axaye Ebbas; Axayê Fınak, Axayê Qutas; Axayê Mamediyan, Axayê Haci Wetman, Axayê Şero, Axayê Ebdi, Axayê Hesen Telo, Axayê Ezo, Axayê Hesen Henarê, Canebê Axayê Seyid Ebdullah Efendi.

3) Şıno : Axayê Musaxanê Zerza, Axayê Qereni; Axayê Zerza, Axayê Mirza Seid, Axayê Qazi Muhemmed, Axayê Kak Hemze.

4) Sındos : Axayê Ehmedê Kak Xıdri, Axayê Qasım; Axayê Piroti, Axayê Mehemmed Emin; Axayê Piroti.

5) Laheçan : Axayê Ebdullah axayê Qadıri, Axayê Kak Mamend Qadıri, Axayê Kak Huseyn Mehmedi, Axayê Piroti Axayê Emır Eşayiri, Axayê Mehmed Emin Axayê Piroti.

6) Piran : Axayê Mehmed Emin Axa, Axayê Qırni Axa.



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

7) Miyandıwaw : Axayê Mehmed Huseynxanê Seyfi Qazi.

8) Bokan : Axayê Ebdurrehmanê Şerif Kındi, Axayê Reşid Elizade.

9) Mangor : Axayê İbrahim Axayê Edhem, Axayê Mam Huseyn, Axayê Kak Sılêman, Axayê Kak Hemze, Axayê Minaxa." (41)

Dı tu belavokên resmi de navên endamên Komita Merkezi nehatiye belav kırın. Tenê dı bûyerên dawiyê de derketın, ku serekeşeritên wek Omerxanê Şıkaki, Reşid Begê Herki, Zero Begê Herki û yên wek wan jı bo Komita Merkezi hatıne helbıjartın.

Dı dawiya Kongrê de programa Partiya Demokrat a Kurdıstan a jı 22 maddan pêk hatiye bı vi avayi hatiye belav kırın :

Bısmıllahırrehmanırrehim

Programa Partiya Demokrat a Kurdıstan

Bırê Yekem :

1) Navê partiya me; Partiya Demokrat a Kurdıstan e.

2) Bıngehê me lı ser van tıştên jêrin hatiye danin :

Heqiqet, edalet, pêşketın; temamên nizamname û qanûnên partiyê pışti tesdiq kırına Kongrê dê bên bı ci kırın.

3) Pênûs û sımbılê genım nişana Partiyê hatiye qebûl kırın.

Bırê Duyem :

4)Dı wextê nıha de armanca heri mezın a partiyê jı vê pêk tê,ku dı çarçeva dewleta İran de parêzgeri lı mafê gelê



www.netewe.com

Kurd bıke. Û jı bo pêşvebırına van mafan rê û şûna xwud muxtariyê bê danin..nin. Temamê wilayet û eyaletên ku dı dırejayiya dirokê de Kurd lı wır dıjin û zehmetiyan te de kêşane, her jı bo vê rewşa Kurdıstan hewceye lı ser esasê demokrasiyê qezenca gırsên gel lı ber çav bê gırtın. Hewceye cûrecûretiya ya netewayeti, qewmi û mezhebi lı ber çav bê gırtın, huqûqên wan jı bo helbıjartına nûnerên wan bo Meclisa Şûra ya Mılli bê naskırın.

5) Armanca Partiyê ewe jı bo pêşve bırına demokrasiyê lı ser esasê wê jı bo bextewariya beşeriyetê têbıkoşe.

6) Tu dıjmınatiyek û nakokiyek Partiyê lı hember dewleta merkezi nine, tenê dıxwaze dı riya aşitiyê de jı bo damezrandın û pêşve bırına kultur, bıjijki (tendurısti) û kışt û kalê (ziraat) gelê Kurd têbıkoşe, ku dı netica desthılata bê exlaq a mêtıngehkar de paşketiye û jı bo vê ji doza mafê xwud muxtariya netewayeti dıke.

Bırê Sêyem :

7) Temami maliyat û hebûn lı gora pêwistiyan dıvê bê par kırın lı ser vi esasi hesabê butçê dıvê bê tenzim kırın û belav kırın.

8) Hukûmeta Mılli dı gava yekem de dê dest bavejê avakırına welat û pêşve bırına teşkilatên abori û siyasi, jı bervê yekê em nıkarın jı sedi sısê (%3) zedetır maliyat û komkırın bıdın hukûmeta merkezi.

9) Dıvê ku temamê memûrên mılki, siyasi û teşkilatên kışt û kal jı Kurdan bın. Hukûmeta Netewayeti, her wextê ku pêwist bıbine, dıkare muşawirên derve bang bıke. Temamê kar û barên cıvaki, dewleti û edliyê hewce ye bı zmanê Kurdi bê nıvisandın û rêve bırın.

10) Parti, jı bo pêşvebırına kışt û kal dê hewl bıde makinên nû yên kışt û kal bıkıre. Parti dê têkoşe jı bo pêşeroja



www.netewe.com

gunduyan û jı bo ku tıştên bı dest bıxın, bı başi bê fırotın.

11) Parti, dê têkoşe jı bo cikırına kesên rê gırtıne ber xwe ku koçi ciyên dın dıkın, temamê wan dıjitiyên ku gundiyan mecbûri ci guhertınê kıriyê jı navbera wan rake.

12) Parti, bê berçavgırtına ferqa netewayeti, qewmi û mezhebi, dı jiyana siyasi, abori, kulturi û tendurusti de parêzgeri lı temamê wan kedkarên ku dı Kurdıstan de dıjin bıke.

13) Jı bo armanca pêşve bırına ılm û şarıstaniyetê lı nav xelkê Kurdıstan dê xwendına destpêki û navin bıbe mecbûri û dı temamê dıbıstanan de hewceye xwendın bı zmanê Kurdi bê kırın.

14) Jı bo armanca pêş xıstına dereca xwendewariyê û jiyana şarıstaniyetê dê gelek merkezên zanısti, kıtêbxane, ciyên xwendınê, kulub, tiyatro û meydanên sporan ji bên ava kırın.

15) Temamên wan memûrên ku dı idara eyalet û wilayetan û dı yên eskeri de kar dıkın, dıvê vegerın Kurdıstanê.

16) Hukûmeta Mılli, jı bo bı berçavgırtına qezenca xwe lı gel dewletên dın û dı gava yekem de lı gel dewleta mezın a Sovyet wê pêywendiya kulturi û abori deyne.

17) Hukûmeta Mehelli ya Kurd, dı temamê ew konferansên navneteweyi de, ku jı bo jiyana beşeriyetê tên çêkırın lı gora nufûsa xwe wê dı wan de doza temamê huqûqên xwe bıke.

18) Dıvê Hukûmeta xwud muxtari ya Kurdıstan, xwedi ixtiyari be, ku imtiyaza hebûnên pêkhati û pêk nehati yên bın erd ên Kurdıstanê çı kesê ku jê re bıxwaze, bıde wi.

19) Hukûmeta Mılli, jı bo temin kırına peywistiyên xelkê Kurdıstanê dı riyek erzan û bê ser êşi û dıjitiya bı tin dı eksê selem-xwur, gıran-fıroş û muxtekiran de wê kar bıme-



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

şine.

20) Hukûmeta Mılli, aboriya Kurdıstan dê pêşve bıbe û dê dı temamê bajaran de zıneet damezrine. Dıvê ew destên bê emin ên metıngehkaran lı ser serweta tabii bê qutkırın. Hewceye em jı wan servetan feyde bıgrın. Û dı eyni xewtê de ji bo qezenca beşeriyetê amade bıkın.

21) Dıvê dı temamê kar û barên siyasi, abori û cıvaki de jın ji wek mêran,xwedan huquqên wek wan bın.

22) Dıvê bı temami mafên kemati yên neteweyên ku dı Kurdıstan de dıjin (Ezerbeycani, Ermeni, Asuri) bê gırtın ber çav.

Partiya Demokrat a Kurdıstan
Adar 1324 (1945)

Pêşiyê emê çaveki bavêjın damezırandına Partiya Demokrat û damezrênerên wê û lı ser beşdarbûyên Kongrê û programa Partiyê hûr û hûr bısekının û hınek tıştan bıdın ber çav. Jı vê ji hewce ye em bıkevın nav, lê bınêrın û lı ser bıaxıvın.

1) Bı damezırandına Partiya Demokrat, ku bêguman teklit kırına fırka Demokrat a Azerbeycan bû, Komela Je-Kaf jı warê kar derçû û desthılat jı destê burjuvaziyê bıçûkê Kurd ê ku dı wê wextê de û dı rewş û mercê wan rojên Kurdıstan de perçeki pêşketi yê cıvata Kurdewari bû,derket. Pışt re ket destê taqımê burjuvaziyê mezın û navin, ronakbirên xwe parêz (muhafazakar) û liberal. Hınek derebeg û serekeşiretên Kurd ji dı wê dest hılatê de beşdar dıbın, ku ne her tenê xwedan hestê Kurdayeti ninbûn, Her wıha peywendiyên xwe yên nehêni ji lı gel Hukûmeta Tehran qut nekırıbûn.



www.netewe.com

2) Slogan û siyaseta Partiya Demokrat a Kurdıstan hetta jı bo mesela netewayeti ya Kurd lı gora slogan û siyaseta Komela Je-Kaf gavek paş e.

Dı rewş û mercê wê çaxê yê cihanê de, ku faşizm têkçûbû, dewletên mêtıngehkar hejiyabûn, gelên bındest û mêtıngeh jı bo rızgari û serxwebûna xwe seri hıldıdan û Hukûmeta İran ji dı rewşek xerab de bû, slogana rızgari û serbıxweyi ya Kurdıstan dıkari jı hemû sloganan zêdetır kom û gırsên gel lı dora xwe bıcıvine. Ew agahdariyên ku damezırênerên Partiya Demokrat belav kırıne, ew qas xweparêz (muhafazakar), jı aktifiyê dûr û bı awaki bedıl bûne, ku bı tu awayi nıkarıbûne bersiva xebata wan deman bıdın. Madda sısiyan wê agahdariyê lı gora "qanûna esasi ya wexte meşrutiyeta İran) doza encumena wilayetê Kurdıstan dıke, ku dı qanûna esasi de basa mafên neteweyên xeyri Farıs tê de ninbû û hetta lı gora wê wextê paşketi ji bû.

Dı madda pêncan de doza bı hevre bırêketın û lı hev hatına gundi û xwedan mılkan têkırın, ev wek aşiti peyda kırına dı navbera gur û miyê de bû. Eşkere ye ku mebesta me ew nine bêjın hewce bû doza "belav kırına zevi û ax" bıkıra, lêbelê, bı kêmasi dı vê lı aliki jı bo rakêşana gundi û kedkarên gundiyan û dı mılê dın de jı bo desthılat û zılma derebegan nişanek kıfş danibûya.

Dı madda şeşan de nıviskarên wê agadariya Kurdıstanê bı Azerbeycan datinın û wıha dınıvisın : " Partiya Demokrat dıxwaze lı gel gelên dın, ku dı Azerbeycan de dıjin (Asuri, Ermeni u.h.w.) yekiti bıratiyek temam pêk bine." Dı wextê ku gelê dı Kurdıstan de dıjin bıratiyek bı wan re nayê pêkanin.

3) Jı têkıliya Kongra Partiyê bı awaki baş kıfşe ku ciyeki ber bı çav û gırıng ên serekeşiret û derebegên Kurd dı



www.netewe.com

nav Partiya Demokrat de heye. Heta nıha ji roni nine ku dı Komita Merkezi de hejmara kesên ronakbir û burjuvaziyê bajêr çend bûye. Navên damezrênerên Komela Je–kaf dı kongrê an ji dı Komita Merkezi de ninın.

4) Dı programa Partiya Demokrat a dawiya Kongrê de hınek rasti bı berçav dıkevın, ku hev nagre û jı bo partiyek şoreşger nabe. Dı madda şeşan de tê gotın ku : "Tu dıjmınati û nakokiyek partiyê lı gel dewleta merkezi nine"

Dı benda çar û şeşan de doza xwud muxtariyê tê kırın. Lêbelê, dı benda şanzdeyan de wıha tê gotın : "Hukûmeta Mılli jı bo bı berçavgırtına qazanca xwe lı gel dewletên dın û dı gava yekem dê lı gel dewleta mezın a Sovyet, wê peywendiya kulturi û abori deyne."

Dı benda hejdeyan de, doza vê hewcedariyê tê kırın ku "imtiyaza hebûnên bın erd ên Kurdıstanê çı kesê jê re bıxwaze dê bıde wi."

Derveyi van daxwazan, guherandına ala İran, hılkırına ala Kurdıstan û diyar kırına nişana hukûmetê bı berovaji şêr u roja İran û qerar dana marşa nıştımani lı gel naveroka program û daxwaza xwud muxtari lı hev nedıkırın û ferqek gelek mezın dı navbera wan de hebû.

## JI BO PÊŞ HİN GAVÊN BILIND

Dı meha Çirya Duyem a 1945 an de, çapxana Kurdıstan lı Mahabad dest bı kar kır. Dı dıbıstanên bajêr de bı zmanê Kurdi xwendınê dest pêkır. Têkoşerên Kurdıstana Germin ên wek Mamoste Tewfiq Werdi, Osman Danış, Mamoste Kerim Zend, Qaniyê şaır û.h.w. dı van kar û barên dıbıstanê de ders gotıne û rolek gelek gırıng dı vi wari de



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

listıne. Roja 17 yê Kanûna Yekem a 1945 an, jı bo gelê Kurd rojeki diroki û jıbir neçûyi ye. Dı vê rojê de bajarê Mahabad bı şayi, govend û bı ahengê ve hatıbû xemılandın û bı awa û şêleke bê hempa ala şêr û roj a nişana Hukûmeta İran jı ser banê idara edliya Mahabadê anin jêr û dı şûna wê de ala sê rengin a Kurdıstan (sor, sıpi, kesk û roja ku nû dı ber çiyayê re derketi, du sımbılên genımê dı der û dorê û dı jêr de ji serê pênûsê) dı nav teqandına çekan, tıfıngan, şeştiran, çepık lêdan û hêl û hewara kom û gırsên gel de lı wi ciyi helkırın û pê re dı ro surebayê azadi dıhejandın.

Pışti vê, lı bajarê Bokan, Miyandıwa, Şıno, Nexede û Xani ala Kurdıstanê dı nav şayi û govanda komên xelkê de lı ser banên ciyên komitên Partiya Demokrat hatın hêlkırın. Helbestvanên Kurd lı ser ala Kurdıstan lı gor rewş û mercên pêk hati musabeqeyan saz dıkırın. Helbestên dıhatın nıvisandın komê xelkê zêdetır coş dıkır û dıhenkand. Hejarê şaîr jı ber vê yekê, dı helbestên xwe yên hêja de wıha dıbêje :

"Dari alekem wekû çıqle le bo çawi edû
Her kesi xwoşi newê rebi we ber xencer kewi
Rê necatmana pena bû İttihadi Şurewi
Sorme ye bo çawiême xak û xuli Moskovi" *

Hêmın û Xal Emin ji lı ser hêlkırına ala Kurdıstan helbestên bı dıl û can yên hestan radıkırın gotınê.

Pışti helkırına alê, Partiya Demokrat a Kurdıstan bı damezrandına "Hêzên Bergıri yên Kurdıstan" jı bo parastına

* Darê ala mın wek pijık têkeve çavê dıjmın
Ewê ku pê ne xweş e, rebi bı ber xenceran keve
Jı riya rızgariya mere bû bext Yekiti Sovyet
Ax û xweliya Moskoyê kılê çavê me ye



www.netewe.com

destketiyan gavek gırıng avêt. Kedkarên bajar û gundan bı awaki eşq , dıl û bı eleqe ve bı ber Hêzên Bergıri ve dıçûn, navê xwe dıdan nıvisandın û dıbûn pêşmerge. Ew serbazxanên ku dı navbera bist salan de bû, jı bo lêdan û kuştına xelkê, eskeran bı kar dıanin, bûbûn ciyên şûnewarên serok têkoşerên Kurd û dı wan ciyan de pêşmerge jı bo parêzgeriya welat dıhatın bıkaranin.

Hatına Barzaniyan lı Kurdıstana İranê, ku nêziki 3 hezar kesên çekdar bûn û serokek wek Mele Mustefa lı gel wan bû, hêvi û umudek pırtır xıste dılê Kurdên İranê û bû sebebê bıhêzbûn û pıştsturiya Partiya Demokrat a Kurdıstan. Hınek serekeskerên welatparêz ên Kurd jı mılên dın (mebest; Kurdıstana Iraqê ye -N.M.) hatıbûn, dı rêk û pêk kırına kar û barên pêşmergan û dı netica wezifa ku hatıbû sıpartını wan, dı wi wari de bûbûn wek nımûne.

Jı 17 yê Kanûna Yekem heta dawiya Rêbendan (22 yê Kanûna Duyem 1946 an) bajar û gundên Kurdıstanê dı şayi û govendan de xemlin û dı meha Befranbarê (meha 20 e Kanûna Yekem ta 20 ê Kanûna Duyem re tê gotın- N.M.) ya wextek sar, serma û berf de lı Kurdıstanê mızginiya cıvinek mezın dı dawiya meha Rêbendanê de, germayi bı xwe re anibû. Sıtranbêjên Kurd dı meqam û gotınên sıtranên xwe de ala Kurdıstanê û meha Befranbarê kırıne mıjar. Hejarê şair dı rıstê helbestek xwe de dıbêje :

"Ya xwa Befranbari sed hezari sali
Her wa xwoşi bi nebini tali
Xwa be Kurdıstan bêli alakey
Kurd muweffeqi bın bo regeyi çakey
Pişewa bıji we lawani cesûr



www.netewe.com

Be hemû awat bıge Supayi Sor." *

Dı 20 ê Befranbara (10 ê Kanûna Duyem) 1946 an de, dı idara Rojnama Kurdıstan de jı bo weşandına yekemin hejmara Rojnama Kurdıstan, organa Partiya Demokrat a Kurdıstan, cıvinek mezın hat saz kırın û Seyid Muhemmedê Hemidi berpırsiyarê Rojnama Kurdıstan, vê axaftına han dı cıvinê de kır :

"Roja 20 ê meha Befranbarê (meha dehan 1324 - ku Nevroz serê salê bê hesıbandın -N.M.) rojeke, ku stêrka xweşbextiya Kurd dı ber şefeqa wê re avetiye. Em ku bı salan û heta bı qırnan bû me daxwaz dıkır, ku rojeki bıkarın bı zmanê şêrin ê Kurdi, ku em dıkarın muqayesa wi jindarıtırin bı zmanê cihanê re bıkın, bıxwinın, bınıvisın û bıbın xwedi çap û weşanan. Dı rastiyê de ev daxwaza han jı me re wek xeyalekê bû. Wısa Heqteala merhemeta xwe fermand xeyala me bı saya serê xwe nişani me da. Yekemin hejmara Rojnama Kurdıstan hatiye weşandın. Ev roj cêjna danina idara rojname, kovar û weşandına hejmara yekemin "Kurdıstana me" hatiye kırın û em ispat dıkın, ku Kurd her çend jı aliyê dewletên mêtıngehkar de tê qırkırın û me qurbanên maddi û manewi dane ji emê nişan bıdın ku qet namıre û tu wexti dê nemıre."(42)

Komita Merkezi ya Partiya Demokrat a Kurdıstan, jı e-

---

* Ya maşele Befranbaran sed hezar sali
Her wıha xweş bi, qet nebini tali
Xwedêwo tu alê jı Kurdan re bıhêli
Kurd dı riya başiyê de bıserkevın
Serok bıji û xortên bêtırs
Bı her awayi Ordiya Sor



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook www.netewe.com

şiret, gundi û kedkarên Kurdıstanê xwestı bû ku jı bo ahenga damezranina Komara Demokrat a Kurdıstan bêne Mahabadê.

Roja yekemin a Rêbendane (21 ê Kanûna Duyem -N.M.) cıvinek lı Mızgefta Sor pêk hat û gelek kesan lı ser pêkanina Dewleta Kurdi û lı ser rızgariya Kurdıstanê axıft. Şêx Celalê Tahıri bı dılfurayi wıha dıgot :

'Axano, xelkê bı şeref ê Kurdıstan! Dı vê cıvinê de gelek kes jı axan, serekeşiretan, tacıran û jı melan axıftın. Jı bo rızgariya Kurdıstan, jı bo serkevtına vê serihıldana mezın dı Kurdıstanê de sê tışt pêwist e. Bê van sê tıştan tevgera me sernakeve. Yekem pere ye, duyem pere ye, sêyem pere ye. Eva mın sê dangê mılkê (nivê gundeki tê hesıbandın –N.M.) xwe lı navça Sındosê nezır û hıbeyê Partiya Demokrat a Kurdıstanê kır." Dı vê cıvinê de nûnerên bırayên Kurdên Tırkiyê, Suriyê û Iraqê ji beşdar bûn.

## İLAN KIRINA KOMARA DEMOKRAT A KURDISTAN

Roja duyem ê Rêbendana (22 yê Kanûna Duyem –N.M.) 1946 an, zêdetırı jı 20 hezar kesi lı Meydana Çarçıra lı bajarê Mahabad cıviyan. Ev xelkê han jı seranserê Kurdıstanê, bı beyi ku jı sar, serma û jı berfê acız bıbe û jı riyên dûr jı bo beşdarê vê buyera mezın bın,dı vê roja piroz de xwe giyandın Mahabad

Kolan u kuçen bajêr, çarmedori Meydana Çarçıra bı ala sê rengin a Kurdıstanê ve hatıbû xemlandın. Qazi Muhemmed dı nav qêrin û çepıkên xelkê de gihaşte Meydana Çarçırayê û dı ciyê xwe yê taybeti de sekıni. Qazi bı van keliman dest bı axaftına xwe ya diroki kır :



www.netewe.com

"Xelkê Kurd jı neteweyek e, ku welatê wi hatiye perçe kırın û dagır kırın. Lı aliyê dın, mafên wi jê hatiye sıtendın jı diyarkırına çarenıvisa xwe bê par e." Mıxabın temamê axaftına Pişewa dı dest de nine. Lêbelê, wek William Aegelton dınıvise, Qazi Muhemmed dı axaftına xwe de sıpasi alikariya Yekitiya Sovyet a maddi û manewi dıke û jı bo bıserkevtına Hukûmeta Mılli ya Azerbeycan bırayên Azerbeycani piroz kıriye.

Pışti axaftına Pişewa, ku damezrandına Komara Demokrat a Kurdıstan ilan dıke, Muhemmed Huseynxanê Seyfi Qazi, Qazi Muhemmed jı bo seroktiya Komara Kurdıstan ilan kır. Dı wê cıvina mezın de yên bı ber pêş de hatın xuya kırın û axıftın ev derebegên han bûn : "Sımailê Êlxanizade, Bırahim Êlxanizade, Rehmi Êlxanizade, Şêx Hesenê Şemsi Burhani, Bırahim Axayê Edhem, Axayê Kerimi, Zero Bege Herki, Hesen Axayê Me'rufi, Seyid Ezizê Gêlanizade û çend kesên ditır.

Pışti temam bûna cıvina duyemê Rêbendanê ( 22 yê Kanûna Duyem –N.M.), ku Qazi Muhemmed jı bo Serkomarıya Kurdıstan hat helbıjartın, jı bo kıfş kırına Wezirên Dewleta Komara Kurdıstan, dı Komita Merkezi de lêkolin hat kırın û pışti çend rojan ev navên han wek destê Dewleta Komara Kurdıstan dı Rojnama Kurdıstan de hatın belav kırın."

1) Haci Babeşêx, Serok Wezir

2) Muhemmed Huseynxanê Seyfi Qazi, Wezirê Bergıri Cigırê Serokomar

3) Mele Huseynê Mecdi, Wezirê Dadperweri

4) Ehmede Elahi, Wezire Bazırgani

5) Hemed Eminê Muini, Wezirê Navxwe

6) Kerimê Ehmeddin, Wezirê Post û Telgraf



www.netewe.com

7) Ebdurrehmanê Êlxanizade, Wezirê Derve
8) Menafê Kerim, Wezirê Kulturi
9) Sıddiqê Heyderi, Wezirê Tebligat
10) Xelilê Xusrevi, Wezirê Kar
11) Haci Mustefayê Dawudi, Wezirê Abori
12) Sımail Êlxanizade, Wezirê Rê û Ban
13) Mehmudê Welizade, Wezirê Kışt û Kal
14) Seyid Muhemmedê Eyubiyan, Wezirê Tendurusti

A dı vır de tıştê dıqetê dıkışine ew e ku jı bıli Haci Babeşêxi û du Êlxanizadan, Wezirên Dewleta Kurdıstanê hemû Mahabadi ne. Jı derveyi Sıdiqê Heyderi keseki dın jı damezranên Komela Je-Kaf dı Dewleta Komara Kurdıstan de beşdar nine. Serekeşiret û derebegên Kurd, ku dı damezırandına parti û dı kongrê de dı rêza pêşi de ciyên xwe gırtıbûn û endamê Komita Merkezi ji hatıbûn helbıjartın,pışti damezrandına Komara Kurdıstan jı ciyên desthılatdariyê hatın bıdûrxıstın, her çend dı navçên xwe de lı ser kedkaran hakimiyetê dıkırın û perçıqandın û şêlandına gundiyan dıdomandın ji. Ev bıdurxıstına serekeşiretan û cıvandına desthılatê dı destê Mahabadiyan de gelek kesan dılsar dıkır û tengi û astengan jı bo rêvebırına kar û bar dıxıstıne pêş.

Her xuyaye dı gel vê ji, ev qas demek kêm û kurt de Komara Demokrat û Kurdıstan, ku dı diroka xebata netewa Kurd de sıtêrek şewq dayi û destpêka diroka nû ya Kurdıstan tê hesıbandın, jı bo rêk û pêk kırına kar û barê Hêzên Bergıri jı bo pêş de bırına abori û bazırgani, berfıreh û xurt kırına kultur, zman û edebiyata Kurdi, jı holê rakırına hınek rêveçûnên xırab dı nav hêzên cıvakê de, jı bo nêzik bûna gelên dın ên Îranê hınek gavên bı lez jı bo feyde wergırtınê, hatın avêtın emê bı kurti lı ser wan bısekının.

1) HÊZÊN BERGIRÎ :



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

Damezırandına Hêzên Bergıri bı awaki ordi rêk û pêk,bıkaranina pêşmergan bı awaki nizami, avêtına gavek gıring a Partiyê û Hukûmeta Mılli ya Kurdıstan bû. Her çend lı gora usûl û qaidek bı ser û ber dı nav wezifê û perpırsiyari par kırınê de nebû. Derebeg û kurên axan her bı xwe dıbûn serekhêz û stêrkek û an du sıtêrk bı ser mılên xwe ve dıdırûtın û wısa lê hatıbû jı ber kapitan, pulkuniki û putpulkuniyek (evên han navên rutban ın, bı rasti me nekari lı hember van ka dı zmanê dın de çı tên bıkaranin em peyde bıkın –N.M.) rêdani nema bû. Wextek hat ku jı bıli Barzaniyan û berpırsiyarên eskeri yên Kurdıstana Iraqê, ew kesên perpırsiyarên eskeriyê, rojek dı eniya şer de beşdar nebûn. Generalên wek Hemê Reşidxan û Omerxanê Şıkaki, dı wextê pêwıstiyê de pışt dane tevgera rızgarixwaz a Kurd. Yek jı wan xwe avête hımbêza Ingılizan ê dın ji xwe avetê hımbêza İran.

2) WEŞAN Û DIBISTANÊN KURDİ

Dı wi wextê kurt de weşandına Kovara Kurdıstan, Rojnama Kurdıstan, Kovara Nıştıman, Helale, Awati, Hawari Nıştıman, Hawari Kurd, Gır û Gali Mındalan, çap kırına kıtêban bı zmanê Kurdi û afırandınên gıring ên têkoşanên parti,komele û Hukumeta Mılli ya Kurdıstan pêkhat.Dı temamê bajarên bın desthılata Hukûmeta Mılli de, derveyi navça Şıkakan, xwendın bı zmanê Kurdi dest pê kır. Yekem car tabloya lı ser idare û lewhên dıkanan bı zmanê Kurdi hatın dalıqandın. Radyo bı zmanê Kurdi program belav dıkır, rojnaman bı zmanê Kurdi deng û bahsên cihanê û yên Kurdıstanê belav dıkırın, lı ser bıserketına Yekitiya Sovyet û pêşketına wê dınıvisandın. Rojnama Kurdıstan lı ser diroka Kurd û Kurdıstan, lı ser dostatiya lı gel Yekitiya Sovyet



www.netewe.com

maqalan belav dıkır.

### 3) BEŞDARBÛNA JINAN DI KAR Û BARÊN CIVAKİ DE

Dı wextê Hukûmeta reş a Rıza Şah de, dı İran de bı gışti ne tenê dı cıvakê de gırami û ciyek jınan tunebû, her wıha wek qelen dan û bı wesila revandın û lı gora dılbijina mırovan lı wan dıhat nêrin. Jı diyarkırına çarenıvisa xwe bê par bûn. Mırovan dıkarin keç bıfırotana, telaqê jınê bavêtana, bıxısta der û cıwaniya wê ya şêrin jê bıstendana.

Lı Kurdıstan jı wê ji xerabtır bû. Gelê Kurd wek netewe jı hemû mafên xwe bê par bû. Jınên Kurd du car dıhatın perçıqandın. Jınên Kurd dı nav nexwendıni û nezanin de hatıbû gırtın. Zarok lı ser dergûşê dayin, next (qelen) sıtendın, keç fırotın, jın bı jınê guhertın (berdêl), telaq dana jınê bı neheqi û markırına bı caşi, jı bo jınan mafê nivpar dı warе mirat û şahıdiyê de û dı kar û barên dın de wek ku şerieta İslamê goti, jın xwestın û revandın, bûyerên dızi û nehezkıri yên cıvaka Kurdewari, sebebên bê mafbûna jınên Kurd bûn. Partiya Demokrat a Kurdıstan, van qeyd û zıncirên dı destên jınên Kurd de bûn, derêxıst. Jınan ani sewiya mêran û dı rêvebırına karên cıvakê de wan beşdar kır. Partiya Demokrat bı fermaneki, qelen sıtendın, zarok mahrkırına mırovên kalemêr û keç bı hev guhertınê (berdêli) qedexe kır. Her çend dı wê dema kurt de nedıkari bı yek cari hemû buyerên nehezkıri yên çend hezar salên Kurdıstan pak bıkıra, lêbelê, evên han gavên bılınd û pêş bûn, ku Parti û Hukûmeta Mılli avetıbûn.

Wextekê jı Pişewa dıpırsın: "Fırka Demokrat a Azerbeycan dı helbıjartınan de mafê dengdanê daye jınan, gelo we ji vê yekê kiriye?"



www.netewe.com

Dı bersiva xew de dıbêje : "Ez lı gel wê me û van karên han em bıbaşi bızanın, lê hewceye jı we re arz bıkım, ku me vê serkevtına han hin jı xwe re bı ci nekıriye."

## 4) BAZIRGANİ Û PÊŞVEÇÛNA JİYANA XELKÊ

Komara Demokrat a Kurdıstan jı bo pêşvebırına bazırganiya Kurdıstan a rawestiyayi û baştır kırına jiyana xelkê, hınek gavên baş avetiye. Pêkanina Şırketa Teraqi, ku peywendiya bazırgani lı gel Yekitiya Sovyet damezrandı bû, yekek jı wan gavên gıring bû. Tûtına sala 1944-1945 an a Kurdıstanê, dı embarên idara tûtınê ya Mahabad, Nexedê û Bokan de mabûn û dewleta İranê nedıkıri û dı wê riyê de Kurdıstan xıstıbû bın hesara aboriyê. Şirketa Teraqi, temamê tûtına Kurdıstanê fırotê Yekitiya Sovyet û dı şûna wan de şekır, perçe û tıştên ihtiyaca xelkê jı bo bazara Kurdıstan sıtend. Ev karê han, ku fırehi xıste bazarê û xelkê perê tûtınê sıtend, belko tûtınwanên Kurd ji hêvidari kırın, ku dı rojên pêş de ji dê tûtınê bıfroşe, lı ser namine. Jı bıli eva han Komara Kurdıstan bı azad kırına sınor dest pê kırına çûn û hatına Iraq û Tırkiye ya xelkê, kırin û fırotın û bazırgani dı navbera perçên Kurdıstanê de zêde kır. Gelê Kurd jı Kurdıstana Iraq û ya Tırkiyê, dıkari bı serbesti bê welatê perçe kıri. Û dıkarıbû jiyana xwe bımeşine. Wê qonaxa han ne her tenê bazırgani, jiyan û dan û stendına xelkê ya bazari xurt û zındi kır, her wıha peywendiya siyasi, rewşenbiri û giyani ya netewayeti ji bı hêz dıkır.

## 5) GIRINGİ DANA TÊGEHIŞTINA XORTAN

Partiya Demokrat a Kurdıstan, bı damezırandına rêxıstına xortên Kurdıstan, bı tegıhıştınek dı riyek nû de Kurd jı bê xwediti û bê ser û beri derani û tegıhiştına welatparezi û



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook

hestê Kurdayetiyê dı nav xortan de gurr kır. Dı vi wari de şandına xortan a Tebrizê û Yekitiya Sovyet dest pê kır. Çend xortên Kurdan jı bo xwendınê hat şandın Yekitiya Sovyet. Mıxabın ev karê han ji wek gelek gavên dın dı çarçova tengitiya çinayeti de nehat gırtın. Hınek kurên derebeg û yên burjuvaziyên bajêr, bı bê lı ber çav gırtına rewşa wan û imtihanê şandın Sovyet. Jı ber vê ji yeki jı van ji xêr negihande tevgera azadixwazi ya Kurdıstanê. Xeni Bılûryan ne tê de, ku pışti têkçûna Komara Kurdıstan paş de vegeriyaye û dest avêtiye têkoşanê, yekemin Rojnama Rêga wek organa Komela Je-Kaf, pışti têkçûna Komara Kurdıstan tevi Kak Hesenê Qızılci weşandiye. Temamê jiyana xwe bı derbederi û dı gırtigeha rejıma Pehlewi de derbaz kıriye û pışti 25 sal xwe ragırtına qehremani dı şerpezeti, rezalet û bê mafiyê de bı illeta bê tecrubetiyê û dı bın tesira hınek muşawırên nezan de ber bı xeletiyekê de çû, ku gelek mıxabın nedıbûya ber pê ve bıçe ku guneh kırın û lomên xelkê bên ser.

## 6) PEYWENDİYA DOSTATİ Û YEKİTİYÊ LI GEL AZERBEYCAN

Dı destpêka malıştına desthılata gemari ya Hukûmeta Pehlewi dı Kurdıstan de, dı sınorê Kurdıstan û Azerbeycan de rewş bê ewle bû.Gelek caran dı navçên Ûrmiyê, Salmas, Xoy û Miyandıwaw dı navbera Kurd û Azeriyan de dıjiti û heta lı hevxıstın ji saz dıbû.

Azerbeycaniyan, ku dı dırêjayiya dirokê de destê wan dı perçıqandın û bındest kırına gelê Kurd û Kurdıstan de hebû û lı gel Hukûmeta şovenist a Tehranê hevdest bûn, dıxwestın nıha ji her lı ser vê siyasetê bımeşın û ciyê Hukûmeta Tehranê bıgrın. Hetta ev xeyala wan a xam ji hebû, (her



www.netewe.com

wek dı muzakerên wan ên bı Tehranê re derketın) ku xwud muxtariya Kurd (ne ya Kurdıstan) dı çarçuva Azerbeycan de qebûl bıkın. Pışti van, ku Hukûmeta Mılli ya Kurdıstan neket bın barê vê bir û baweriyê, wê çaxê ewan siyaset guherandın, lı Miyandew û Selmas mırovên wan şer saz kırın û Rûsi ketın berevaniyê û roja 23 yê Nisana sala 1946 an dı navbera karbıdestên herdû aliyan; Hukûmeta Mılli ya Kurdıstan û ya Azerbeycan de lı bajarê Tebrizê cıvinek pêk hat û peymana jêr hat imza kırın. Noqtên peymana hati imza kırın ev ın :

"Jı bo qaim kırına dostayeti dı navbera Azerbeycan û mılletê Kurdıstan de, jı bo paydariya samimiyet û dostayetiyek zêdetır dı navbera wan herdu mılletan de ev qerarên jêr hatın qebûl kırın û herdu ji dê van dı jiyana xwe de tetbiq bıkın.

1) Lı wan ciyên ku pêwist bıbinın herdu hukûmetên mılli ji nûner datinın.

2) Dı Azerbeycan de ew ciyên ku danıştıwanên wê Kurd bın, kar û idara dewletê jı bal Kurdan tê kırın. Û her wıha lı Kurdıstan ji ew ciyên ku para gelek danıştıwan Azerbeycani bın, jı bal memûrên Hukûmeta Mılli ya Azerbeycan de dê bê idare kırın.

3) Jı bo helkırına bûyerên abori dı navbera herdu mılletan de, qomisyonek têkeli dê bê damezrandın, ew qomisyon dê hewl bıde vê mesela herdu hukûmetan hel bıke.

4) Dı wextê pêwistiyê de dı navbera Hukûmeta Mılli ya Azerbeycan û Kurdıstan de hevkariya pêşmergeyi dê bê kırın û hewce ye eva han lazım bıbe jı bo alikariya hev û du bê kırın.

5) Her wextê pêwist be lı gel Hukûmeta Tehran bê axaftın, hewceye muwafeqeta nêrina Hukûmeta Mılli ya Azer-



www.netewe.com

beycan û ya Kurdıstan bê gırtın.

6) Hukûmeta Mılli ya Azerbeycan jı bo wan Kurdên ku lı ser axa Azerbeycan dıjin, hetta wê dereca ku bıkarıbe, jı bo pêşketına zmanê wan û pêşve bırına kultura wan a mılli dê hewl bıde.

Her wıha Hukûmeta Mılli ya Kurd ji jı bo Azerbeycaniyan, ku lı ser axa Kurdıstanê dıjin, jı bo pêşketına zmanê wan û pêşve bırına kultura wan, dıkarina heddê xwe de dê hewl bıde.

7) Herkesê jı bo têkdana dostayetiya diroki ya netewa Azerbeycan û Kurd û jı navê rakırına bırayeti û demokrasi yan ji perçe kırına yekitiya wan hewl bıde, herdu ali bı yekdesti wê kesê bı qebehet bıdın ceza kırın."

Jı aliyê Komara Demokrat a Kurdıstan de ev kesên han beşdari kırıne û imza kırıne : "Reisê Hukûmeta Mılli ya Kurdıstan Cenabê Axayê Qazi Muhemmed, Axayê Seyid Ebdullah Gêlani Endamê Komita Merkezi ya Partiya Demokrat a Kurdıstan, Axayê Omerxanê Şerifi Endamê Komita Merkezi ya Partiya Demokrat a Kurdıstan û Reisê Eşireta Şıkakan, Axayê Muhemmed Huseynê Seyfi Qazi Wezinrê Hêzên Bergeri yê Hukumeta Mılli ya Kurdıstan, Axayê Reşid Begê Cihangıri Endamê Komita Merkezi ya Partiya Demokrat a Kurdıstan û Reisê Eşireta Herkiyan, Axayê Zero Begê Bıhadıri Endamê Komita Merkezi ya Partiya Demokrat a Kurdıstan û Nûnerê Kurdê Şıno, Axayê Qazi Muhemmed Xıdıri."

Dı aliyê Hukûmeta Mılli ya Azerbeycan de : "Reisê Meclicsa Mılli ya Azerbeycan Cenabê Axayê Haci Mirza Eli Şıbıstıri, Serekwezirê Hukûmeta Mılli ya Azerbeycan Cenabê Axayê Seyid Cahfer Pişeweri Muawenê Sekreterê Fırka Demokrat a Azerbeycan, Axayê Padgan Wezirê Daxıli yê Azer-



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

beycan Dr. Sılamıllahê Cawid, Wezirê Kultur ê Azerbeycan Muhemmedê Biriya." (43)

Pışti imza kırına vê peymanê dıjitiya navbera sınoran xelas bû û dı wan bajarên Kurd û Azerbeycani pêk ve dıjiyan de, nûnerên eskeri yên siyasi bı hev re hatın tayin kırın û peywendiyên wan yên dostayeti bı hev re hebû. Pışti vê Mele Mustefayê Barzani, ku yekek jı generalê Kurdıstanê bû, bû Fermandarê Gışti yê Hêzên Çekdarên Kurdıstan û Azerbeycan. Şehid Mustefa Xoşnav ji bû Fermandarê Hêzên Bergıri yên Kurdıstanê.

## KIL Û KÊMASİ; SEBEBÊ TÊKÇÛNA KOMARA KURDISTAN

Dı pêkhatın, peyda bûn û jı holê çûna hemû bûyerên cıvaki de rola hınek sebebên nav xwe û derve heye û heryek ji lı gora xwe kar dıkın lı ser bûyerê û şûnan lı ber çav dıhêlın.

Dı pêkhatın û têkçûna Komara Kurdıstan de ji ev rasti û qanûn tên xuya kırın. Hoyên nav xwe û derva rola xwe lı ser list û mıxabın tevgera rızgarixwazi ya Kurdan jı bo wextek dırêj ber bı paşveketınê de hışt.

Dı rûpelên derbasbûyi de bı kurti be ji me behsa hoyên nav xwe û yên derve, ên pêkhatına Komela Je-Kaf û ya Partiya Demokrat û Komara Demokrat a Kurdıstan kır. Ez dıxwazım bı kurti ji be behsa hoyên têkçûna Komara Kurdıstan bıkım. Pêwiste eva han ji ez bıbir binım, ku mıxabın diroknıvisên Kurd gelek kêm lı ser vê bûyera gırıng a diroka Kurdıstan nıvisandıne. Hêzên siyasi yên Kurdıstan ji wek peywistiyek vê bûyera han a gırıng nekolane û qimet nedanê, ders jê wernegırtıne. Wek ku rojnamenıvisê Ameriki Roz-



www.netewe.com

welt gotiye : "Peydabûn û guherandına Komara bıçûk a Mahabadê diroka wê ya kurt û têkçûna wê ya qet lê hêvi nehati kırın, ronaktırin jı bûyerên diroka nû ya Rojhılata Navin e."

Rojhılatnasên biyaniyan kêm û zêde lı ser Komara Kurdıstan nıvisine, lêbelê, lı gora berjewenda xwe bahs kırıne. William Aegelton û Hesen Arfa bı dırêjayi lı ser Komara Kurdıstan nıvisine. Ewan herduyan ji, her çıqas hınek ronakiyan xıstıne ser tevgera Kurdıstana İranê û Komara Kurdıstan, lêbelê, herdu ji dı dawiyê de ketın pey jı bo armancên taybeti, ku xwestıne Komara Kurdıstan lı Mahabad buyerek bı destavakırına biyaniyan bınıvisın û Yekitiya Sovyet gunehkarê esli yê roxandına Komara Kurdıstan bıbinın û bir û raya gıştì ya gelê Kurd lı ser siyaseta Yekitiya Sovyet bı gunehkari dı esle Komara Kurdıstan de binın û bir û raya gıştì ya gelê Kurd lı ser siyaseta Yekitiya Sovyet şilo bıkın.

Pêkhatın û têkçûna Komara Demokrat a Kurdıstan hê baş nediyar e û veşartınên gelek zêde tê de hene û pewıstiya lêkolin û xebat kırınek zêdetır a zanısti pê heye. Ez hêvidarım ev nıvisandına han bıbe keraseyek jı bo vê behsa han û tehlil kırınên zêdetır lı ser bûyera tevgera salên 1942-1946 an a Kurdıstanê çêbıbın.

## KÊM Û KURİYÊN KOMARA KURDISTAN

1) Pêşiya hemû tışti nebûna stratejiyek roni. Partiya Demokrat a Kurdıstan lı ser himên diwarên Komela Je-Kaf damezra. Komela Je-Kaf, wek rêxıstınek welatparêz a Kurd mafê diyarikırına çarenıvisi, yani azadiya Kurdıstan



www.netewe.com

jı bo stratejiya xwe danibû. Partiya Demokrat a Kurdıstan bı nıvisandi xwud muxtari kıre slogan û dev jı serxwebûna Kurdıstan berda. Lêbelê, dı kırınê de hukûmetek serxwebûyi damezırand. Guherandına ala İran, danina arma dewletê, pêkanina eskerê mıllı, peymana abori lı gel Yekitiya Sovyet, peymana yekiti û dostayeti bı Hukûmeta Azerbeycan re, ev ne ew tışt bûn ku lı gel xwud muxtari an ji lı gel qanûna "encumenê wılayetê" hevûdu bıgrın. Dı rastiyê de Kurdıstana nawendi her çıqas navçeki bıçûk jı Kurdıstanê bû, lêbelê fiilen dewleteke serbıxwe ya Kurd tê de hatıbû damezırandın. Lı ba rêberên Komara Kurdıstan wıha bû; ger dev jı slogana azadiya Kurdıstan berdın û doza qanûna encumena mılayeti bıkın, an ji dı programa xwe de bınıvisın " tu dıjmınayetiyek me bı Hukûmeta Merkezi re nine", Hukûmeta şovenist a Tehranê dıbe ku nerm bıbe û daxwaza wan ci bı ci bıke. Tıştê seyr û eceb eve, ku jı wi wexti heta nıha ji, her çend rêberên Partiya Demokrat û hêzên demokratên İran ji hawar dıkın ku daxwazek wan a cihê bûné nebûye û xwestıne ew qeyd û zıncir jı sıtuyê wan bê derxıstın ji, lê kevneperestên İranê lı ser gotına xwe rıkoyi ne û dıbêjın; hûn veqetixwaz ın, Komara Kurdıstan komareki serbıxwe bû û dıxwest Kurdıstanek serbıxwe ava bıke.

Dı rastiyê de dı siyaset û stratejiya rêberên Parti û Hukûmetê de neditına riya xwe diyar bû, ku nıkaribûn riya xwe bıbinın. Diyare rewşa Azerbeycan ji dı wır de bêtesir nebû. Siyaseta çewt a Hukûmeta mılli ya Azerbeycan ev bû; lı gora peymana lı gel Hukûmeta mılli ya Kurdıstan ku hatıbû imza kırın, dı muzakerên bı Tehranê re lı gel Hukûmeta Qewam (Serekwezirê İranê yê wê çaxê –N.M.) nûnerê Komara Kurdıstan dıvê beşdar bıbûna, lê beşdar nebûn. Ne her tenê, her wıha dı muzakera nav Qewam û nûnerên Azerbey-



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook

can ên dı bın serokatiya Şebusteri de, lı ser Komara Azerbeycan lı ser heft maddan hat lı hev kırın ku bı tu awayi behsa Kurdıstan nekırıbû. Dı vê qerarê de derdıkeve ku navçên dı bın destê Komara Kurdıstan de, her wek berê Azerbeycan hatiye bı nav kırın. Tenê dı hela dıbıstanan de gotıne : "Kematiyên dın ên mılli wek Kurdan, Ermeniyan û Asuriyan, zarokên wan dıkarın heta sınıfa pêncan a destpêki bı zmanê dayika xwe bıxwinın." Bı kurti dı wê qerara ku maf dıda Kurdan ji de, dı wê dema ku desthılata Kurdan dı destê wan de bû û Komara Kurdıstan damezırandıbûn bû "kêmayeti" dıhatın bı nav kırın.

2) Siyaseta bergıri:

Siyaseta bergıri ya Komara Demokrat a Kurdıstan, rengdanek roni ya tunebûna siyaseta wê ya gışti û stratejiya wê bû. Her lı ser vê çûn û bir û baweriyê, lı hember bê hêzi, jar û lawazê Hukûmeta Tehran, Komara Kurdıstan siyaseta xwe parastınê gırt ber xwe û qet lı ser lêdana dıjmın nesekıni. Bane, Saqız, Kırmanşan û perçên xwarê yên Kurdıstan bıbûne ciyê pêgeyên dıjmın, bıntarên cıvinên hêzên hukûmetê û êriş dıanin navçên azad kıri.

Raste, wê wextê lı ser bangewaziya Partiya Demokrat çekdarên Kurd jı seranserê Kurdıstanê ber bı wê cepha Serdeşt û Saqız ve ketıbûn rê û nêzikê Diwanderê bûbûn û der û dora Seqız û Serdeşt gırtıbûn û şerê Qarawa û Mameşa manewiyata dıjmın şıkandıbû, dı demek wılo dê nûnerên Hukûmeta mılli ya Kurdıstan lı gel Serheng Rezmarê lı ser şer rawestandınê muzakeran dıkırın.

Dı 28 ê Gulana sala 1946 an de, nûnerên Partiya Demokrat (Haci Babe Şex, Hejar û Kapitan İzzed Ebduleziz) lı gel Rezmarê nûnerê eskerê İranê dı cepha Seqız de vê rêkevtına han imza kırın :



www.netewe.com

" 1)Karbıdestên Partiya Demokrat ferman dıdın hêzên xwe, ku teqe lı eskerên İran nekın û jı wan ciyên gırtınê zêdetır neçin pêş ve û têkıli çûn û hatına caddeyan nebın.

2) Jı bo pıştgıriya şerkırına çekdaran, destê çekdarên Kurdan, çar kilometr jı Seqız, sê kilometr jı Serdeşt dê bıkêşın.

3) Kurd û dewleta İran hêzên xwe lı ser sınor bı hêz nakın û fırokên İranê ji zêdetır jı çar kilometran ber bı ser Seqız ve nafırın.

4) Jı bo berlêgırtına hemû buyerên nahezkıri, Partiya Demokrat a Kurdıstan dê nûnerek lı bajarê Seqız, Bane û Serdeşt deyne, ku dı navbera hêzên İran û Kurdan de peywendiya siyasi deynın." (44)

Jı netica naveroka ve qerarê, bı eşkera derdıkeve ku mebest ew bûye ku Kurd teqe nekın û bıkêşın û karên xwe bı hatın û çûnên riyan nekın û ew ciyên ku gırtıne jı wê zêdetır pêş de neçın. Dı rastiyê de, her wek Hesen Arfa dıbêje : "Siyaseta Hukûmeta Tehran ew bû ku Kurdan bıxalıfine "

Her lı ser vê terkexemê û rayê bû, ku Muhemmedê Nanewazadê Fermanberê Hêzên Bergıri yê Kurdıstanê, bı dılxwazi sıwari helikoptera esekerê İran dıbe û ew ji helikopterê berdıdın û Nanewazadê şehid dıbe.

Derveyi vê, çûna Serekwezirê Hukûmetê jı bo muzakerek lı gel serhengek (Albay -N.M.) jı ordiya dıjmın, prestij û gıraniya wê hukûmetê tine xwar. Jı van hemû qebehet û kêmasiyan wêdatır, çûna Pişewa Serokomarê Kurdıstan a gundê Sera jı bo axaftınê lı gel Rezmara, noqteyek jar û xwe bı kêm zanina Parti û ya Hukûmeta Mılli bû.

3) Hêzên Bergıri :

Her çend Hêzên Bergıri jı kedkarên Kurd û jı pêşmergan pêk hatıbûn,lêbelê mesela çiniti lı wır ji xwe dıxıst pêş



www.netewe.com

çav. Dı nav hemû karbıdest û fermandarên Hêzên Bergıri de grûbên kedkarên Kurd xuya nedıkırın, lêbelê bı dehan axa û zarokên axan kıncên fermandaran lı xwe kırıbûn û xwe bı wan nişan dıdan. Derveyi pêşmergan, hesab lı ser çekdarên eşayiri nıkarıbû bê kırın. Hukûmeta Mılli raste rast bı xwe çek nedına kedkaran, ku pıştewanên rasti yên Komara Kurdıstan bûn. Çekan dıda serekeşiret û derebegan. ewan ji dıda xızım (merıv), noker û destė peyayên xwe. Çekdarên xeyri-nizami, xwe mırovên axa dızanin, ku çek jê gırtıbûn, nan pêxwarın û huqûqên xwe jê wer werdıgırtıbûn.

Bı rasti jı bıli Barzaniyan, çekdarên dın ên xeyri-nizami jı bo parastına Kurdıstanê çek hılnegırtıbûn. Bûyerên pışti Komara Mahabad nişan dan, ku pışti hatına eskerên İran jı wan takım û derebegan tu kes nehat gırtın. Yek jı minakiyên berçave Omerxanê Şıkaki bû. "Hin Hkûmeta Mılli lı ser kar bû, jı generali û jı partiyê istifa kır. Dı 12 yê Çırya Duyem a sala 1946 an de, lı Tebrizê dozê jı Konsolosê Amerika kır, ku cewabek jı Qewam seltene re bışinė û dewletê agahdar bıke, ku bı kırınên nerım û ewleyi dıkare dı navçê de hêviya wefadariyê jı Kurdan bıke û dılxweş bıbe."(45)

4) Peywendiyên Cıvaki :

Hukûmeta Mılli ya Kurdıstan jı bo kêmkırına desthılat û zılm û zora derebegan qet gaveki pêş ji navêt. Dı wextê Hukûmeta Mılli ya Kurdıstan de zılma derebegan jı hemû wextan zêdetır bû. Gundi jı gundên wan hatın derêxıstın, sıtendına bac û cerimê, jı bo karê rojane û lı ser bahanên vala pere sıtendın û perçıqandına kedkaran bı berdewami dıhat domandın. Çend minakiyên van kırınan :

– Hemed Axayê Lece lı Şarwêran destê qehweciyê xwe



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook

jêkır. Rojnama Kurdıstan lı ser vê kırınê nıvisand. Lêbelê, keseki tıştek jı Hemed Axa re negot.

– Sımailê Şêx Axayê lı gundê Deme Mesor gundiyeki tevi se (kûçık) xıstıbû nava çalê û pışt re gotıbû ku de bıra Qazi bê derine.

– Qadır Axayê Derbendi, Haci Xalıd jı gund derxıst, rez û baxên wi jı reh û kokan de kışand, lêbelê keseki xwediti lê nekır. Dı wextek wılo de ku Haci Mele Xalıd yekek jı karbıdestê partiyê bû.

– Ezizê Qereni Axa, lê xıstıbû çûbû nav Eceman. Nama casûsiyê lı ser Eli Emır Eşayiri û Selimxanê Şawele gırtıbûn, dı şûna ceza kırınê anibûn Mahabad danibûn sekınandın û rêberên partiyê û yê Hukûmetê kenên xwe pê dıkırın. Evana wextê eskerên İran ketın Mahabad pêşewaniya wan dıkırın.

Bı kurti kedkarên gundiyen Kurdıstan, ku hêzên esasi yên tevgera rızgarixwazi ya Kud bun, desthılata Komara Kurdıstan bı cıvaki wısa gırami lı wan nenıhêri. Hukumeta Mılli ya Kurdıstan, jı bo qezenca gundiyan û kêmkırına desthılata derebegan gavên wısa pêş neavêt. Hınek jı nıviskarên Kurd nıvisandıne, ku Hukûmeta Mılli ya Kurdıstan zevi û axên ku dı ci de hatıne hiştın lı gundiyan belav kıriye. Eva han jı neşarazatiya lı ser rewşa Kurdıstan tê. Lı tu ciyi dest bı mılkên derebegên ku erdê xwe hıştıbûn û çûbûn, nehate dan. Lı Şariwêran axayên Xurxure û Gapisan, jı ber sebebê şerên nav xwe û mırov kuştınê, ciyên xwe hıştıbûn û çûbûn. Barzaniyan dı wan herdu gundan de para mılkan werdıgırtın.

Ew derebegên dı nav dezga rêberiya Parti û Komara Kurdıstan de xwedan mırov bûn, dı bıni re peywendiyên xwe jı Hukûmeta Tehran neqetandıne, jı ber vê ye ku pışti hatına



www.netewe.com

eskerên İran bı serbesti geriyane û yekek jı wan ji nehatiye gırtın.

5) Nebûna Teşkilatek Tekûz û Bir û Baweriya Şoreşgeri:

Dı Rojnama Kurdıstan organa Komita Merkezi ya Partiya Demokrat a Kurdıstan İranê de, dı hejmara 32 an a meha Sıbata sala 1974 an de, wıha hatiye nıvisandın : "Sebebê rasti yê tekçûna Komara Kurdıstan û şıkestına tevgera rızgarixwazi ya gelê Kurd a dı sala 1324-1325 (1945-1946-N.M.) an, kêm hêzbûna nav xwe ya Partiyê û bı rêvebırına tevgerê û ya Hukumeta Mılli bû..... Mıxabın ew bê hêz bûn dı hemû kar û barên Partiyê de diyar bûn.... Pışti têkçûna Komara Kurdıstan bı awaki baş derket, ku bêhezbûna teşkilata wextê Komara Mahabad ta çı radeyê bû. Bê hêz bûna Partiyê dı warê siyasi, rêxıstıni û ideoloji de û dı kêmbûn an ji nebûna bı yek cari kadroyên têgehıştı û têgıhişti dı nav hêzên Partiyê de dıhat xuya kırın.

Jı ber nebûna dısiplin û rêxıstına bê ser û beri ew qas kesên bê bir û baweri ketıbûne nav rêxıstınên Partiyê û dezga dewletê, ku pak û pis jı hev nedıhatın veqetandın. Derveyi vi, Partiya Demokrat nızanibûye ka jı bo çı dıxebıte. Yekitiya bir û baweriyê lı ser meselên siyasi, eskeri û cıvaki dı nav partiyê de tunebûye. Dı têxıstıniya rêxıstıni, çarçove û awayê Hukûmeta Mılli de evên han pê ve diyar bûn.

Nebûna bir û baweriya şoreşgeri û nebûna yekitiya bir û baweriyek bû sebebê eva han, ku rêberên partiyê û yên Komara Kurdıstan lı hemberi eskerên jar û lawaz a Tehran, bı bê şer dest pê kırın teslim bın û bı ber Mıyandıwa ve pêrgiyi eskerên İranê ve bıçın û xwe bı destê xwe teslim bıkın.

Dirok nıkare mudafaa vê bûyerê bıke. Eger rêberên Ko-



www.netewe.com

mara Kurdıstan dı berxwedabûna, gelê serihıldayi yê Kurd bı gıştî jı bo parêzgeriya Komara xoşewist a Kurdıstan de bıkarıbûya ta nefesa dawiyê xebat bıkıra. Bı taybeti hêzên neşıkesti yên Barzaniyan lı pışt Komara Kurdıstan rawestabûn û şerê Barzaniyan pıştî têkçûna Komara Kurdıstan nişan da, ku Hukûmeta Tehran ne xwediyê wê hêzê bû, ku bıkare wısa bı hêsani lı Kurdıstan bı ser keve. Fermanên lı ser şer û dıjitiyên Hêzên Bergıri yên jı bo tıştên pûç u vala jı bo karen rojane, karen xwe fıroşan hêsan û pak dıkırın. Kedkarên Kurd ku dı bın destê jendırman û perçıqandoxan de bê hed nerehet bıbûn, dı navbera wan çend salan de tama azadiyê çêstıbûn û bı hêsani welatê xwe bı dest ve bernedıdan.

6) Tecritmayina jı Hêzên Demokrat ên İranê :

"Nebûna yekgırtına qewi û yekitiyê raste rast dı nav hêzên demokratên İran de yek jı sebebên heri gırıngi şıkandına Komara Kurdıstan her wıha ya tevgera seranserê İran a Salên 1324-1325 (1945-1946-N.M.) an bû." (46)

Jı bo slogana xwud muxtariyê ku Partiya Demokrat dı programa xwe de nıvisandıbû, pêwistiya yekiti û hevkariyek nêzik û qewi lı gel hêzên demokratik ên seranserê İran hebû. Her çend Partiya Demokrat çûye nava "cepha hevkariyê ya partiyên azadixwazên İran" û lı gel Partiya TUDEH a İran, Fırka Demokrat a Azerbeycan, Partiya İran û Partiya Cengel hevkari dı cephê de dest pê kır," lêbelê, gelek mıxabın roja ku pêwist bû ev cepha han bı hemû hêzên xwe ve bê meydana xebatê, bû temaşevanê bûyeran û bê deng rawesta bû . Serokatiya sê partiyên esasi yên vê cephê; Partiya TUDEH a İran, Fırka Demkorat a Azerbeycan û Partiya Demokrat a Kurdıstan, heryek bı awaki cûda cûda jı xwe re



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook

ketın rêditınê jı bo çareserkırına gir û gurıftên xwe. Wextê eskerên İranê ber bı Azerbeycan û Kurdıstanê ve bırêketın, Partiya TUDEH bê deng ma .... Her çend dı navbera Hukûmeta Azerbeycan û ya Kurdıstan de peymaneki dumıli hebû, ku lı gora wê peymanê hewce bû pêk ve dıji Hukûmeta Merkezi bısekının, lêbelê, gelek mıxabın wextê eskerên Şah êrişi Azerbeycanê kır serokatiya Fırke bê agahdari û bê tedbir jı ba serokatiya Partiya Demokrat a Kurdıstan xwe paş ve kışand. Her bı vi awayi, ku eskerên İranê ketın nav Kurdıstanê, serokatiya Partiya Demokrat a Kurdıstan ne hêviya wê ya cephe û ne ji ya peymanê hebû." (47)

Dı rastiyê de eger Partiya TUDEH a İranê, wek xurtırin partiya siyasi ya welat, bı qewl û qerarê Qewam seltene nehata xapandın dıkarıbû jı bo pıştgıriya serihıldana Azerbeycan û Kurdıstanê karek bıke. Pışti bist salan, rêberiya Partiya TUDEH, parêzgeriya xapandın û lêbanina xwe ya wê demê dıke û wıha dınıvise : "Xeletiya lı ser bıryara Qewam hati kırın û jıbirvekırına wade û belêniyan, hışyariya şoreşgerên hêzên mılli û demokrati kêm kıriye. Vi karê han imkana jı bo Qewam pêk ani, ku dı pışt perdê de teblixat û xelk lê banandına lı gel emperyalizmê û bı taybeti emperyalizma Amerikayê û lı gel rêxıstınên kevneperest bırêkeve û dı bın perdê de fırsend û merc jı bo şıkandına hêzên mılli û demokrat amade bıke."(47)

Jı bıli van, reberên Parti û Komara Kurdıstan bir nake.. pê nedıbırın, ku xwud muxtari dı bın rejıma paşati ya diktatori de nayê ci û Hukumeta şovenist a dıji gelên wan, mıl jı bo xwud muxtari û mafên gelan dırêj nake.

## SEBEBÊN DERVE YÊN ROXANA KOMARA KURDISTAN

Dı têkçûna Komara Demokrat a Kurdıstan de pêwiste em



www.netewe.com

sebebên derve ji bıgrın ber çav. Diroknıvisên burjuvazi û heta hınek nıviskarên Kurd ji pêkhatına Komara Kurdıstan bı çêkırına destê Sovyet dızanın û jı roxanê ji her Yekitiya Sovyet gunehkar dıkın. Ew dı van kırın û nıvisandınên xwe de,têkoşin û xebata gelê Kurd û fırsend û mercên navneteweyi yên wê wextê nagırın ber çav.

"Çend sal pıştı têkçûna Komara Kurdıstan ji dı nav Partiya me de, ev bir û baweri bıhêz bû, ku sebebê esli yê têkşıkandına vê Komarê, siyaseta çewt a Yekitiya Sovyet a lı beranberê rewşa İranê ya wi wexti bû. Bı vi awayi, hem dı aliki de me xwe derveyi gunehkari dıkır û hem dı ali dın de ji me lı derveyi çarçeva pêkanıbûna xwe yeki gunehkar (mebest Yekitiya Sovyet e N.M.) ditıbû. Netica vê tevihevkırın û besit kırına meselê, xwe bê xem kırın û xwe neacız kırın bû. Dı derveyi vê me bı vi awayi itiraf dıkır, ku hêza esasi ya Komara Kurdıstan hêzên derve bûn û ne hêzên gelê Kurdıstana İranê bûn. Eva han ji raste ku bir û baweriya dıjmınê ku jı destpêka pêk hatına Komara Kurdıstan û heta nıha belav dıke."(49) Siyaseta we deme ya karbıdesten Azerbeycana Sovyet dıkır, ku dı İran de nişanek we ya gıringi hebû, bı eşkera kırınek bı temami yê pêkenine bû. "Cafer Bakırof, ku karbıdestê serokê Azerbeycana Sovyet bû û dı danina siyaseta Sovyet dı İran de desteki wi yi xurt hebû û pıştre ji hat idam kırın, lı ser mesela ber bı pêşve çûyin û têkçûna tevgera azadixwazi dı İran de roleki wi ya gelek fıreh hebû. Gelek bıryarên ferdi yên xelet da, ku lı gora qezenca siyaseta derve ya Sovyet a tevgerên demokratik yên İran nebûn.... Derveyi vê Yekitiya Sovyet nû jı şerê cihanê rızgar bûbû, nava welatê wan wêran bûbû. Pêwisti bı aşiti, asayiş û avayi kırınê hebû. Wextê eskerên dagırker gıhişte Tebriz û hêzên kevneperest dı Azerbeycan de jı bo



www.netewe.com

kuştına demokratan dest avêtıne çek, wê wextê êdi Yekitiya Sovyet bı xwestıbûna ji lı Azerbeycan û her wıha lı Kurdıstan ji qet nıkarıbû parastıniyê bıke. Rastiyek dın ji hewceye lı vır bê gotın : Yekitiya Sovyet dê çawa parastıniyê lı Kurdıstan bıkıra? Eger Komara Kurdıstan xwe bı xwe lı hember eskerên kevneperestê İran sekınibûya û berxwedanek wextek dırêj hebûya, wê wextê mımkun bû Yekitiya Sovyet yarmetiya Komara Kurdıstan bıdaya. Lêbelê, Komara Kurdıstan berxwedaniyê nekır û xwe parastıniyê lı xwe nekır."(50)

Meselek dın ji ciyê bal kêşandın û lêkolinê ye. Dewletên emperyalist Amerika û Ingıliz, Komara Kurdıstanê sıtıriyê nava çavên xwe dızanin. Ew jı wê tırsiyane, ku serkevtına Komara Kurdıstan kar bıke lı ser Kurdıstana Iraqê û xeteri bên ser riyên petrolên Iraqê, ku ew dı destên şirketên Ingılizan de bûn. Dewleta Amerika ji ku welatek xwedan bombayê atomi bû Komara Kurdıstanê wek bıngeheki demokratik dı İran de dıji menfeeta xwe dızani û bı temami dıji wê rawesta bû. Her çend Pişewa Qazi Muhemmed dı İlona sala 1946 an de jı Roswelt re lı ser alikariyê dı riya karbıdestê eskeri yê Amirekayê yê lı Tehran re şandıbû wıha gotıbû : "Kurdên İranê merkezeke bı mana kelima rasteqini 'demokrat' dıxwazın, ku dı bın çavedêriya rejimek federal de bı rê ve bıçe, her wek dı welatê Ameriki Yekbuyi de heye. Eger Hukûmeta Amerika nıkare pıştevani lı van xwestın û daxwazên gelê Kurd bıke bı kêmasi bıra dıjmınayetiya Kurdan neke."(51) Lêbelê, Amerika ne her pıştewani nekır, heta raste rast dıjminatiya xwe lı gel tevgera rızgarixwaz a Kurd nişan da. George Allen Konsolosê Amerika yê lı Tehran bı eşkera ragıhand ku : " Hukumeta İran jı bo pêkanina ewlekariyê naçar e, hêzên eskeri bışine hemû navçên



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

Iranê. Mebesta wan bı temami qanûni û durust e." (52)

Herdu dewlet, Ingıliz û Amerika bı hemû awayi rejıma kevneperest a Iranê jı bo jı holê rakırına Komara Kurdıstan han dıdan û çek, cebırxane û musteşaran dıdan Hukumeta Iranê.

Jı derveyi van, serokatiya Partiya Demokrat û Komara Kurdıstan bı hılgırtına slogana "xwud muxtari û encumena wılayeti" mesele kırıbûn meseleki nav xwe ya Iranê û xelkê dın nedıkarin dest pê bıdın.

Mudurê Gıştı yê Wezareta Kar û Barê Derveyi Fransa, 13 yê meha Kanûna Yekem sala 1945 an de dı bersiva xwe ya rojnamenıvisan re wıha gotiye :

"Mesela Azerbeycan û kar û barên wan navçan, lı gora bir û baweriya Wezareta Kar û Barên Derveyi Fransa eva han tenê meseleki nav xwe ya Iran e. Jı ber ku em agahdarın, Partiya Demokrat heta nıha doza veqetandınê jı Iran nekıriye û tenê doza hınek desthılatên nav xweyi ya kar û barên dı nav xwe de dıke. Bı taybeti lı gora agahdariyekê, ku gehiştiye Wezareta Kar û Barên Derveyi Fransa, yek jı wan parti û desteçekên Iran bı taybeti Partiya TUDEH a Iran aligıri bı bir û baweriya veqetandınê nakın. Ku wıha ye, madem ku Partiya Demokrat a Azerbeycan û grubên siyasi ên Iranê behsa veqetandınê nakın, delil jê re tune, ku ev mesela han a navxweyi û navçeyi bıbe kareki navnetewayeti." (53)

Ne her tenê ev e. Lı gora nıvisandına Aegleton wextê karbıdestên resmi yên Kurdan gazınd jı Yekitiya Sovyet dıkın û dıbêjın kû dı wextek teng de ewan me dı ci de hıştın,Esedof nunerê bazırgani yê Sovyet lı Mahabad dı bersiva xwe de wıha dıbejê:"Meşa rewşa Komara Kurdıstan gırêdayi bı çûna rewşa cihanê ve ye. Eger navê Partiyê pışt re bıbe Komela



www.netewe.com

Jê-Kaf, wê gavê Rus dê bıkarın yarmetiyê bı wan bıkın." (54)

Temamê ev belge û dokumentên wan deman û paşwextê vê rasteqiniyê jı bo Kurdan roni dıke, ku her çend Kurd doza xwud muxtariyê bıke û hewar bıke ku ez veqetinxwaninım, dıjmın bı veqetinxwaz wi nas dıke û mesela Kurd ji jı çarçova navxweyê welat dernakeve ser rû, nabe meseleki navneteweyi. Lı gora bir û baweriya mın eger Kurd ji wek hemû neteweyên dın ên cihanê doza serxwebûne û azadiya neteweyi bıke, ne zmanê wi dışewıte û ne ji dıbe kafır. Mafê diyarkırına çarenıvisê ku partiyê komunistên wan welatên ku Kurd tê de ne, itiraf pê kırıne, lê Kurd bı xwe behs nakın, an ji tefsirên bıçûk û tabiran jı bo wê dıbinın, ku derveyi danina dewleta serbıxwe pê ve qet tu maneyek wê ya dın nine.

Jı bo Erebên Sehraya Fasê (Mexrıb) ku bist dewletên hevnetewe û hevzman, hevdin heye û bı xwe ji lı gel Fasa yek netewe ye û heta yek qebile ye, doza veqetandınê jı Fas û doza serxwebûnê bıke, ma qet rewa ye hêzên demokrat ji jı bo wê mıldariyê dıkın û pışta wê dıgırın, lêbelê, eger Kurdên 25 mılyoni doza rızgariya jı perçıqandınê bıke û bıxwaze bı serbesti lı gel gelên ciranê xwe bı bırayeti bıji, dıbe ku bê gunehkar kırın û qelandın? Bı bahana "mesela nav xwe de ji bıbe" ne hewceye ku kes yarmetiyê bıde?

Sebebên jor yên derve tesira xwe kırın. Rêberên Partiyê û yên Komara Kurdıstan bê berxwedan xwe teslim kırın û jı hêzên bêbıni û amadebûna gırs û komên xelkê istifade wernegırtın. Gıringi nedan pêkanina yekiti ya neteweyi ya Kurd a dı hemû beşên Kurdıstan û kar lı ser nekırın, Komara Demokrat a Kurdıstan yekemin desthılata siyasi, eskeri, dewleti ya gelê Kurd hat roxandın. Serekomar, gelek jı



www.netewe.com

rêberên welatparêz û fermandarên azadixwaz hatın idam kırın. Siya Hukumeta şovenist a Tehran asimanên Kurdıstanê gırt. Jendırme û kevneqazaxên Ordiya İran lı ser çarenıvisa gelê Kurd serbest bûn.Gundi û kedkaren Kurd carek dın ketın bındestên derebeg,dairên nufûs û selemxwaran û perçıqandın du cari hin zêdetır bû. Kurdıstan hat xıstın bın piyên Ordiya İran û musteşarên Amerikayiyan.

Lêbelê, tevgera salên 1942-1946 an a Kurdıstana İranê şewqa xwe lı ser tevgera gelê Kurd bı gıştî bı ci hışt. Pêkhatına Komara Demokratik a Kurdıstan dı diroka xebata bı xwin a gelê Kurd de bı hemû awayi bı nıvisandınek zêr ci gırt û bir naçe. Ev sıtêrka han a geş dı wextek avabûna demek kurt de, lı temamê asimanê Kurdıstanê belav bû û her wext şefeqa roni davêje.

## GIRINGÎ Û TECRUBÊN KOMARA DEMOKRAT A KURDISTAN

1)Gelê Kurd lı Kurdıstana İranê dı bın rêberiya Partiya Demokrat de hişyar dıbe, seri hıldıde, date meydana xebatê û baweri bı xurt bûna yekitiyê peyda dıbe.

2) Yekem care dı diroka sedsala dawiyê ya gelê Kurd de netewa me dı perçek welatê perçe kıri de dı bın rêberiya partiyek remokrat û pêşkevtixwaz de çarenıvisa xwe dıgre destê xwe û jı bo demekê kar û barên xwe bı rêve dıbe.

3) Komara Kurdıstan roni davêje beşên dın ên Kurdıstanê û qısmên Kurdan ên dı hemû beşên dın ber bı wê tirêjê ve tên û pıştevani lê dıkın. Her lı ser vi esasi ye ku dı beşên dın ên Kurdıstanê de Partiyên Demokrat ên Kurdi tên damezrandın.



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook

4) Yekemin care ku gelê Kurd Hêzên Bergırı, teşkilatên idari û bı rêvebırına kar û barên siyasi, eskeri, abori, kulturi û cıvaki ya xwe dadımezrine û bı awayi tenzima dewleti xwe gırê dıde.

5) Komara Demokrat a Kurdıstan, xebata gelê Kurd ber bı aşiti, demokrasi û sosyalizmê ve dıbe û pê ve gırê dıde û kevneperesti û emperyalizmê dı navçê de dıxe nava lerzê. Hukumeta Amerika û Ingılizbı naçari hesab jı bo wê dıkın. Mamoste Muhemmed Resûl Hawar dı biraninên xwe de wıha dınıvise : "Wextê Komara Kurdıstan dırust bû, tırs kete ser Ingılız û Hukumetê, ku Kurdıstana Iraqê ji bıgre. Jı ber vê bı hemû awayi hewıl dan pêşi lê bıgrın, pere dı rast û çep de belav dıkırın, jı bo ku xelkê bê deng bıkın. Nûnerek Ingılizan ê bınavê Mr. Smith, bı zor dıçû ser qomita kırina tıtûnê û hemûyan dıkır mumtaz (baştırin) û dereca yekê. Wextê Komara Kurdıstan hat roxandın, hemû tışt hat guherandın û bahayê tutınê hat kêm kırın. Her ew Mr. Smith hewarê dıbır ser wan qomitan û dıgot : 'Ev tutınên han nehêjayi van telisan e, ku dıkın navê'. Ku tıtun her jı tutına carên dın bû." (55)

6) Gıringiya Komara Demokrat a Kurdıstan lı vır derdıkeve,ku pışti 40 salên dın nıha ji komên kedkarên Kurdıstan nesla nû ya têgıhıştiyê Kurd, bı wê hewayê têne meydana xebatê û bı navê Pişewa Qazi Muhemmed dı pênav û bıdestxıstına mafê netewayeti de canê xwe bı gori dıkın. Nıha ji bı wê gıhiştınê jı bo armanca Komara Kurdıstan lı der û dora Partiya Demokrat kom dıbın û dı wê riyê de jı mırınê natırsın û biranina wê bûyera mezın her bı jindari radıgırın.

Komara Kurdıstan bı ser neket. Dı wi wextê ku dax û nerehetiyeki gıran jı bo gelê Kurd dı ci de hışt, bêguman



www.netewe.com

tecrubeki gıranbıha ji da destê netewa me, jı bo wê hewceye dı xebata xwe de em ders jê werbıgrın:

– Baweriya xwe bı xwe û pıştgırêdana bı hêzên gel, bı taybeti komelên hejar û kedkarên bajar û gund binın.

– Xwe neparastına bı dıjmınên gel û baweri pê nekırına wan

– Dı wextê qewımandınê de fırset jı dest bernedan, neketın erênayê û dest bı berxwedanê kırın.

– Eşkera kırına stratejiyek roni û peyde kırına ser danina mafê çarenıvisa xwe bı destê xwe.

– Naskırına emperyalizm bı dıjmınê sereki, ku bûye sebebê perçe kırına Kurdıstan û bındest kırına netewa me.

– Ne listına lı ser çend benıkan û nan bı qimeta roj nexwarın.

– Dostayeti, yekiti û hevkari lı gel hêzên demokratik ên nava Kurdıstanê û ciranan, bı taybeti partiyên komunist.

– Qaim kırına rêxıstınên şoreşgêr lı ser esasê bir û baweriya şoreşgeri. Jı ber ku; "bê bir û baweriya şoreşgeri tevgera şoreşgeri bı ser nakeve."

İlon 1985



www.netewe.com

KURDISHeBook.com
@KURDISHeBook

## SEROKANÎ

1) Lenin, Cıldê 19 an, (bı Çeki) rûpel; 425-427
2) Lenin, Lı Ser Mafên Netewan dı Diyarkırına Çarenıvisa xwe de. (bı Farısi), çapa Moskova, 1980, rûp; 5
3) Kurd û Serweta Wan Lı İran, wergerandına M.S.Gardwel, 1
4) Yehya Dewledabadi, Mêjûyi Serdemi Heyati Yehya, Cıld 4, çapa Tehran, 1632, rûp; 261
5) M.S.Lazariyef, Pıroseyi Netewayeti Lı Welatên Rojhılata Nêzik û Navin de, Moskova, 1970, rûp; 161
6) Diroka dı Çapkırınên Zanistgeha Moskov, Rusi, 1977, rûp; 317
7) Hesen Arfa, Kurd û Lekolina Diroki û Siyasi (farısi) New york, 1966, rûp ; 53-59
8) Eli Dehqan, Ser Zemina Zerdeşt, Tehran, 1348, rûp ;591
9) Hesen Arfa, Afırandına Navê wê Derbaz Bûyi, rûp ;65
10) Diroka İran, çapa Moskova, (Rusi) 1977, rûp; 343
11) Hesen Arfa, A.N.D., rûp ; 66
12) Seyid Bıdal, Kurte Diroka Tevgera Mılli ya Kurd, 1984, rûp ; 115
13) Kurd û Serweta Wan lı İran, wergerandına M.Kerdo,



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com

rûp; 7

14) M.S.Êvanof, Diroka Nû ya İran, (Farısi) 1977, rûp;68

15) Hesen Qızılci, Pêkenini Geda (Parsekan), 1972

16) Xatırati Haci Siyah, çapa Tehran, rûp; 255

17) Hesen Qızılci, A.N.D., rûp; 122

18) Kurte Diroka Nû ya İranê, çapa Moskova, Rusi, 1976 rûp; 119

19) Hesen Qızılci, A.N.D., rûp; 41

20) A.N.D.

21) Kerim Hısami, Karwanek jı Şehidên Kurdıstanê, İran, 1971, rûp; 10-11

22) Hêmın, Pêkenini Geda, 1972, rûp; 7

23) Nıvisandınên Desteyi Lêkolinên Radyo û Televizyona Mahabad, 1955

24) Celal Talabani, Kurdayeti, 1961, rûp; 88

25) Koyi Peymanên Diroka İran, cıld.3, Tehran, rûp; 217-18

26) Ebdulqadır Debbaxi, Serihıldana Komela Jê-Kaf, 1983, rûp; 19

27) E.Faizof, Tevgera Mıllî ya Kurdan, 1941-1945, Moskova, Rusi, 1953, rûp; 123

28) Kovara Nıştıman, Organa Komela Jê-Kaf 1323(1944)

29) Zınar Sılopi, Doza Kurdıstan, Tırki, 1969, rûp; 179

30) Heser Arfa, A.N.D. , rûp; 79

31) Weşanên Enstituya Kurd lı Paris 1985, rûp; 59-60, hejmar; 2

32) Kovara Roji Nû, hej. 10, Befranbari 1961

33) Hêmın, Tarik û Ron, 1974, rûp; 52-53

34) Aegleton.W, Komara 1946 ya Kurdıstan, rûp; 51

35) K.N.Brontis, Şoreşên Rızgarixwazên Serdema Nıha û Rêgıraweyi Farısi, 1981, rûp; 122

36) A.N.D. , rûp; 130-131



www.netewe.com

37) A.N.D. , rûp; 132
38) Nıştıman, hejmara Poşperi (Gulan), 1944
39) Lenin, Weşanên Tewayi, cıld.25, Rusi, rûp; 34
40) K.N.Brontis, A.N.D. , 1981, rup; 132
41) Kovara Kurdıstan, hejmar, 1, 15 yê Sermawezi (Kanûna Yekem) 1324 (1945)
42) Rojnama Kurdıstan, hejmar 2, 13.1.1946
43) Kurdıstan, hejmar, 45, 1946
44) Hesen Arfa, A.N.D. , rûp; 9
45) Aegleton.W, A.N.D., rûp; 45
46) Rojnama Kurdıstan, hejmar, 32, Fêriyewe (Sıbat)1974
47) A.N.D.,
48) Reza Radimemiş, Kovara Dınya, hejmar, 4, 1344 rûp; 17
49) Rojnama Kurdıstan, Organa Partiya Demokrata Kurdıstana İranê, hejmar, 32, Feriyewi (Sıbat) 1974
50) A.N.D.
51) Aegleton.W,, A.N.D. , rûp; 201
52) A.N.D. , rûp; 204
53) Reza Radimemiş, A.N.D., hej.4, 1344
54) Aegleton.W, A.N.D., rûp; 208
55) M.R.Hawar, Zehmeti û Bireweri, 1948, rûp; 59



www.netewe.com

@KURDISHeBook



Qazi Muhemmed, dı İlona sala 1946 an de, dı meqamê xwe ya Serokomariyê de



Pişewa Qazi Muhemmed bı hınek Serokwezirên Komara Kurdıstan re.



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook
www.netewe.com



Muhemmed Seyfi Qazi Wezirê Bergıri
ya Komara Kurdıstan



Sê serokên Kurd ku dı 31 ê Adara sala 1947 an de hatın idam kırın. Jı çep ber bı rast ve : Muhemmed Huseyn Seyfi Qazi, Qazi Muhemmed, Ebdulkasım Sedri Qazi.



www.netewe.com



مەلا مستەفا و قەدری جەمیل پاشا و ئەفسەرە کوردەکانی
کوردستانی گەرمین لە مەهاباد ١٩٤٦

Mele Mustefa Barzani û Qedri Cemil Paşa bı hınek serok-eskerên Kurdıstana Germin ve lı Mahabad. 1946



www.netewe.com

ژماره ...٢٨٨٩

بەروار ٢١/٣/٢٥

پەیوەند: ...


# حزب دیموکرات کوردستان

مهاباد

کومیتەی مەرکەزی



www.KURDISHeBook.com Telegram: @KURDISHeBook




Sinorên Komara Kurdıstan û riya çûyina Barzaniyan a Yekitiya Sovyet.— Me ev xerita han jı orijinala pırtûkê gırtiye.

İSBN : 91970747-64

www.netewe.com